



K.T.

ZANÎNGEHA MARDÎN ARTUKLUYÊ
ENSTÎTÛYA ZIMANÊN ZINDÎ YÊN LI TIRKIYEEYÊ
ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Û ÇANDA KURDÎ

Teza Lîsansa Bilind

**BI NÊRÎNEKE FEMÎNÎST ANALÎZA
ROMANÊN NIVÎSKARÊN MÊR YÊN KURD**

Hacîre TAŞ

15711007

Şêwirmend

Doç. Dr. Mustafa ASLAN

Mêrdîn-2019

K.T.
ZANÎNGEHA MARDÎN ARTUKLUYÊ
ENSTÎTÛYA ZIMANÊN ZINDÎ YÊN LI TIRKIYEEYÊ
ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Û ÇANDA KURDÎ

Teza Lîsansa Bilind

**BI NÊRÎNEKE FEMÎNÎST ANALÎZA
ROMANÊN NIVÎSKARÊN MÊR YÊN KURD**

Hacîre TAŞ
15711007


Şewirmend
Doç. Dr. Mustafa ASLAN

Mêrdîn-2019

KABUL VE ONAY

Hacire TAŞ tarafından hazırlanan “Bi Nêrîneke Femînîst Analîza Romanên Nivîskarên Mêr yên Kurd” adındaki çalışma, 28/06/2019 tarihinde yapılan savunma sınavı sonucunda jürimiz tarafından Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Bilim Dalında **YÜKSEK LİSANS TEZİ** olarak oybirliği / oyçokluğu ile kabul edilmiştir.

[İmza]



[Unvanı, Adı ve Soyadı] (Başkan)

Doc. Dr. Mustafa ÖZTÜRK

[İmza]



[Unvanı, Adı ve Soyadı] (Üye)

Dr. Öğr. Üyesi Abdurrahim ÖZMEN

[İmza]

[Unvanı, Adı ve Soyadı] (Üye)

Doc. Dr. Mustafa ASLAN

TAAHHÜTNAME

TÜRKİYE’DE YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE

Mardin Artuklu Üniversitesi Lisansüstü Eğitim-Öğretim ve Sınav Yönetmeliğine göre hazırlamış olduğum “Bi Nêrîneke Femînîst Analîza Romanên Nîvîskarên Mêr Ên Kurd ” adlı tezimin/projenin tamamen kendi çalışmam olduğunu ve her alıntıya kaynak gösterdiğimi ve tez yazım kılavuzuna uygun olarak hazırladığımı taahhüt eder, tezimin/projemin kağıt ve elektronik kopyalarının Mardin Artuklu Üniversitesi Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü arşivlerinde aşağıda belirttiğim koşullarda saklanmasına izin verdiğimi onaylarım. Lisansüstü Eğitim-Öğretim yönetmeliğinin ilgili maddeleri uyarınca gereğinin yapılmasını arz ederim.

- Tezimin/Projemin tamamı her yerden erişime açılabilir.
- Tezimin/Projemin sadece Mardin Artuklu Üniversitesi yerleşkelerinden erişime açılabilir.
- Tezimin/Projemin 3 yıl süreyle erişime açılmasını istemiyorum. Bu sürenin sonunda uzatma için başvuruda bulunmadığım takdirde, tezimin/projemin tamamı her yerden erişime açılabilir.

.../.../.....

Hacire TAŞ

PÊŞGOTIN

Meriv gava li biwara nivîsê û nivîsandinê dinihêre, dibîne ku di dinyaya nivîsê de bêtir mêr derketine pêş û wekî nivîskar zayenda mêr xuya bûye. Jin bêtir wekî xwendevan mane. Vê yekê xwe di xwendin û nivîsandina romanê de jî daye der. Derketina cureya romanê ku xwe digihîne sedsala 16an. û wekî cureyekî edebî roman heta roja îroyîn jî xwedî cîyekî giring e. Di sedsalên pêşî de wekî xwînerên romanê jin (li Ewrûpayê) dihate dîtin. Û mêr karê nivîskariyê dikir. Helbet ji wê rojê ta roja me, di pêvajoya nivîsînê de gelek guherîn qewimîne. Nivîskarên jin jî derketine holê, bûyer û qewimînên jiyanê, bi taybetî jinê, bi pêncûsa xwe anîne ziman. Lê ji ber ku dinyaya nivîsînê de giraniya nivîskarên mêr, heye û hin jî berdewam e. Em dibînin ku di metnên nivîskarên mêr de jin, di nav nêrîn û zimanê nêr hatiye afirandin. Nivîskarên mêr di çarçoveya nêrîna xwe ya li jinê û di bin bandora zîhnîyeta bavîksalar de jinê, li gora dile xwe şayesandîye. Herweha bandora zîhnîyeta civaka bavîksalar ya li ser nivîskarên mêr jî di berhemên wan de berbiçav bûne.

Rexneya femînîst ya edebiyatê jî li ser metnên edebî sekiniye. Bala xwe daye fikr û nêrîna bavîksalariyê ka li metnên edebî çawa bandor kiriye. Herweha ji du aliyên ve nêzîkî berhemên bûye. Ji aliyekî ve li ser metnên nivîskarên jin sekiniye. Li ser van metnên jinan, li hişmendiyeke jinane geriyane û li ser zîman û nivîsa jinan hûr bûne. Ji aliyê din ve jî berê xwe dane metnên nivîskarên mêr ka van nivîskaran karakterên xwe yê jin çawa avakirine û taybetiyên mêrane û bavîksalariyê bi çi şêweyê xwe di metnên wan de dane der? bi nêrîna xwînerêke jin nêzîkî metnan bûne. Di vê xebatê de me jî wekî xwînerêke bi rêbaza rexneya femînîst, berê xwe da berhemên nivîskarên mêr ên kurd û me li gor vê nêrîna rexneya femînîst berhem analîz kirin.

Me hewl da, di vê xebatê de çar romanên nivîskarên mêr ji aliyê karakter û mijarên bingehîn ku bi bavîksalariyê ve girêdayî derxin holê. Xebata me ji destpêk û du beşan pêk tê. Du beşa yekem de em li ser teoriya femînîst, û rexneya femînîst ya edebiyatê sekiniye. Pêşketina femînîzmê di dîrokê de çawa bûye, rexneya feminist ya edebiyatê çi ye? Me ev bi berfirehî da. Di beşa duyem de ku esil xebata me di vê beşê de ye, me çar romanên romannivîsên kurd bi nêrîna rexneya femînîst

dahûrandiye. Me xwestiye taybetiyê jinên di van romanên de bîn tesbîtkirin. Nivîskarên mêr di romanên xwe de jineke çawa afirandine? rewş û dinyaya van jinan çawa dane? Têkiliyên van karakterên jin di nav civakê de bi çi awayî saz bûye? Zihniyeta bavixsalari di afirandina van jinan de bandoreke çawa kiriyê? Me hewl daye bersiva van pirsan li ser van romanên bidin. Herweha taybetiyên civaka bavixsalar û bi vê yekê ve girêdayî mijarên wekî bekarî, namûs desthilatdariya zayendî bi çi nêrînê hatiye honandin, derxin holê. Ev mijarên ku di van romanên de derketibûn pêş di nav têkiliyên civakê de çawa hatibûn dayin, me hewl da van yekan tesbît bikin

Di edebiyata kurdî de nêrîna mêrane serdest e, bi baweriya me divê metnên kurdî bi çavê xwinera jin (li vir qest ji jinê ne qesta aliyê wê yê biyolojîk e, qesta feraseteke jinbûnê tê kirin) jî bîn xwendin û nirxandin û hewcedariya edebiyata kurdî jî bi vê yekê heye ku di vî aliyê de valahiyek berbiçav heye. Li gor me bi nêzîkbûna rexneya femînîst, ev valahî hinekî be jî wê bê dagirtin. Di serî de ji bo nêrîn û nirxandinên li ser vê xebatê û sebra ku nişanda ez spasdarê şewirmendê xwe Dr. Mustafa Aslan im û spasiyên xwe pêşkêşî endamên jûriyê Dr. Abdurrahîm Özmen û Dr. Mustafa Öztürk dikim ku bi nirxandin û pêşniyarên xwe xebata min xurt kirin. Herweha ji bo pêşniyar û niqaşên wê yê li ser xebatê, spasiya hevala xwe Songul Dogan dikim. Ji bo pêşniyarên wê guhadarîkirina li min, spasiya hevala xwe Binaz Bozkir dikim. Herweha spasiya Xelîl Samed û hemû hevalên ku keda wan ketiye vê xebatê, dikim.

Hacîre TAŞ

Mêrdîn 2019

KURTE

Metnên edebî ji aliyên gelek cureyên rêbazên rexneyî ve hatine rexnekirin. Yek ji van rêbazan jî rêbaza rexneya edebîyatê ya femînîst e. Di vê xebatê de, çar romanên nivîskarên mêr ên kurd (Sebrî Sîlêvanî, *Meryema*- Helîm Yusif, *Sobarto-Bavê Nazê*, *Dara Pelweşiyayî* ve Ferhat Pîrbal, *Heft Wêney Rûtî Jinî Cenabî Wezîr*) bi rêbaza rexneya femînîst ya edebîyatê hatine analîzkirin. Di van romanên de analîza karakterên jin hatiye kirin û jina di nav civaka bavixsalar de, bi çî awayî daxilî van romanên bûye hatiye diyarkirin. Hatiye xwestin ku di afirandina karakterên jin de; bandora bavixsalarîyê, rolên zayenda civakî, zayendperestî bi çî awayî bandorê li nivîskar kirine derkeve holê.

Di romanên de karakterên jin, bi aliyê xwe yê fîzîkî ve hatine şayesandin û bi mêtîya xwe derketine pêş. Aliyê jinan yê hestî û ramanî berçav nehatiye girtin. Lê belê karaktera Meryema ya Sebrî Sîlêvanî li derveyî vê nîrxandinê ye. Karakterên jin di nav sînorên civaka bavixsalar û rolên zayenda civakî ve hatine sînorkirin û jin wekî objeya van romanên xuya bûye. Di van romanên de nêrîna bavixsalar ya li jinê, li ser nêrîna karakterên mêr jî hatiye analîzkirin û zîhniyeta merserwer ya di van romanên de hatiye tesbîtkirin.

Xebat ji destpêk, beşa yekem û beşa duyem pêk tê. Di destpêkê de, mijar, armanc, rêbaza xebatê û sînorên xebatê hatine dayîn. Di beşa yekem de femînîzm, pêl û cureyên femînîzmê û rexneya femînîst ya edebîyatê cî digire. Di beşa duyem de jî romanên nivîskarên mêr bi rexneya femînîst ya edebîyatê hatine dahûrandin û karakter û mijarên bîngêhî ên romanên hatine analîzkirin.

Peyvên Sereke: Nivîskarên Mêr, Femînîzm, Rexneya Femînîst ya Edebîyatê, jin, Zayenda Civakî, bavixsalarî.

ÖZET

Edebi metinler farklı eleştiri yöntemlerinin odak noktası olmuştur. Bu yöntemlerden biri de feminist edebiyat eleştirisidir. Bu çalışmada da dört Kürt erkek romancının (Sebrî Sîlêvanî, Meryema- Helîm Yusif, Sobarto- Bavê Nazê, Dara Pelweşiyayî ve Ferhat Pîrbal, Heft Wêney Rûtî Jinî Cenabî Wezîr) birer romanı, feminist edebiyat eleştirisi yöntemiyle incelenmiştir. Bu romanlarda kadın karakterler analiz edilerek kadınların ataerkil toplum içerisindeki konumunun, yazar tarafından romanlara nasıl yansıdığı ortaya çıkarılmaya çalışılmıştır. Yazarların, kadın karakterleri kurgularken ataerkil bakış açısından nasıl etkilendiği, toplumsal cinsiyet rollerinin, cinsiyetçiliğin, ne şekilde ortaya çıktığı tespit edilmeye çalışılmıştır.

Bu çalışmada yer alan romanlarda, kadın karakterler çoğunlukla fiziki yönleriyle betimlenmiş ve daha çok dışilikleriyle ön plana çıkarılmışlardır. Bu kadınların duygu ve düşünce dünyalarının göz ardı edildiği gözlemlenmiştir. Ancak Sebrî Sîlêvani'nin, Meryema karakterini bu tespitin dışında tutuyoruz. Kadın karakterler; ataerkil toplumun toplumsal cinsiyet sınırları içerisinde sınırlandırılmış ve bu kadınların, romanların nesnesi konumunda oldukları görülmüştür. Bu romanlarda ataerkil toplumun kadına bakış açısı, erkek karakterlerin bakış açıları üzerinden de incelenmiş ve erkek egemen zihniyetin yansımaları tespit edilmeye çalışılmıştır.

Bu çalışma giriş kısmı, birinci bölüm ve ikinci bölüm olmak üzere üç bölümden oluşmaktadır. Giriş kısmında çalışmanın konusu, amacı, sınırlılıkları ve yöntemi belirlenmiştir. Birinci bölümde feminizm, feminizmin dalgaları, çeşitleri ve feminist edebiyat eleştirisi üzerinde durulmuştur. İkinci bölümde ise erkek romancıların romanları feminist edebiyat eleştirisi açısından incelenmiştir. Bu romanlardaki karakterler ve öne çıkan konular analiz edilmiştir.

Anahtar Kelimeler: Erkek Yazar, Feminizm, Feminist Edebiyat Eleştirisi, Kadın, Toplumsal cinsiyet, Ataerkillik

ABSTRACT

Literary texts have been the focus of different criticism methods. One of these methods is feminist literary criticism. In this study, four novels written by four Kurdish male novelists (Sebrî Sîlêvanî, Meryema-Helîm Yusif, Sobarto-Bavê Nazê, Dara Pelweşiyayî and Ferhat Pîrbal, *Heft Wêney Rûtî Jinî Cenabî Wezîr*) were examined by feminist literary criticism method. By analyzing the female characters in these novels, it has been tried to reveal how the position of women in the patriarchal society is reflected in the novels by the author. It was tried to determine how the authors were influenced from the patriarchal point of view while constructing female characters, and how gender roles, sexism emerged.

In the novels included in this study, female characters were mostly portrayed in terms of their physical aspects and came to the forefront with their femininity. It was observed that the emotion and thought worlds of these women were ignored. However, we exclude the character of Meryema from Sebrî Sîlêvan's novel. Female characters are confined within the gender boundaries of the patriarchal society and it is seen that these women are the objects of novels. In these novels, the point of view of patriarchal society towards women is examined from the point of view of male characters and the reflections of male dominant mentality are tried to be determined.

This study consists of three chapters: The introduction part, the first part and the second part. In the introduction part, the subject, aim, limitations and method of the research are determined. In the first chapter, feminism, the waves of feminism, the types of feminism and feminist literary criticism are emphasized. In the second part, the novels of male novelists are examined in terms of feminist literary criticism. The characters and prominent topics in these novels are analyzed.

Keywords: Male Writer, Feminism, Feminist Literary Criticism, Women, Patriarchy

NAVEROK

PÊŞGOTIN	I
KURTE	III
ÖZET	IV
ABSTRACT	V
NAVEROK	VI
KURTEBÊJE	IX
DESTPÊK	1
MIJAR Û GIRINGIYA XEBATÊ	3
ARMANCA XEBATÊ	5
SÎNORÊN XEBATÊ	5
ASTENGIYÊN XEBATÊ	6
RÊBAZ	7
BEŞA YEKEM : FEMÎNÎZM	9
1.1. SÊ PÊLÊN FEMÎNÎZMÊ	10
1.1.1. Pêla Yekemîn.....	10
1.1.2 Pêla Duyemîn.....	11
1.1.3. Pêla Sêyemîn.....	13
1.2. CUREYÊN FEMÎNÎZMÊ	13
1.2.1. Femînîzma Lîberal.....	14
1.2.2. Femînîzma Marksîst	15
1.2.3. Femînîzma Radîkal	16
1.2.4. Femînîzma Sosyalîst	18
1.2.5. Femînîzma Postmodern	20
2. REXNEYA FEMÎNÎST A EDEBIYATÊ	25
2.1. Bi navenda nivîskar Rexneya Femînîst a Berê Wê li Jinê	28
2.2. Bi Navenda xwendevan Rexneya Femînîst a Berê Wê Li Nivîskar	30
BEŞA DUYEM	32
ANALÎZA ROMANÊN NIVÎSKARÊN MÊR ÊN KURD	32

3.1. Sebrî Silêvanî - Meryemaya.....	32
3.1.2. KARAKTERÊN JIN	33
3.1.2.1. Meryema	33
3.1.2.2. Mencilê.....	38
3.1.2.3. Narîn.....	39
3.1.2.4. Meyrê	39
3.1.2.5. Şeyma.....	40
3.2. Bavê Nazê - Dara pelweşiyayî.....	40
3.2.1. KARAKTERÊN JIN	42
3.2.1.1. Perwîn	42
3.2.1.2. Xwesûya Perwînê.....	45
3.2.1.3. Diya Şerzad	45
3.3. Helîm Yusif – Sobarto	46
3.3.1. KARAKTERÊN JIN	48
3.3.1.1. Belqîs	48
3.3.1.2. Xanim.....	52
3.3.1.3. Pîra Felekê.....	54
3.3.1.4. Hemîda	55
3.3.1.5. Firyal	56
3.3.1.6. Sîlva	58
3.4. Ferhad Pîrbal – Heft Wêney Rûtî Jinî Cenabî Wezîr	59
3.4.1. Karakterên Jin	62
3.4.1.1. Kelsûm	62
3.4.1.2. Margirêt.....	63
3.5. MIJARÊN BINGEHÎN ÊN HER ÇAR ROMANAN.....	64
3.5.1. Keçanî (Bekaret).....	65
3.5.2. Namûs	69
3.5.3. Jin Wekî Objeyekê.....	72
3.5.4. Texeyûla Cî û Neteweyan Wekî Jinê Û Desthilatdariya Cinsî.....	75
3.5.5. Baviksalarî û Rolên Zayendî.....	78
3.5.6. Ensest.....	83

ENCAM.....	86
ÇAVKANÎ.....	89



KURTEBÊJE

amd.: amadekar

bnr.: binêrin

brh.: berhevkar

c.: cild

ç.: çap

dnd.: di nav...de

hb.: heman berhem

hg.: heman gotar

hr.: heman rûpel

ht.: heman tez

hwd.: her wekî din

j.: jimar

r.: rûpel

rr.: ji rûpela...heta rûpela

wer.: wergêr

weş.: weşan/weşanên

yd.: yên din

DESTPÊK

Gava ku mirov li dîrokê dinihêre, ji bo pêşketin û wekhevî li nav mirovahîyê pêk bê, gelek teori û fikir, xuya bûne. Van nêzîkahîyan xwestine, newekhevî û neheqîyên ku di nav civakê de derketine holê, bi dîtînan xwe ji holê rakin. Piraniya van dîtînan bi gelemperî, nêzîkî pirsgerêkan bûne û bêtir bi çavekî mêrane rewşan nirxandine. Fikra femînîst jî berê xwe daye rewşa civakê, neheqî û newekhevîyên di navbera jin û mêran de.

Femînîzm him wekî tevger him jî wekî teorî di cîhana Rojava de derketiye holê û li her aliyê dinyayê belav bûye. Femînîzm li pey maf û azadiya jinê ketiye û xwestiye di her warê jiyane de, jin bigihîje azadiya xwe. Wekî tevgerê derketina wê xwe digihîne sedsala 19an, di serî de li Ewrûpa, Emerîka û piştê jî li welatên din ên dinyayê belav bûye. Di sedsala 19an de van tevgerên femînîst, daxwaza mafên jinan ê hiqûqî, wekhevî û siyasî kirine û di van hêlan de herçiqas têrê neke jî bûne xwedî destkeftin. Bi demê re tevgerên femînîst ên ji hev cuda, xuya bûne û di her warên jiyane de bi pey destxistina mafên jinan ketine û têkoşîn meşandine. Bi gelemperî pêkutî û çewisandina jinê, bêdengî û nebûna wê ya di nav civakê de bûye problema wan ya sereke. Ji bo vê yekê berê xwe dane zagon û qeydên pergala bavixsalar û xwestine ku vê pergale ji holê rakin. Di pergala bavixsalar de jin li gorî nêrîna mêrane di nav civakê de cî digre. Di nav pergala bavixsalarîyê de, jin li gorî sînore ku jê re hatiye dayîn tevdigere. Tiştê ku jin dikare û nikare bike di vê çarçove de diyar dibe ku ev yek jî bi rolên zayendî dihat qewîkirîn. Tevgera femînîst dixwest jinan ji nav van sînoren pergala bavixsalar rizgar bike. Ji bo vê yekê jî hin dîtin û teoriyên ji hev cuda bi pêş xistin. Bi van dîtînan xwestin ku jin di her qada jiyane de bibe xwedî gotin

Ev fikrên femînîst, xebat û tevgerên wan xwe di warên zanistên din de jî dida xuyakirin. Yek ji van zanistan jî edebiyat bû. Femînîzm, li ser newekheviya jin û mêran, bandora pergala bavixsalar û rolên zayendî disekinî û dixwest ciyê jinê di nav civakê de tesbît bike. Rexneya edebiyatê ya femînîst jî diket pey şopa van yekan, ka di metnên edebî de çawa rû dane (Humm, 2002: 11). Rexneya femînîst him berê xwe da berhemên nivîskarên jin û him jî berê xwe da berhemên nivîskarên mêr. Rexneya femînîst, li ser metnên edebî yê ku ji aliyê jinan ve hatibû pê, rawestiya. Li ser

vegotin û zimanê ku jinan bikar dianî hûr dibû û di nav vî zimanî de li feraseta jinane digeriya. Gelo jinan zimanekî ji yê mêran cudatir bikar anîbû? Hişmendiya jinbûnê, xwe li ser mijar, karakter û zimanê wan dida xuyakirin?

Ji aliyekî din ve jî li ser metnên nivîskarên mêr disekinîn. Nivîskarên mêr di berhemên xwe de, karakterê jin çawa afirandibû, bandora bavixsalariyê, kodên zayenda civakî, zayendîtî, tîpên klîşe yên jin çawa hatibûn sêwirandin? Nivîskarên mêr, jinê di nav zimanekî çawa de şayesandiyê? Ev ziman ji feraseta bavixsalariyê çiqas xweyî bûye? Ev hemû pirs, pirsên rexneya femînîst bûn, rexneya femînîst, di perspektîfa van pirsan de, li ser metnên nivîskarên mêr hûr dibû. Me jî li gor vê nêrînê berê xwe da romanên nivîskarên kurd ên mêr ku mijara teza me. Me jî bi çavê rexneya femînîst ev roman xwendin û li ber ronahiya vê rêbazê roman şîrovekirin.

Gava em bala xwe didin, rewş û derçûna romana kurdî, em dibînin ku merhelaya ku romana kurdî borandiyê, ji merheleyên romanên gelên din cudatir e. Ev yek jî helbet bi rewşa kurdan û bi bikaranîna zimanê wan ve girêdayî ye. Qedexyên li ser ziman û rewş û mercên perçeyên ku kurd lê dijîn, li ser pêşketina romana kurdî bandoreke neyînî kiriye.

Yekemîn romana kurdî ji aliyê Erebe Şemo (1935) ve li Yerîwanê hatiye çapkirin (Ahmedîzade, 2011). Piştî Erebe Şemo, demeke dirêj romanên kurdî nehatine weşandin. Di navbera salên 1970-1980an de hejmara romanên kurdî hîn gelek kêr bûn. Piştî salên 1980yan li derveyê welat romanivîsên kurd xuya dibin. Li Tirkîyeyê jî bi sistbûna qedexeya li ser ziman re piştî salên 1990an hejmara romanên kurdî zêde dibin. Çawa di edebiyata dinyayê de, serê pêşî afirînerên berhemên edebî, bêtir mêr in; di edebiyata kurdî de jî ev yek wisa ye. Helbet nivîskarên jin jî di cihana edebiyata kurdî de ciyê xwe girtine. Lê belê hejmara nivîskarên jin, ji tiliyên pêçiyên derbas nabe. Sebebê kêmbûna jinan ya di edebiyata kurdî de ji aliyekê ve bi rewşa kurdan ya neteweyî û siyasî ve girêdayî be, ji aliyekî ve jî bi civaka kurdan ya bavixsalar ve girêdayî ye.

Di biwara edebiyatê de, jin dereng xuya dibe. Dereng derketina jinê ya di edebiyatê de jî dibe seba jin di metnên edebî de ji aliyê mêran bê vegotin. Jina ku derdikeve pêş, jina ji aliyê mêran ve hatiye şayesandin. Di nav civaka bavixsalar de, ciyê jinê bi rolên zayendî ve sînorkirî ye. Ji xeynî cudayiyên biyolojîk, zayenda jin û

mêr kirasekî din li xwe kiriye, ev kiras kirasê zayenda civakî ye. Jin di nav zimanê serdest ê nêr de dirûv girtiye û di nav van sînoran de hatiye qefaltin. Rexneya femînîst ya edebiyatê jî bi vê perspektîfê nêzîkî berhemên nivîskarên mêr bûye. Rexneya femînîst jî ji aliyekî ve balê dikişîne, nîrxên civaka baviksalar û rolên zayendî, ka di metnên nivîskarên mêr de, çawa xwe dane der. Nivîskarên mêr, gava karakterên xwe yên jin afirandine, ew jî bi hişmendiyê mêrserwer tev geriyane. Tîpên klîşe yên jin, ku di hişê civakê de cî girtine, di nav zimanekî nêr de, derbasî nav metnên nivîskarên mêr jî bûne. Gelek caran ev jin ji objeyê wêdetir, tu rolan negirtine ser xwe.

Ev nêzîkbûna giştî ya nivîskarên mêr, xwe di nav metnên nivîskarên mêr ên kurd de jî nîşanî me dide. Di romanên nivîskarên mêr ên kurd e, ên bûne mijara teza me; heman nêrîna nêrane serdest e. Em ê jî di vê xebata xwe de, li dor vê perspektîfa femînîst, romanên me hilbijartine bi vî çavî binîrxînin. Ev dahûrandin dê li ser karakterên jin û hin mijarên ku derdiketine pêş, bê kirin.

MIJAR Û GIRINGIYA XEBATÊ

Di nav metnên edebî de roman cîyekî girîng digire. Roman her çiqas xwedî rasteqîniya çîroksaziyê be jî, ev rastî xwe ji rastiya civakê neşûştîye. Mirov dikare bibêje bêtir di dema modern de, roman portreyê civakî, siyasî, çandî û îdolojîk jî pêşkêşî me dike. Nivîskar rastî û karakterên civakê, di nav çîroksaziya romanê de cardin vedihone. Helbet di honandina mijaran de zayenda nivîskar jî xwedî bandoreke berbiçav e. Piraniya romanên ji aliyê nivîskarên mêr ve tîpên nivîsandin, bi nêrîneke nêrane teşe girtine. Bi taybetî di avakirina karakterên jin de ev nêrîn xwe dide xuyakirin. Jina ku di nav metnan de xuyabûye, jina ku di hişmendî û binhişîna nivîskar ve girêdayî ye. Helbet hişmendiya nivîskar jî ji civaka baviksalar ne azad e. Di civaka baviksalar de jin, di nav rolên zayendî de û bi zimanekî nêrane hatina hepiskirin. Jin di nav van sînorên ku jê re hatiye dayin de bûye xwedî nasname. Gava em bala xwe didin metnên nivîskarên mêr, em dibînin ku ev taybetiyên baviksalarîyê bi awayekî xwe di nav metnên wan de, bi cî kiriye. Nivîskarên mêr karakterên xwe yên jin li gorî dilê xwe diafirînin. Van karakteran bêtir bi zayendîtiya xwe ve derketine pêş û bêtir karê objeyê girtine ser xwe. Ev feraseta nivîskarên mêr, bi nivîskarên romannivîsên kurd ên mêr re jî xuya bûye. Di nav civaka kurd de jî

pergala bavixsalarîyê bi awayekî xurt dimeşe. Nivîskarên (mêr) ji nav civaka kurd derketine, her çiqas wekî kesên pêşverû û ronakbîr xuya bibin jî, xwe ji zihnîyeta nêrane xelas nekirine. Bi zanebûn an bê zanebûn, jinên ku bi pênuşa wan afirîne, di nav zihnîyet û zimanekî nêrane de, sînorkirîne. Jinên ku di metnên wan de derketine pêşberî me ji perspektîfa wan diruv girtine.

Mijara xebata me jî romanên nivîskarên mêr ên kurd in. Romanên ku me hilibijartine ev in: Sebrî Silêvanî, *Meryema* (2011), Helîm Yusif, *Sobarto* (2014), Bavê Nazê, *Dara Pelweşiyayî* (2010) û Ferhat Pîrbal, *Heft Wêney Rûtî Jinî Cenabî Wezîr* (2014). Ev roman bi hûrnêrîneke rexneya femînîst ya edebîyatê ve hatine analîzkirin, ji ber ku perspektîfa rexneya femînîst, berê xwe dide taybetîyên ku me li jor behs kir.

Rexneya edebîyatê, ji gelek aliyan ve pêş ketiye û gelek teorî û şeweyê rexneyê di vî warî de hene. Rexneya femînîst jî yek ji awayên rexneyê ye ku hêmaya jinê, li ser metnên edebî tesbît dike. Di edebiyata kurdî de her çiqas rexne zêde bi pêş neketibe jî, mirov dikare di gelek waran de mînakên rexneyê bibîne. Lê belê dema em lê dinihêrin bi taybetî li ser romanên kurdî, ji ber ku mijara me roman e, rexneyeke ku bi nêrina femînîst hatibe kirin em nabînin. Heta niha di edebiyata kurdî de xebatên ku bi nêrina rexneya femînîst, li ser romanên nivîskarên mêr hatibin kirin tune ne. An hebin jî em hay jê tune ne. Li ser romana Sebrî Silêvanî, *Meryemayê* di kovara *Wêje û Raxneyê* de gotareke bi navê; *Di Warê Analîza Têgeha Zayendperestiya Civakî De Berhema Sebrî Silêvanî Ya Bi Navê Meryemayê*” ji aliyê Emîn Aslan ve hatiye nivîsîn pêştir, em rastî tu xebatan nehatin. Di çarçoveya rexneya femînîst de teza Songul Dogan ya mastirê; *Bi Rêbaza Rexneya Femînîst Lênerînek Li Romanên Jinên Kurd (2018)* (Ev xebat bi rêbaza rexneya femînîst hatiye kirin û ji bo rewşa femînîzmê di nav kurdan de jî xwedî agahîyên hêja ye), heye. Ev xebat li ser romanên nivîskarên jin e. Ji ber ku li ser berhemen kurdî, xebatên bi vî rengî (bi nêrina femînîst) kêmtir in, ev yek dibê sedema ku berhemen kurdî tenê bi nêrîneke nêrane bînin xwendin. Rexneya femînîst ya navend-xwîner û berê wê li jinê, bi çavê xwendevaneke jin li berhemen nivîskarên mêr dinihêre û dinirxîne. Em jî bî vî çavî nêzîkî romanên me hilibijartibû, bûn. Me xwest bi çavekî din van romanên bixwînin û valahîya di edebîyata kurdî de ya di vî warî de heye, hindik be jî dagirin û wekî xwînerêke jin van romanên binirxînin.

ARMANCA XEBATÊ

Di vê xebatê de armanca me ew e ku; em romanên nivîskarên mêr ên kurd, bi nêrîna rexneya femînîst ve girêdayî analiz bikin. Gelo nivîskarên kurd (mêr) di berhemên xwe de jîneke çawa derxistine pêş? Bi xwendina van romana em ê bikevin, pey pirska ka jin bi çi awayî di romanên van nivîskaran de cî girtiye? Romannivîsên mêr karakterên xwe yên jin, çawa afirandine, gelo di vê afirandinê de nêrîna xwe ya nêrane çawa dane xuyakirin? Herweha di berhemên wan de karakterên mêr bi çi nêrînê li jinê nihêrtine? Zîhniyeta bavixsalar û zayendperestiya wê, li ser wan bandoreke çawa kiriye û çawa daxilî romanên wan bûye? Gelo jin, wekî takekesekê bûye “kirdeya” van romanên an wekî kesayetiyên bê karîger wekî obje xuya bûne? Jin di nav têkiliyên civakê û têkiliyên bi zayenda mêr re çawa hatiye şayesandin, ev şayesandin bi zimanekî çawa der bûye?

Em ê li dor van pirsan, hewl bidin, berhemên nivîskarên mêr ên kurd analiz bikin û li bersiva van pirsan bigerin. Bi rêya xwendin û vê analizê portreya karakterên jin di romanên de derxin holê. Mijarên bi van pirsên me ve girêdayî tespît bikin û nêrîna nivîskarên mêr li ser van mijaran ronî bikin. Em ê bibinin ka jin di berhemên edebî yên mêran de bûne xwedî kîjan erk.

SÎNORÊN XEBATÊ

Xebata me li ser çar romanên nivîskarên kurd e. Romanên navborî* ji aliyê nêrîna bavixsaliyê ve nimûneyên şênber di hundirinin. Helbet ji xeynî van romanên, bi dehan romanên kurdî hene ku nivîskarên wan mêr in. Lê him ji aliyê wext û him ji aliyê bergehê ve ne pêkan e ku em dikaribin li ser hemû romanên bisekinin.

Romannivîsên ku me hîlbijartine, ji Başur û Rojava nin. Rewşa nivîskaran jî wekî rewşa kurdan perçekiriye. Jiber ku ev nivîskar, ji perçeyên cuda ên erdnîgariya kurdan in, dibe ku romannivîsiya wan jî di pêvajiyên cuda de bi pêş ketibe. Her çiqas rewşa civaka kurd li van perçeyan jî hev cuda dirûv girtibe û di navbera perçeyên kurd lê dijîn de ciyawazî hebîn jî, rewşa jinê di nav civaka kurd de kêma zêde nêzîkî hev e. Jina ku ji pênuşa nivîskarên mêr afiriye, di nav sînorên hişmendiya nêrane de maye.

* Sebrî Silêvanî, *Meryema* (2011), Helîm Yusif, *Sobarto* (2014), Bavê Nazê, *Dara Pelweşiyayî* (2010) û Ferhat Pîrbal, *Heft Wêney Rûtî Jinî Cenabî Wezîr* (2014).

Di vê xebatê de, sedema ku me ev roman hîlbijartin jî ew e ku; di van romanên de hêmayê jinê di nav kevneşopîya bavîksalariyê de şêwe girîye. Di van romanên de zihniyeta bavîksalariyê xwe di vegotin û şayesandina karakter û mijaran de, bi awayekî eşkere daye rû. Di van romanên de (taybetî romana Meryema) nîqaşên li ser pîrsgirêka jinê û mijarên ku li ser bedena jinê, cî digirtin. Mijarên wekî keçani, zayenda civakî, zayendperestî û hwd. Zêde berbiçav bûn. Helbet wekî me got gelek romanên nivîskarên mêr (ên Kurd) hene lê belê ne pêkan bû ku em xwe bigihînin hemûyan û wan bikin mijara xebata xwe ji ber vê yekê jî me tenê ev roman hîlbijartin. Me xebatê, bi dahûrandina karakterên jin û mijarên bingeîn ên ku me li jor bahs kir bi sînor kir. Di vê dahûrandinê de me nêrîna karakterên mêr jî da. Helbet analîza karakterên mêr bi serê xwe jî mijareke rexneya femînîst e, lê belê me bi taybetî ev yek nekiriye. Me nêrîna karakterên mêr di nav dahûrandina karakterên jin û mijarên em li ser sekinîne daye.

Gava em li cihana edebiyatê dinihêrin, berhemên edebî bi awayekî akademîk ji aliyê rexneya feminist ve bi hûrgilî hatine dahûrandin. Lê ku em bala xwe didin dinyaya edebiyata kurdî, xebatên bi vî rengî (ji xeynî xebata Songul Doğan) kêma in an hebî jî me xwe negihandiyê. Li gor me, hewcedariya nîrxandina berhemên kurdî jî, bi nêrîneke femînîst heye. Divê berhemên nivîskarên mêr bi nêrîna femînîst bî xwendin û analîzkirin.

ASTENGIYÊN XEBATÊ

Di xebata me de çend astengiyên ku derketin pêşîya me hebûn. Yek ji van astengiyên ew bû ku li ser berhemên nivîskarên mêr, xebatên akademîk ên bi rêbaza rexneya femînîst tune bûn, da em jê sud werbigirin. Hin gotarên ku li ser romanên me hîlbijartibe hebin jî, zêde ne têkildarê mijara me bûn. Astengiyeke din a ku derkete pêşberî me, astengiya wergerê bû. Ji ber ku di kurdî de li ser teoriya femînîst lîteraturek an ferhengê tune ye. Hin têgehên ku di warê teoriya femînîst, an jî em bêjin têgehên felsefîk ên tînan bikaranîn, di zimanê kurdî de hin bi cî nebûne. Di warê teoriya femînîst û berhemên felsefîk de berhemên bi kurdî tune ne. Ev yek jî li ser lêkolînerên ku dixwazin li ser van mijaran xebatê bikin dibin asteng û ji bo me jî ev yek wisa bû. Wekî me berê jî got bi rexneya femînîst teza Songul Dogan, *Bi Rêbaza Rexneya Femînîst Lênerînek Li Romanên Jinên Kurd (2018)*, hebû (ku me jê jî sîd wergirt). Lê belê ev tenê ji bo bikaranîna hin têgehên tînan nedikir. Ji ber ku ev

xebateke bi tenê bû. Me jî li gor wateya peyvê di pêwenda femînîzmê de, li gor wateyên peyvên kurdî ev li hev anî û wergerand. Me hin têgehên li gor xwe û hin têgeh jî em ketin pey bikaranîna wan, mînak peyva “déconstructionism” herçiqas di nav kurdî de bi giştî cî negirtibe û heman wateyê nede peyvê jî li Başûr wekî “hilweşangerî” tê bikaranîn û me jî wisa bikar anî. Weki din me di bidestxistina romanên kurdî de astengî nekişandin. Lê di edbiyata kurdî de kêmasiya xebatên bi vî rengî karê me hinekî zehmet kir.

RÊBAZ

Rêbaza ku me di xebata xwe de bikar aniye, rêbaza rexneya femînîst e. Di nava vê rexneyê de, bi navenda xwendevan rexneya femînîst a berê wê li nivîskar, bûye rêbaza xebata me. Li gor vê rêbazê metnên nivîskarên mêr bi çavê xwînereke jin (qest ji jinê ne tenê ji aliyê biyolojîk ve jinbûn e, ango qesta hişmendiya jinê tê kirin.) tîn xwendin û bîrdoziya zayendî, hêmaya jinê û tîpên klîşe yên jinan li ser van metnan tîn tesbît kirin. Bi vê yekê ve girêdayî rabêja bavixsalariyê, di metnên nivîskarên mêr de çawa tîn xuyakirin bi çavên xwînera mê tîn tesbît kirin. Me jî wekî jinekê û li ber perspektîfa vê rêbaza femînîst, romanên nivîskarên mêr en kurd (ên ku me hilbijartin), xwendin û li van xalên ku me behs kir geriyên; me ew di nav romanên de tespît kirin.

Di vê xebatê de ji bo rêbaza rexneya edebiyatê ya femînîst me ji berhema Megî Humm *Feminist Edebiyat Eleştirisi*, (2002), Berna Moran, *Edebiyat Kuramları ve Eleştirisi* (1991); Josephine Donovan, *Feminist Teori*, Kate Millet, *Cinsel Politika* (2011) yê sîd wergirt. Ji xeynî van xebatan, gotara Îbrahîm Seydo Aydoğan ya li ser “Sobarto”yê û ya Emîn Aslan a li ser romana “Meryema”yê bûn hin gotarên ku me ji wan sîd wergirtine.

Di vê xebatê de, em ê di beşa yekem de, li ser femînîzmê bê ka femînîzm çî ye, sê pîlên ku wekî pîlên femînîzmê tîn binavkirin, cureyên sereke yên femînîzmê û rexneya femînîst ya edebiyatê rawestî. Rexneya edebiyatê ya femînîst çawa û ji kîjan hêlan ve nêzikî metnan dibe û analîz dike, vebêjin.

Di beşa duyem de, ku beşa analîza xebata me ye. Em ê dahurandina çar romanên nivîskarên mêr en kurd, en ku me hilbijartine, bikin. Em ê di van romanên de binihêrin ka karakterên jin bi çî awayî derketine pêş û li ser analîza van karakteran

em ê di derheqê nêrîna nivîskarên mêr ya li ser jinê de, dîtînen xwe bînin ziman. Paşê em ê xwe berî nav mijarên wekî; rolên zayendî, zayendperestî, pîrsgirêka jinê, helbet ev mijar ku bi nêrîna bavîksalariyê ve girêdayî ne, bidin. Ev mijar bi pênuşa nivîskarên mêr çawa hatine honandin? Em ê hewl bidin ku van xalên em qal dikin tespît bikin. Bi xwendineke femînîst em ê cîhana nivîsîna van nivîskarên mêr di derbarê jinê de binirxînin û fikrên xwe yê di derbarê vê mijarê de bidin. Her çiqas xebata me ne bêkêmasî be jî em hêvî dikin, xebata me bibe çirûskeke ji bo xebatên di dahatuyê di vî warî de bînin kirin. Ku hewcedariya edebiyata kurdî bi xebatên wiha heye.

Ji xeynî van her du beşan em ê encamên ku me di analîza van romanên de bidestxistiye eşkere bikin. Pirsên ku em bi du ketibûn, çî encam bidestxistin, wekî encama xebata xwe em ê van yekan bidin.

BEŞA YEKEM : FEMÎNÎZM

Femînîzm, wekî peyv cara pêşî ji aliyê civaknas û yekemîn avakerê sosyalîzmê Charles Fourier ve hatiye bikaranîn. Faurier wekî dahênerê vê bêjeyê hatiye pejirandin (Notz, 2011: 11-35). Ev têgeh di ferhenga Robertê de jî wekî; “doktrîna bidestxistina mafê jinan û berfirehkirina rola wan a di civakê de” tê pênase kirin. (Michel, 1993: 6). Ji bo têgeha femînîzmê gelek pênase hatine kirin. Her çiqasî nêzîkayiyên femînîst, bi gelemperî wekî li dijderketina çewisandina jinan bê zanîn jî, pênaseyeke yekgirtî ya femînîzmê gelek zehmet e. Ji gelek aliyan ve pênaseya wê hatiye kirin û di pirtûkên dersan de, di jiyana rojane de cî girtiye (Ramazanoğlu, 1998: 23). Her çiqas jî derbarê pênasekirina femînîzmê de fikrên cuda hebin jî, ger mirov pênaseyeke bisînor bike, femînîzm an jî cureyên femînîzmê, dîsîplîn û tevgerê e ku di nav civakê de pêşbîniya berfirehkirina rol û mafên jinan dike (Sevim, 2005: 7).

Femînîzm tenê ne wekî têgeh, wekî tevgerê divê bê zanîn; “tevgereke ku hewl dide; zayendîtiyê, kedxwariya zayendî û zextên li ser zayendê ji holê rake” (Hoks, 2016: 9). Wekî tevger ji ber ku gelek şaxên femînîzmê hene, ew ji fikreke yekgirtî an ji tevgerê yekgirtî pêk nehatiye. Femînîzm wekî tevger, di nav civakê de li dû berfirehkirin û bi destxistina mafê jinan digere. Fikra femînîst, bi demê re pêş ketiye û di nav van du sed salên dawî de gelek merhele borandiye. Gelek tevgerên ku li ser fikra azadiya jinan meşiyane, bi demê re him di daxwazên xwe de, him jî di bîrdoziya xelasiya hemzayendên xwe de, ciyawaziyek nîşan dane. Ji ber vê yekê gelek cûreyên femînîzmê derketine ku her yek ji wan li gor serdem û bîrdoziya xwe reaksiyon nîşan dane. Ev yek jî bûye sedem ku tevgerên femînîzmê, li gor derketina xwe ya dîrokî û fikrên ji hev cuda bîrdoziya kirin. Dîroka femînîzmê bi piranî wekî sê pêlan tê kategorîzekirin. Ev dabeşkirin li gor pêşketina dîroka femînîzmê tê kirin. Di dabeşkirina her sê pêlan de him taybetiyên demê, him jî perspektîf û daxwazên ku jinan derxistiye pêş jî li ber çav hatiye girtin. Helbet ên ku li dijî vê kategorîzekirinê derketine jî hene. Kesên mîna Josephine Danovan kategorîzekirina bi vî awayî bi problem dibîne. Pêla femînîzmê ya yekemîn wekî sedsala 19an û ya duyemîn jî, duyemîn çaryeka sedsala 20an tê nîşandan. Lê belê li gor Danovan pêlên femînîzmê, di sedsalên 15. 16. û 17an de jî tê dîtin. Jinên vê

demê jî li dijî destdirêjî û tundiyê derdiketin û perwerdehiyeke bidad û li hember xwe hurmetê daxwaz dikirin (Danovan, 2016: 14-15). Emê jî li vir femînîzmê him li gor dabeşkirina sê pêlan him jî li gor cureyên femînîzmê bidin.

1.1. SÊ PÊLÊN FEMÎNÎZMÊ

Dabeşkirina femînîzmî wekî sê pêlan li gor pêşketin û geşedana femînîzmê hatiye kirin. Kategorîzekirina van pêlan wekî me li jor jî rave kir, li gor taybetiyên tevgerên femînîst ku di xwe de dihebandin û li gor demê hatiye kirin. Em ê jî li vir taybetiyên van pêlan bidin.

1.1.1. Pêla Yekemîn

Tevgerên femînîst, wekî sê pêlan tê kategorîzekirin lê belê çiqas jî ku mirov nikaribe sînorkirineke teqez jê re deyne jî tevgera femînîzmê wekî pêla yekem, di civakê de ji bo parastina mafên jinan yên wekhevî, hiqûqî û sîyasî, derketiye pêş. Ev jî xwe digihîne pêla yekem a burjûvayê, Şoreşa Fransayê 1789 û Şoreşa Emerîkayê 1776an (Mies, 2011: 61). Bi sînorkirina wê her çiqas zehmet be jî, çarçoveya vê pêlê di dawiya sed sala 19an û destpêka sed sala 20an de, bi berhema Mary Wollstonecraft ya bi navê *Vindication of the Rights of Women* (Parastina Mafên Jinan) hatiye danîn. (Taş, 2016: 167). Him li Emerîkayê him jî li Fransayê tevgerên azadîxwaz, di civakê de derdiketin pêş û mafên wekhevîyê ji bo hemû mirovan dixwestin. Bi Şoreşa Fransayê re fikrên wekî; azadî, wekhevî û biratî ku di nav civakê de bilind dibû, helbet wê tenê ne ji bo çîna burjûvayê bûna. Dê hemû aliyên ku dihatin çewisandin (proleter, neteweyên di bin mêtîngeriye de û helbet jin) ji xwe re parekê derxistana. Jinan wekî aliyên ku ji gelek mafan hatibûn bidûrxistin, ev maf ji bo xwe jî talep kirin.

Pêla yekem, ji bo bidestxistina mafê jinan bêtir mijarên wekî; di perwerdehiye de mafên wekhevîyê, mafê dengdayînê û mijarên wekî zewac û hevberdanê derxistiye pêş. Ji ber vê yekê jî, mirov dikare bibêje ku daxwazên vê demê wekî daxwazên lîberal in. Danovan, ji ber taybetî û daxwazên tevgerên demê vê pêlê bi sernavê “femînîzma lîberal” bi nav dike, (Danovan, h.b.: 20-29). Têkoşîna tevgerê, ji bo daxwazên wekhevî û bi destxistina mafên jinan ên hiqûqî û sîyasî bi pêş dikeve. Lê belê mirov dikare bibêje ku berê tekoşîna femînîzmê ya pêla yekem,

ne li mêt û pergala bavixsaliyê bû. Bêtir berê xwe dabû birêveberê qada giştî, ango dewletê (Mies, 2011: 63). Bi vî awayî pêla yekem, jêpîrsîna hebûna pergala heyî û ya bavixsaliyê nekiriye. Bidestxistin û daxwaza mafan di nav çarçoveya pergale de xwestiye. Vê yek jî ji pergala bavixsaliya ku sedemên çewisandina jinan bû re çareseriyekê neanîye.

Wekî rexneyekê ku li vê tevgera pêşî tê kirin, ew e ku, ev pêl bêtir li ser mafên jinên çîna navîn sekiniye. Jinên çînen din piştguh kiriye. (Mies, h.b.: 387) Ji ber vê jî ev tevgera femînîst, wekî tevgera mafparêz a çîna jinên serdest tê zanîn. Tevlîkirina jinan ya qada giştî xaleke sereke bû ji bo vê pêlê. Jin bi veqetandina sînoren teqez ên rolên civakê re rûbirû mabûn. Van sînoran jinan ji jiyana civakî dûr dixist û ew di nav sînoren malê de diqefalt. Pêla yekem a femînîzmê van deriyên sînoran daf didan û ji jinên çîna navîn re cî vedikir.

Bi têkoşîna tevgerên jinên vê demê re tiştekî din ê ku hatibû bidestxistin jî mafê dengdayîne bû. Di sedsala 19an de êdî li gelek deverên welatên Rojava û dinyayê di vî warî de bidestxistiyên wan çêbûn.

1.1.2 Pêla Duyemîn

Ev tevgera ku wekî pêla duyemîn tê binavkirin di nîveka sedsala bîstan de dest pê kiriye. Ev pêl wekî femînîzma radîkal jî hatiye binavkirin. Lêkolînên femînîstên radîkal ên di salên 1970yî de çawa ku bal kişandiyê ser cudahiyan di navbera jin û mêran de her wisa cudahiyan di navbera jinan de yê wekî; nijadî, çînî û çandî jî destnîşan kiriye (Ramazanoğlu, h.b.: 133-134). Ev pêl ji pêla yekem cudatir tev geriyaye. Pêla yekem bêtir li dû mafên ferdî û hemwelatî lê pêla duyem bêtir li ser mijarên civakî û azadiya jinan geriyaye.

Pêşketina vê pêlê, li gor dînamîkên welatên ku lê derdiket pêş diguherî. Li Emerîkayê Tevgera Mafên Mirovan, Tevgera Wekheviya Reşikan bandoreke erênî li ser jinên vê pêlê kir. Ev pêl, li Fransa û li Elmanyayê ji nav tevgera 68an derket. Jinên ku di nav bizavên sosyalîst de têdikoşiyar li xwe mikur hatibûn ku bi angaşten tevgerên çep ku xelasiyê di azadiya çînî de didîtin dê ji çewisandina jinê re nebûna derman. Jin li wir jî xwe dîsa weke çîna duyem didîtin. Bi vî awayî li gelek welatan bi tevger têkoşîna xwe daxwazên xwe bilind kirin (Düzkan, 2011: 177-180)

Her wiha jinên ku li DYE yê û li Ewrûpayê di zanîngehan de perwerde dîtin wekî nivşekî nû derketin holê. Van jinan, ji zanînen mîna; kîmya û tibê haydarbûn û ciyawaziyên di navbera zayendîbûn û zayîne de ji hev veqetandin. Jinan, dîtina jinê ya wekî objeyeke cinsî, destdirêjiyê wekî sûcekî giran nehesibandin û herweha jinan qebûl nedikirin ku çawa xwedî pîşe be, lê disa jî hemû karên malê jê bê xwestin. (Arat, 2010: 70). Di vê demê de bandora jinên ku bi awayekî ne tendurustî kurtaj dibûn hebû, di bin van şertan de salê bi qasî 500 jinî dihatin kurtajkirin (Walters.h.b.:132). Vê yekê jî kir ku jin di vî warî de, têkoşnekê bimeşînin û mafê kurtajê bi dest bixin. Vî nifşî, bêtir têkoşneke di warê azadiya jinan de meşand.

Pêla duyem dixwest ku jinên ku ji “qada taybet” (nava malê) de dihat hepskirin derxe û problemên “qada taybet” derbasî “qada giştî” bike. Qada taybet wekî ciyê mahrem dihate dîtin ku jin di wir de, di bin serweriya mêran de dihate çewisandin. Pêla duyem bi dirûşma “tiştê takekesî polîtîk e” gelek deng veda bû. Bi vê rêyê jinan dixwest, nasnameya jinîtiyê ya tepisandî derkeve holê û “tiştê takekesî” derbasî qada giştî bibe (Arat, h.b.: 75). Vê dirûşmê ji bo jinan hevpariyekê çêdikir û rê vekir ku destdirêjî û şeweyên tundiya ku ji aliyê mêran ve tê kirin jî veguheze qada siyasî. Û di dinyaya serdest a mêran de, pênaseya “xuşkatiya gerdûnî” ya ku tê çewisandin, bê naskirin. Mirov dikare bibêje ku vê pênaseya “xuşkatiya çewisandî” ya gerdûnî, di nav jinên cîhanê de, fikrek ava kir ku hay ji hev hebin; bi hev re têkiliyê deynin û îttîfaqekê saz bikin. Bi vê rêbazê jî di têkiliyên bavixsalariyê de guherînekê bikin. (Ramazanoğlu, h.b.: 31-32).

Piştî Şerê Cîhanê yê Yekemîn li gelek welatan destkeftiyên pêla duyem çêbûn. Cara pêşî Neteweyên Yekbûyî, di sala 1947an de, Komîsyona Lêkolîna Pozîsyona Jinan ava kir. Piştî du salan jî komîsyonê, jin û mêran ji aliyê zewacê ve xwedî heman mafan dît. Di heman demê de Danezana Mafên Mirovan weşand. Di danezanê de dihat gotin ku jin wekî dayîk pêdiviya wê lixwenihêrîn û rêberiyê heye (Walters, 2005: 136). Herwiha, tevgera jinan a pêla duyem, di keda bêheq ya karên malê de, xwedîkirina zarokan û di kontrola zarokanîne de, jin di bin zextê de didîtin. Sedemên vê zextê jî wekî sedemên civakî û aborî dihesibandin.

1.1.3. Pêla Sêyemîn

Di dawiya salên 1980yî de pêla duyemîn a ku di salên 1960an de dest pê kiribû li hemberî pirsgerêkên demê bê karîger mabû. Ji ber vê jî di van salan de ciyê xwe ji tevgera femînîst a din re hiştibû (Öztarhan, 2006: 31). Divê bê destnîşankirin ku mirov nikare pêla duyem û pêla sêyem bi sînoren teqez ji hev veqetîne, ji ber ku pêla sêyem car caran hêmanên pêla duyem diparast û carna jî di bin karîgeriya wê de dima. Di nav van bizavan de hem cudahî hem jî aliyê ku dişibiyan hev hebûn. Vê pêkhatiya ku hemû bizavên femînîzmê di bin banê xwe de dihewand, wekî pêla femînîzmê ya sêyem dihate binavkirin. Ev têgeh piştî pêla duyemîn, nêrînen femînîst ên ji hev cuda di hundirê xwe de dihewand (Öztarhan, h.b.: 31).

Pêla femînîst a sêyem, ji hin aliyan ve pêla duyem rexne dikir. Aliyê ku rexne dikir jî ev bû: Pêla femînîst a duyem endamên çîna navîn û spî ne, pirî caran bi femînîzmeke ku li ser bingeha ciyawaziyên zayendî disekinî xuya bûne. Di vî alî de ciyawaziyên çînî û nijadî berçav negirtine (Walters, h.b.: 102). Di vê pêwendê de tevgera jinan a pêla sêyem, bi pirsgerêkên jinên ji çînen cuda, ji nijadên cuda re têkildar bûye. Ev pêl bawer dike ku zexta li ser jinan pircure û domdar e (Öztarhan, h.b.: 36). Tevgerê cî dida cudahiyan û vê yekê jî ji dêvla fikra gerdûnî fikra herêmî bi pêş dixist. Sedemên destnîşankirina tiştên herêmî, li gor wan femînîzmeke ku navenda wê Ewrûpa bû; yanî ji bo pirsgerêkên herêmî yên wekî tundiya nijadî, tendurîstiyê, zehmetkişandina jinên dema ku li kar digerin, gotina femînîzmê tunebû. (Walters, h.b.: 162). Bi nêrîna pêla sêyem, tevgera pêla duyem tenê pirsgerêkên jinên Rojavayî û çîna navîn anîne ziman. Ji ber vê yekê navenda tevgera femînîst ji Rojavayê derdixin; li gor vê pêlê divê hemû kes xwe di nav vê tevgerê de bibîne.

1.2. CUREYÊN FEMÎNÎZMÊ

Bi berfirehbûna fikra femînîzmê re, şîroveyan cuda, dengên cuda zêde bûn. Bi vê yekê re jî şaxên femînîzmê yên ji hev cuda derketin holê. Ji van mîna; femînîzma lîberal, femînîzma marksîst, femînîzma radîkal, femînîzma postmodern/binyadger, femînîzma Freudî/psîkanalîtîk, femînîzma çandî, femînîzma reşîk, femînîzma lezbiyen, femînîzma Dinyaya Sêyem û herweha gelek cureyên femînîzmê xuya bûn. Em ê li vir, li ser cureyên femînîzmê yên bingehîn bisekinin.

1.2.1. Femînîzma Lîberal

Femînîzma lîberal û femînîzm, bingeha xwe, ji berhema Mary Wollstonecraft a bi navê *Vindication of the Rights of Women* (Parastina Mafên Jinan) digire. M. Wollstonecraft di berhema xwe de, li ser wekheviya mafên jin û mêran disekine ku lîberalizm jî li ser mafên takekesî û hemwelatî disekinî.

Lîberalîzm xwe dispart fikra serdema ronakbûnê ya rasyonel ku vê fikrê bûyer û diyardeyan bi rêya aqil rave dikir. Serdema Ronakbûnê, di navbera dawîya sedsala 17an û dawîya sedsala 18an de ajotiyê. Di vê demê de, di gelek warên zanistî de pêşveçûn, dîtîna û nûvedanên nû belav dibûn. Bingeha van dîtînan rasyonelîte bû. Paradîgmaya Newton ku “gerdûna fîzîkî, li gor pîvanên aqilane û hêsan saz dibe” bûbû hêmayeke vê serdemê ku her tişt bi rasyonelîteyê dihat îzeh kirin (Danovan, 2016, 23-25).

Lîberalîzm, alîgirê fikra azadiyê ye. Azadî, takekesî, wekhevî ji bo hemû mirovan lazim e, û divê hemû kes ji vê yekê sûd werbigire (Balçı, 2011: 41). Maf mafên xwezayî ne, ji ber vê yekê wekî parastina mafên xwezayî jî tê dîtîna, kes nikare li hemberî mafên xwezayî û jênegere bisekine. Lê belê birewerên lîberal, ku van mafan ji bo hemû mirovan dipejirandin, di nav pênasîya ji bo herkesî de, tenê mîr didîtîna. Qesta wan ji mirovan tenê zayenda mîr bû. Fikra hemû mîrên lîberal ew bû ku; jin aîdî malbatê ye û divê di bin stariya mîrê xwe de be. Kesên wekî John Locke, ku mafên xwezayî ji bo hemû mirovan diparast jî, li ser heman nêrînê bû. Fikra parastina mafên xwezayî bûbû bingeh, ji Danezana Serxwebûna Emerîkayê (1776) him jî di Danezana Mafên Mirovan ên Fransayê (1789) re. (Danovan, h.b.: 22-27). Bi van danezana fikra azadî, wekheviya ji bo hemû mirovan, di nav jinan de jî bû ciyê hêviyê û jinên femînîst daxwaza mafên wekheviyê ji bo jinan jî xwestin.

Femînîstên lîberal jî van mafên ku ji bo hemû mirovan dihat xwestin (lê di eslê xwe de tenê ji bo zayenda mîr bû) ji bo jinan jî dixwestin û bo vê yekê têkoşînek dimeşandin. Teorîsyenên femînîst ên ku ji kevneşopîya mafên xwezayî dihatin, digotin ku; jin jî wekî hemwelatî û wekî mêran xwediyê mafên bingehîn e (Danovan, h.b: 29). Mîr di nav qada giştî de xwediyê çî mafan be divê jin jî xwediyê wan mafan be. Jina ku di nav sînorê malê de ji hemû mafan dihat mehrûmkirin daxwaza mafên

xwe dikir. Mijarên wekî mafê perwerdehiyê, mafê medenî, hiqûqî, siyasî û kar, mijarên sereke bûn. “Ji karê wekhev re heqdesteke wek hev” (Chancer, Watkins, 2013: 45) dirûşma femînîstên lîberal bû.

Femînîstên lîberal, di daxwazên mafên bingehîn de, di wekheviya jin û mêran de, çareseriyê di guhertina zagonan de didît. Rexneyê raste rast li mêran, li pergala bavixsalariyê nedikirin. Bi kûrahî li ser sedemên pirsgerêkên jinan hûr nedibûn û ev yek jî dibû sedem ku ji aliyê femînîstên din ve bihatana rexnekirin.

1.2.2. Femînîzma Marksîst

Femînîzma Marksîst bingeha xwe ji fikrên Karl Marks û Engels girtiye. Bingeha Marksîzmê ji fikra “materyalîzma dîrokî” tê. Ev yek feraseta hebûna madeyê (daringê) li pêvajoya dîrokê tîne. Li gor vê nerînê di esasê xwe de bingeha hebûnê, made ye. Ji bo hebûna madeyê pêwîstî bi tiştekî din tune ye, ji ber ku beriya her tiştî ew hatiye û vê yekê jî dike hemû heyînen din ew, dest nîşan bike. Dîroka mirovahiya jî di pêşengiya hêzên maddî de pêk hatiye (Hartman, 2006: 17-71). Li gor vê fikra Marks a navendî, “materyalîzma dîrokî” çand û civak, bingeha xwe ji şert û mercên maddî û dîrokî digire (Danovan, h.b.: 134). Di Marksîzmê de ligel fikra “materyalîzma dîrokî” hişmendiya çînî serdest e û dahurandina çînê esas e. Li gor vê Marks, mirovan ne yek bi yek lê wan wekî çînekî dinirxîne. Civaka çînî, di nav wan mercên maddî yên ku tê de dijî de, xwedî heman daxwaz û pêdiviya ye (Balcı, 2011: 45).

Femînîstên Marksîst sedemên çewisandin û bindestiya jinê, di pergala kapîtalîst û di pirsgerêka çînî de didît. Çareseriyê femînîstên lîberal ku ji bo pirsgerêka jinan didîtin, li gor femînîstên marksîst kêmbû û têrê nedikir. Di civakeke bi çîn de wekheviyeke bi yekûn ne pêkan e. Ji ber wiha jî tenê bi guherînen zagonî ev yek pêk nayê, divê pergala kapîtalîst rabe û li şûna wê pergaleke sosyalîst bê danîn. Rizgariya jinê tenê di nav pergala sosyalîst de dikare pêk were (Sevim, 2005: 64). Li gor femînîstên marksîst, pirsgerêka jinê ne di zayendiyê de lê di pirsgerêka çînî de ye. (Walters, 2005: 121-161) Sedemên bindestî û kedxwariyê di awayê hilberîn û şeweya semiyaniyê de ye. Bi civaka modern û kapîtalîzma pîşesaziyê re hilberîna ku dihat kirin nav malbatî bû û keda jina ji bo debara malê, çiyekî girîng digirt. Bi sanayîbûnê re hilberîna metayî ji navenda malbatê derbasî qada gelemperî bû. Karên

ku jinê li mal dikir wekî; xwedîkirina zarokan, çêkirina xwarinê û paqijî bêqîmet bû, wekî hilberîna nedihat dîtin. Bi giranî karên ku jin dike ne xwedî nirxê bazarê ye. Jin di nav pergala aborî de, ne hilberîner lê wekî serfkar tê dîtin, ev yek jî wê dixê rêza talî. Femînîstên Marksîst ku problemê di vê çarçoveyê de dinirxandin, bi pêşniyaziyên xwe dixwestin bêqîmetbûna karên jinê ji holê rakin. Divê karên malê bê civakîkirin û ji bo karên malê heqdest bê dayîn. Çawa ku karên perwerdehiyê ji aliyê dewletê ve tê rêvebirin, karên wekî paqijî, xwedîkirina zarokan jî, dewlet hilgire ser xwe (Demîr, 1997: 59-60).

Li gor femînîstên marksîst, di nav pergala kedxwariyê de, jin ji mêran zêdetir tîne çewisandin. Sedemê vê yekê jî “biyanîbûn”e, biyanîbûn jî encama pergala kapîtalîzmê ye. Li gor Marksîstan, biyanîbûn; mirov ji bo jiyana xwe bidomîne keda xwe difiroşe. Kesên ku keda xwe bifiroşe, ji tu karên ku dike wate û tamê nabîne; ji keda xwe dûr dikeve. Çawa ku di nav vê pergala kapîtalîst de çîna proleter ji keda xwe dûr dikeve, jin jî di pergala kapîtalîst de ji keda xwe tê bi dûr xistin. Mêr, çawa be jî bi derdora xwe ya derve û bi hevalên xwe yî kar re tê cem hev û bi awayekî sosyalîzasyonê saz dike. Lê belê jin di nav karê malê de ji keda xwe dûr ketî bêtir tê perçiqandin (Demîr, h.b.: 57).

Di nav femînîstên marksîst de, nêrînen cuda hebin jî ew, di bingeha xwe de hemfikirin ku dahurîna marksîst di problema jinê de jî rêbaza bingehîn e. Li gor wan çawa ku bêyî têkoşîna çîna civakî, pîrsgirêka jinê nayê famkirin, her wisa bi berdewambûna binyada çînî û nakokiyên wê re jî dê pîrsgirêka jinê ji holê ranebe. Ji ber ku femînîstên marksîst, pîrsgirêkên jinê ji bîrdoziya sosyalîst veneqetandine, ji aliyê femînîstên din ve hatine rexnekirin (Sevim, h.b.: 71). Femînîstên marksîst pîrsgirêka jinê di nav pîrsgirêka çînî de dinirxand, çareserîya pîrsgirêkê jî ji holê rakirina kapîtalîzmê û di pergala sosyalîst de didît.

1.2.3. Femînîzma Radîkal

Teoriya femînîzma radîkal, di dawîya salên 1960an û di serê salên 1970yan de ji aliyê grubek jinên tevgera berê, li New York û Bastonê hat bi pêşxistin. Jinên tevgerê yên ku di salên 1960an de ji bo mafên medenî têdikoşiyar û bo dijbertiya şer tevlî çalakiyên polîtîk dibûn (Danovan, h.b.: 265). Dema mirov li femînîzma radîkal a salên 1970yan dinihêre, dibîne ku ev tevger, bêtir li welatên Skandînavyayê belav

bûye. Li hemberî vê femînîzma marksîst û sosyalîst bêtir li welatên Ewrûpayê û femînîzma lîberal jî bi giranî li Emerîkayê xuya bûye. Lê belê piştî salên 1970yan bi avakirina komunên jinan re, Emerîka bûye navenda femînîzma radîkal. Li gor agahiyên femînîstên radîkal, sedemên derketina vê tevgerê; kêmmayîna teoriyên rizgariya jinê bû. Ev tawanbarî li femînîstên lîberal û marksîst dihat kirin. Bi ya wan teoriyên lîberal û marksîst, ji bo pirsgerêk û azadiya jinê bersiveke têr nedidan (Sevim, h.b.: 75).

Mirov dikare bibêje ku yekem berhema bingehîn a femînîzma radîkal berhema Shulamihî Firistone "*The Dialectik of Sex*" (Diyalektîka Zayendîtiyê) ye. Firistone di vê xebatê de li ser cudahiyan biyolojîk ên jin û mêran disekine. Li gor wê cudahiya di navbera jin û mêran de biyolojîk e. Îddia dike ku şerê çînî jî di nav de, lêkdana herî bingehîn şerê zayendî ye. Dema şoreşa femînîst pêk bê, dê jin him mekanîzmaya hilberîn him jî welidandinê, bixe dest. Bidestxistina amûrên jinûve-hilberînê re, (û pêşketina teknolojiyê) dê jin ji qedera xwe ya biyolojîk rizgar bibin. Wekî kontrola zarokanîn, plasentaya çêkirî, dola nav tûpî... Her weha bi vî awayî dibe ku mêr jî bikaribe zarokan bîne. Lê belê ev nêrîna Firistone ya ku her tiştî bi cudahiya biyolojîk ve girêdida, ji aliyê femînîstên marksîst ve dihat rexnekirin. Li gor wan ev determînîzma biyolojîk bû (Danovan h.b.: 277-282). Femînîstên radîkal, bi babeta biyolojiyê ve girêdayî, li ser babetên wekî dayîktî, kontrola li ser bedena jinê sekinîne. Li gor wan dayîktî, ji encama civakîbûnê dihat avakirin. Hîn zarokatiyê de normên civakê li zarokan tê empozekirin. Mînak zarokên keçik di zarokatiya xwe de fêrî vê yekê tê kirin ku dema mezin bibin, dê bibin dayîk. Ew li dij nêrîna ku hemû jin dixwazin bibin dayîk derketine. Bi ya wan ajoya dayîkbûnê, ji aliyê civakê ve tê hîn kirin û saz kirin. Bi gotineke din jin wekî dayîk nayên dinê piştî dikevin rewşa dayîkbûnê. Divê kontrola bedena jinê di destê wê de be ku ew karibe biryarên li ser bedena xwe bide. Zarokanîn di bin kontrola polîtîkayên dewletê de ye. Kê dê çiqas zarok bîne ew destnîşan dike. Tacîz, destavêtin, jin revandin hemî çalakîyên mêran ên li ser bedena jinê ne, herweha pornografî jî xizmeta baviksalarîyê dike. Pornografî, dibe sedema belavkirina mîta ku zayendiya jinê pasîf û mazoşîst û ya mêr jî çalak û sadîst dibîne (Demîr, h.b.: 65-66). Divê jin li ser bedena xwe xwedî biryar be. Piraniya femînîstên radîkal jinê di nav saziya zewacê de, wekî koleya

zayendî dibînin û sedema tehdeya li ser jinê zewac e (Hoks, h.b.: 34-73). Bi vî awayî ew li dijî zewacê ne, di nav zewacê de jin ji gelek aliyan ve tê perçiqandin.

Li gor femînîstên radîkal, ji bo sedemên pirsgerêka jinê baş bê famkirin, divê mirov li têkiliyên navbera zayendan binihêre, ku ev yek jî ji baviksalarîyê pêştir ne tiştêkî din e. Bi ya van femînîstan baviksalarî “zagona bavî”, “birêvebirina jina ya ji aliye mêran ve” an jî “serweriya mêran ya li ser jinan û serdestiya pîremêran ya li ser xortan” e. Pergala baviksalarîyê, bi desthilatdarî, serdestîbûn û berberiyê re heman tişt e. Baviksalarî, pergaleke xwedî dîrokeke kevn e, ku wê bi reforman neyê sererastkirin. Jin encax dikarin, bi tevahî ji holê rakirina wê rizgar bibin (Demîr, h.b.: 65). Millett jî bo baviksalarîyê dibêje “baviksalarî wisa rehên xwe berdaye ku kesayetiya di her du zayenda de ava kiriye, ji pergaleke polîtîk wêdetir, bûye fikr û şêweyeke jiyane (Millett, 2011: 109). Dirûşmeya femînîstên radîkal ku digotin “tiştê takekesî polîtîk” e dixwestin balê bikişînin ser jiyana taybet û ya qada gelemperî. Bi vî sloganê dihat xwestin ku jin jiyana xwe ya taybet divê bi xwe ava bike. Dixwestin bibêjin ku tiştê şexsî siyasî ye. Qada taybet (malbat), îdeolojiya baviksalarîyê vedişêre. Têkiliyên navmalbatî yê taybet, hemû berdewamiya vî îdeolojiyê ye. Têkiliyên jin, mîr, zarok û navmalbatî rehendê îdeolojiya siyasî ne. Di heman demê de bi vî dirûşmê, cihêtiya qada taybet û qada gelemperî red dikirin (Demir, h.b.: 70).

Femînîstên radîkal, bi kurtasî teoriyeke sistematîk dernexistine holê. Lê belê ji zayendîtî heta dayîktiyê, ji zewac heta malbat, ji edebiyat heta muzîkê, ji tenduristiyê mirov dikare bibêje ku di gelek warên jiyane de, li dijî nêrîna heyî serî hildane.

1.2.4. Femînîzma Sosyalîst

Femînîzma Sosyalîst, wekî pêla nû, femînîzma marksîst hatibe binavkirin jî piştî salên 1960an ji bertekên femînîstên radîkal ê li hemberî femînîstên marksîst, şêwe girtine (Ramazanoğlu, h.b.: 33). Femînîstên sosyalîst bi giştî xwestine ku di navbera femînîstên marksîst û femînîstên radîkal de sentezekê çêbikin. Li gor femînîstên marksîst sedemên bingehîn ên pirsgerêka tehdeya li ser jinan di civaka çînî de bû. Wexta ku civaka çînî ji holê rabe wê problema jinê jî çareser bibe. Ev yek wê bi pergala têgehên Marks û Engels ku pêxistibûn pêk were. Femînîstên sosyalîst

tevlî vê fikrê nedibûn. Li gor wan pirsgerêka jinê, tenê bi kategoriyên çînî û aboriyê îzeh nedibû. Herweha tevlî fikra femînîstên radîkal a ku; çewisandina li ser jinê tenê bi pergala bavixsalariyê ve girêdidan û têkiliyên jin û mêran bi vê pergale rave dikirin jî kêr didîtin (Balci, h.b.: 52). Bi ya femînîstên sosyalist, nakokiyên jin û mêran ên ku ji pergala bavixsalariyê dihatin, bi qasî nakokiyên çînî bi reh bû ku li hemû civakê bandor kiribûn. Têgihiştina femînîstên radîkal û ya femînîstên sosyalist ji hev cihê bû. Ev cihêbûn jî ev bû: Bi nêrîna femînîstên sosyalist, bavixsalarî bi bingeheke maddî û sazkerî têgînî bûbû. Femînîstên radîkal jî bavixsalariyê wekî fikrekê an jî rastiyeke ku her roj li her cihê bi awayekî gerdûnî, jin di bin zexta mêran de didîtin (Demîr, h.b.: 73-74). Femînîstên sosyalist, dixwestin kêmasiyên ravekirinên femînîstên marksîst ku pirsgerêka jinê bi civaka çînî ve girêdidan û femînîstên radîkal jî ew bi teoriyên bavixsalariyê ve girêdidan ji holê rakin, û mijarê bi bergeheke firehtir binirxînin.

Femînîstên sosyalist, ji bo bavixsalarî û kapîtalîzmê, hin teoriyên din bi pêş xistibûn. Teoriya pergala dualî û ya yekgirtî. Li gor pergala dualî, daxwaza mêran ya li ser kontrolkirina jinan, wekî daxwaza kapîtalîstan a li ser karkeran bi hêz e. Ji ber vê yekê tenê bi riya aborî û kategoriyên çînî ji holê rakirina kapîtalîzmê, ji bo rizgariya jinê têr nake. Li gel vê divê mîr jî dev ji venihêrtina jinan berde. Li gor vê kapîtalîzm û bavixsalarî du pergale xwedî têkilî û berjewendiyên cuda ne. Bi ya marksîstan dema şeweya hilberînê biguhere, wê şeweya hilberîna berê û saziyên rajorî û bîrdoziya wê, dê giringiya xwe wenda bike. Dema ew hêz ji holê rabin, dê ji hunerê heta mîmariyê ji dîn heta siyasetê hemî sazî wê biguherin. Bi hilberîna nû re, dê saziyên rajorîn ên nû derkevin holê. Ew jî hêmayên şeweya hilberîna bavixsalariyê ne. Femînîstên sosyalist, pergala dualî kêr didîtin û rexne dikirin. Li hemberî vê teoriya pergala yekgirtî, bi pêş xistin. Li gor vê bavixsalarî û kapîtalîzm ji hev cuda nayê nirxandin. Ev yek dibe sebebê probleman, ji ber ku têgeha bavixsalariyê berhemeke kapîtalîzmê ye. Li gor vê teoriyê divê li şûna dahurîna çînî ya marksîstan, dahurîna karbesiyê bê kirin. Bi vî awayî pirsgerêka çewisandina jinê û talîbûna wê dê bê ravekirin. Bi dabeşkirina karbesiyê mirov nikare, bavixsalarî û kapîtalîzmê ji hev cuda bifikire. Taybetiya bingehîn a kapîtalîzmê, jinê wekî hêza kar a talî dibîne. Zextên li ser jinê û hêza mîr a li ser jinê bi navbeyna polîtîkayên dewletê tên navendîkirin (Demîr, h.b.: 75-77).

Femînîstên sosyalîst, sedemên pirsgirêka jinê him di nêzîkaiyên zayendî û him jî di yê çînî de didît. Rizgariya jinê encax ji holê rakirina pergala kapîtalîst û bavixsalariyê pêk bê. Li ser faktorên zayendî hûr dibûn û di warê ku jin xwe di bin pêkutiyên de hîs dikir, zayendîtiyê û saziya malbatê bû. Li gor wan mafê mirov heye ku zayendiya xwe bi xwe diyar bike. Tercîha zarokanînê, tercîha zewacê û tercîha têkiliyên xwe mirov bi xwe tayin bike. Ev him ji bo jinê him jî ji bo rizgariya homoseksuel û lezbiyenên mafên navendî yê girîng in (Naîman, 1988: 28). Tiştên di zayendiyê pêk têt, di dayîktiyê de jî pêk têt. Dema biryara dê jin çend zarokan bîne ji aliyê kesên din ve bê dayîn, di tecrubeyên dayîkbûnê de biyanîbûnek çêdibe. Li welatên ku pêdivî bi hêza kar heye, bêyî xwesteka jinê, heta çiqasî pêkan be; divê jin ewqas zarokan bîne. Jin bi vî awayî ji xwezayîya dayîkbûnê dûr dikeve. Jin divê li ser bedena xwe xwedî biryar be. Ger mirov ji aliyê zayendî ve binihêre, lênihêrîna bedenê, operasyonên estetîk, dayîna kîloyan di eslê xwe de ji bo xwe bike jî bi taybetî ji bo mêran e. Jin çiqas bi bedena xwe bilîze, ewqas bedena xwe dike meta. Ev jî çawa ku karker keda xwe vediguherîne metayê, biyanîbûna jinê jî bi hewldana guherînên bedena wê pêk têt. Biyanîbûna ku di zayendî û dayîktiyê de pêk têt, di qabiliyeta zihniyeta jinê de jî pêk têt. Jin di ravekirina fikrê û hestên xwe yê li hemberî qamûyê ditirse. Zor lê têt kirin ku fikrên din pîranî jî yê mêran bipejirîne. Ev jî biyanîbûnê di zihnê û qabiliyeta jinê de çêdike (Demîr, h.b.: 78-80).

1.2.5. Femînîzma Postmodern

Di sedsala 20an de, hin bûyerên ku diqewimîn wekî; Şerê Vîetnamê, qirkirina Cihuyan, avêtina bombeya atomî ya Hîroşîmayê û gelek bûyerên dîrokî, di cîhana Rojava de bûn sebaba jêpirsîna felsefe û baweriyên ronîparêz. Van geşedanên rê li ber vekir ku fikrê û şêweya jiyana rojavayî, ji binî ve bê rexnekirinê û postmodernîzmê jî di vir de xwedî roleke girîng bû. Postmodernîzm, li ber nîrxê û saziyên ku ji bo modernîzmê pîroz bûn rabû û piştî salên 1970yan vir ve jî ji bo entelektuelên Rojavayê bû ciyê balkişandinê. Postmodernîzm di demeke kurt de, di huner, edebiyat, raman, felsefe, mîmarî, zanistî, muzîk bi kurtasî bû navê tevgerê ku di hemû hêlên jiyana mirovan de xuya dibe (Demîr, h.b.: 81).

Li ser hebûna femînîzma postmodern, du nêrîn bi pêş ketine. Li gor hin ramangeran, postmodernîzm dikare naveroka femînîzmê biparêze û wekî şêweyeke

rexneyê derkeve holê. Li gor hinan jî postmodernîzm, di esasê xwe de mecbûrî jêpîrsîna naveroka femînîzmê ye. Ji ber vê jî femînîzm di nav gotareke wiha dê nikaribe wekî femînîzmê bimîne (Davis, 2003: 220-225). Ên ku li ser fikra nelihevkirina postmodernîzmê û femînîzmê ne, balê dikişînin ser hin sedemên vê yekê. Ji vê ya herî girîng jî dubendiya ku ji encama femînîzmê derdikeve. Femînîzm ji aliyekî ve li hember epîstemolojiya ronahîparêz derdikeve û bi vî awayê rexneyê jî xwe digîne postmodernîzmê û pê re tevdigere. Ji aliyê din ve jî femînîzma hemdem, him bi awayê dîrokî û him jî bi awayê teorîk, taybetiya xwe ya modernîstbûnê berdewam dike. Nelihevkirineke din a postmodernîzmê û femînîzmê ew e ku femînîzm bi hemî versiyonên xwe di nav xwe de “çîroka mezin” dihewîne, ji ber vê di nav gotareke postmodern de nikare bê nirxandin. Ramangerên ku lihevkirina postmodernîzmê û femînîzm diparêzin, vê yekê bi xalên hevpar ên rexneya postmodern û rexneya femînîst ve girêdidin û wan dişibînin hev. Ev şibandin li gor ramangerên wekî Nancy, Frazer û Linda Nicholson wiha ye: Him postmodernîzm him jî femînîzm, saziya felsefeyê bi kûrahî û bi berfirehî rexne dike. Ya girîng her du yan jî xwestiye, paradigmayeke nû ya rexneya civakê dike û piştî xwe nade felsefeya kevneşop, bi pêş bixin. Di vir de xala hevpar her dû jî piştî xwe didin prensîba “rexneya bêfelsefe” û têkiliya di navbera felsefe û rexneya civakê de ji nû ve saz dikin. Herweha him postmodernîzm him femînîzm, wekî tevgerên radîkal li dijî rewabûna modernîzmê ne, ji bo vê jî gotarên cuda bi pêş xistine. Wekî din him ji bo postmodernîzm him jî ji bo rexneya femînîst, temayên navendî yên dualî mîna rasyonel/îrrasyonel, kirde/obje, çand/siruşt cî digirin (Balci, h.b.: 58-59)

Di navbera nêrîn û şeweya rexneyê de postmodernîzm û femînîzm, di gelek xalan de digihîjine hev. Femînîzma postmodern di bin banê teoriya postmodern de bi pêş ketiye. Ger mirov nikaribe bi awayekî vekirî femînîzma postmodern formule bike jî, gava mirov atmosfera fikirîna hemdem bide ber çav, dê ev yek bi awayekî mecbûrî derkeve holê. Him femînîzmê him jî postmodernîzmê tesîrek kûr li ser seyra lêkolînên rewşenbîriyê kiriye û hê jî ev tesîr berdewam e. (Hekman, 2016: 25). Femînîzma postmodern, di bin banê teoriya postmodern de hatiye bi pêş xistin û mîrateya nêzîkbûna bizavên wek; binyadger, postbinyadger, psîkanalîtîk û heyîparêziyê (egzîstansiyalîzm) ye. Di serî de pîrsa Sîmon de Beauvoir a “jin çima cinsên duyem in?” di pêkhatina femînîzma postmodern de, xwedî roleke girîng e. Li

gor femînîstên postmodern, “a din bûn” (*alterity*) a jinan avantajekê dide ku jin, li ser nîrxên heyî, pergala bavîksalariyê jêpîrsînan bikin. “A din bûn” rê li ber pirdengiyê, cudahiyê û perçebûnê vedike ku ev têgeh cara pêşî ji aliyê femînîstên heyîparêz ve hatiye bikaranîn. Temayên heyîparêziyê ku ji bo femînîzma postmodern bûne bîngeh, di çar xalan de civiyane. Ya yekemîn, heyîparêzî li hemberî çarçoveya teorîk a pergala serdema modern derket û ji fikra jêpîrsîner û nebextewariyê re bû bîngeh. Femînîstên heyîparêz jî vê yekê xistin nav gotara femînîst ku nebextewerbûn û nêzîkbûna jêpîrsîner di femînîzma postmodern de jî hebû. Ya duyem, hevpariya di navbera femînîstên postmodern û femînîstên heyîparêz de, her du jî li hemberî taybetiyên jin û mêran ên wekî puxteyî tîen hesabandin derdiketin û di pêkhatina hebûnê de pêvajoyê derdixistin pêş. Sêyem, analîza “a/ê din” bû ku wekî têgeheke amûrî ya femînîzma postmodern bû, ji bo çareserîya pîrsgirêka jinê cara pêşî ji aliyê femînîstên heyîparêz ve hat bikaranîn. Ya dawî femînîstên heyîparêz ji dêvla fikra gelemper a homojen, cudahiyan derxistin pêş û alîkariya nêrîna ciyawaziya di navbera jinan de, kir (Demir, h.b.: 91-100). Femînîstên postmodern, ciyawaziya di navbera jinan ên wekî çîn, nijad, çand û zayendiyê berbiçav digirtin. Jin bi tecrûbeyên jiyana xwe ji hev vediqetiyên ji ber vê jî jinê tenê wekî kategoriyekê nîşandan ne rast bû. Teoriyên berê ên femînîst, (femînîstên marksîst, femînîstên radîkal, sosyalîst) zext û tehdeya li ser jinan dadixistin sedemekî mînak; nakokiyên çînî, faktorên biyolojîk û bi vê yekê jî jinan di yek kategoriyekê de disînifandin. Vê nêzîkbûnê, cudahiyan di navbera jinan de piştguh dikirin, û ev nêrîn ji vî alî ve jî dihat rexnekirin.

Di pêkhatina femînîzma postmodern de, binyadgerî û postbinyadgerî jî xwedî bandor bûn. Di navbera postmodernîzmê û postbinyadgeriyê de gelek xalên hevpar hebûn ku vê yekê xwe li ser bikaranîna ziman dida xuyakirin. Hin têgehên wekî ziman, gotar ku di literatûra postbinyadgerî de hebû, bîngehekê ji femînîzma postmodern re ava kir. Bikaranîna ziman di navenda fikrên femînîst de ciyekî girîng digirt. Him postmodernîzm him jî femînîzm li hemberî dualîzma modernîzmê derdikevin û hiyerarşîya di navbera têgehên wekî kirde/obje, rosyonel/îrrasyonel çand/siruşt de rexne dikin. Li gor femînîstên postmodern dualîzma peyvên dijber bi nêrîna zayendî ve girêdayî ne û ev jî dijberiya jinê dike. Wekî mîr/jin, dê/bav, ruh/beden, di van peyvên de peyva yekem, xwe li ser peyva duyem ava dike. Peyva

yekem her dem ji peyva duyem serdesttir e. Vê dualîzma peyvan jî zimanê mêran e û dinyaya nêr nîşan dide (Demir, h.b.: 86-103). Di navenda dahûrandinên postbinyadgerî de ziman ciyekî girîn digire. Ziman tişteki wiha ye ku wateyê di xwe de ava dike, hêmanên çandî li dor xwe bi rêxistin dike û şeweyên têgihîştina civakî bi awayekî devkî temsîl dike. Li gor postbinyadgeran, ziman pergaleke ku him sedem û him jî encama têkiliyên civakî nîşan dide. Gotin jî metn jî, ne xwedî wateyên sabîtin. Civateke diyar di nav pêwendeke diyar de wateyan çawa diafirîne? Bi ya postbinyadgeran ev pirs sereke ye ku divê bê kirin. Ev rehenda ziman ku amûra postmodernîzmê bû, ji aliyên femînîstan ve jî hat bikaranîn. Li gor femînîstên postmodern, ziman mekanîzmaya jinûvehilberîn û belavbûna desthilatdariyê ye. Femînîstên postmodern, dahûrandina ziman li ser sê rehenda dikin. Ji van a yekem dahûrîna di metnan de taybetiyên jin û mêran çawa hatiye ziman, dike. Ya duyem jin û mêr di civakê de wekî tîpekî bi dubendiyan çawa tê ziman? Ya dawî jî têkiliyên zayenda civakî, bi zanebûn an bê zanebûn di nav ziman de çawa hatiye bicîkirin, tesbîtin dike û derdixe holê (Demir, h.b.: 102-103).

Herweha têgeheke ku postbinyadger bi kar tînin, hilweşangerî (déconstructionisme) ye. Hilweşangerî bikaranîna ciyawaziyan di metnan de, yanî pêkhatina rêyên wateyê di metnan de dadihûrîne (Demir, h.b.: 104). Li gor vê di metnan de, wateyê hevgirtî tune ye. Di metnê de nîşankirina hevnegirtin, nakokî û hûrgiliyan girîng e, ji nav metnê pirwateyiyê derdixe. Bi vî awayî wateyên metnê yê biçûk ji hev dixîne, cardin digîne hev lê metn ne metna berê ye (Moran, 1991: 187-188).

Bi rêya hilweşangerî dijberiyên di nav metnan de ji hev tê xistin. Ev yek bi du rêbaza tê kirîn; “bervajîkirin” û “jicîleqandin” bi bervajîkirinê li ser têkiliya di navbera du têgehan de, tê sekinandin. Ji van têgehan yek serdest û ya din jî têgeha tepisandiye. Têgeha yekemîn nasname û ciyê xwe li ser neyinîkirina ya din ava dike. Bi bervajîkirinê qîmeta peyva duyem ku bê qîmet hatibû hiştin cardin derdixe holê. Û bi jicîleqandinê jî peyva duyem a tepisandî li şûna peyva serdest a navendî datîne. Bi vê yekê girêdana têgeha peyva serdest a bi têgeha tabî re derdixe û datîne berçavan. Di dualîzma felsefeya Rojava de têgehên wekî; raman/made, eynîbûn/cudahî, gotin/nivîs, hebûn/tunebûn, mêr/jin, hiş/beden ku xwedî ciyekî erênî ne (têgeha yekem), îmtiyaz û hebûna xwe li ser înkâr a têgeha din ava dike (Demir,

h.b.: 104-105). Hilweşangerî vê înkâr û gîrêdana têgeha yekem derdixê holê. Mary Poovey sê xalên ku hilweşangerî li femînîzmê zêde kiriye wiha rave dike: 1) Femînîzm li ser diyarkerên civakî wekî, nijad, çîn û dîrokê disekine, hilweşangerî jî têkîliyên ku di vir de hatine nepenîkirin, nepeniya wan zelal dike. 2) Hilweşangerî mantiqa ku hiyerarşî û dijberiya rewa dibîne rexne dike, dualîzmê ji hev dixîne. Peyv û têgeh ne xwedî wateyên sabît in. 3) Mafê fikrên “di navbera du tiştan” (in between) de dixê jiyane. Pêşî bi rêbaza hilweşangerî nêzîkayiyên heyî vediçirîne piştê jî hewil dide ku ne bi dijberiyên lê di navbera her duyan de derfeta fikirîne derxe. Bi vî awayî, ji xeynî jinîti/mêrtiyê, dê di navbera zayendiya anatomîk û zayenda civakê de fikra têkiliyê mecbûrî ji holê rabe (Demir, h.b.: 103-106).

Têgeheke ku femînîstên postmodern li ser sekinîne têgeha “zayenda civakî” ye. Li gor femînîstên postmodern li ku civakê hebe li wir zayenda civakî heye. Ev taybetî jî zayenda civakî û newekheviya civakî rewa dike. Bi vî awayî hêmana sereke ya di jiyana kesên de jinbûn û mêrbûn e. Lê belê di nav civakê de nasnameyên zayenda civakî ji bo hemû kesên ne di nav şert û rewşên wekhev de teşê digire. Ji ber ku ji xeynî nasnameya “jin” an “mêr” taybetiyên kesên ên wek; ciwan, pîr, azîb an zewicandî, xwedî perwerde an bêperwerde, dewlemend an xizanî hene. Û nasnameya zayenda civakî ji vê tîkelbûnê pêk tê. Di vî warî de gotineke wekî slogan “mîrov wekî jin nayê dinê, piştê dibe jin” di cî de ye (Scott, 2007: 27-28).

Têgeha zayenda civakî, taybetiyê gerdûnî ye, ku di her civakê de tê dîtin. Lê belê naveroka wê li gor her civakê xwedî cudahî û pîrcuretiyê ye, ji van a ewil; ji ber ku ciyawaziyên herêma xwedî dînamîkên bîngêhîn in, her tim bi xwe re guherînekê û pêşketîne tîne. Encameke din jî zayenda civakî, sîrayetî her civaka li ser ruyê erdê ye, dike. Ji ber wê jî dibe taybetiyê bîngêhîn a çandan û civak jî jiyana xwe li gor wê dimeşînin, teşê digirin û zayenda civakî bi vî awayî derbasî nîfşê din dibe. Di encama vê yekê de jî “zayenda civakî” di navbera wekheviya her du zayenda de astengiyê pêk tîne. Bi kurtasî li gor femînîstên postmodern, zayenda civakî, di çanda her civakê de heye. Lê li gor her civakê cudahiyan di xwe de dihewîne. Ji vî alî ve mîrov nikare, zayenda civakî bixê nav kategoriyeke hevpar û pênasayekê bike û hemû jinan daxilî vê yekê bike.

2. REXNEYA FEMÎNÎST A EDEBIYATÊ

Bi mezinbûn û geşedana fikra femînîst û bi belavbûna wê ya di nav civakê de, gelek teoriyên femînîst derketin pêş. Di serdema 20an de “tevgera femînîst” bi şax û beşên xwe ve dabeş bûye. Li gor Alî Îhsan Kolcu ji sihî zêdetir cureyên femînîzmê hene (Kolcu, 2016: 358). Her cureyeke femînîzmê xwedî nêrîn û teoriyekê ye, lê belê di navbera hemûyan de xala hevpar çewisandina jinan e. Jin di nav desthilatdariya bavixsalariyê de, di bin zextan de ye û wekî kes nayê hesibandin. Teoriyên femînîst di nav hemû qadên jiyane de ji bo pozîsyona jinan bilind bikin, dixebitin. Ev liv û tevgerên jinan (femînîst), xwe di warê zanistên din de jî dida xuyakirin. Yek ji van jî edebiyat bû. Rexneya edebiyatê ya femînîst bi tevgerên jinan bi pêş ketiye (Humm, 2002: 18).

Wekî eyne û berdevka pêşketin û guherînen civakî, heyîna edebiyatê, tenê ne wekî şaxeke hunerî û çiyê hêzeke estetîk e. Dema ji vî aliyê ve bê nihêrtin femînîzm jî wekî hemû bizavên fikrî û modayî, edebiyatê ji bo gihîştina armanca xwe wekî amrazekî dîtiye (Argunşah 2016: 36). Di navbera rexneya femînîst û rexneya edebiyatê ya femînîst de cudahiyeke teqez tune ye. Lê belê wisa xuya ye ku wekhev jî nînin. Bi giştî rexneya femînîst berê xwe dide bîrdoziya civakî û pratîkên wê, rexneya femînîst a edebiyatê jî bala xwe dide van bîrdozî û tedbîqkirina wan a di deqên edebî de. Dîsa her du jî zayendiyê, wekî kategoriyekê didîtin ku divê li ser bê sekinandin (Humm, h.b.: 11). Derketina rexneya femînîst, xwe li ser teza ku rolên zayendî ji cudahiyan xwezayî wêdetir in, tiştêkî honakî û çêker in ava kiriye. Ev tez jî bîngeha xwe ji bîrdoziya serdest distîne. Nexwe mirov dikare bibêje rexneya femînîst tevgerê e ku diyardeyan civakî rexne dike û dixwaze di wan de, guherînan pêk bîne (Parla & Irzık, 2005: 21). Teoriya femînîst li pey fêhmkirina newekheviya zayendan digeriya. Di nav kevneşopiyê de rolên jin û mêran ji aliyê zayenda civakî ve hatibûn diyarkirin. Polîtîkaya zayendî, li ser mijarên wekî zayendîtî û têkiliyên hêzî disekine.

Rexneya femînîst, li ser xebatên ku navenda wê jin bûn, hûr dibû û tiştê ku di vî warî de derdikete pêşiya wê jî saziya kevneşopiyê bû. Kevneşopiyê jin û mêran di heman xet û pozîsyonê de nedidît. Ev yek ji bo edebiyatê jî derbasdar bû. Dereng

derketina jinan di sahneya edebiyatê de hişt ku jin di deqên edebî de, bi nêrîna mêran bê sînorkirin. Ev yek jî pirsgirêka esas a rexneya femînîst a edebiyatê bû.

Rexneya femînîst gelek rewşên ku di nav edebiyatê de normal dihate dîtin, dida ber jêpîrsîna û li hemberî xwe jî pergala bavixsalariyê didît. Her weha nîşan dida ku ji aliyê çarçoveya têgînan ve berhemên bavixsalariyê çawa ji ciyê xwe tên kîrin û tên perçekirin (Humm, h.b.: 12).

Rexneya femînîst, ku dîroka wê ji aliyê tevgerên jinan ve hatiye pêkanîn, bi giştî li ser sê ferzkirinan disekine. Ji van a yekemîn; zayend bi rêya ziman ava dibe ku ev jî xwe di şêwazê de dide der. Ji ber vê jî şêwaz mecbûr e bîrdoziya zayendê temsil bike (Humm, h.b.: 21). Zayend xwe bi rêya ziman dide der û ziman şêwazê diafirîne, ku deqên edebî jî fikr û gotina xwe bi vê yekê digihîne xwîneran. Wateya ku ji vê ferzkirinê derdikeve ew e ku bêdengiya jinan di nav zimanekî de hatiye ku li ser navê wan gotina xwe dibêje. (Parla, h.b.: 8). Rexneya femînîst li dor vê nêrînê, li ser têkiliya di navbera zayend û şêwazê de analîzeke sistematîk dike û bi awayekî eşkere behsa mijarên ziman dike (Humm, h.b.: 21). Zayenda ku ji aliyê ziman ve dihat afirandin, jinan bi hin awayan dikir obje (tişt) û bi rêya dubendiyan jî wan amaje dikir. Bi vî awayî ew, di avakirina kirdeya mêr de amûr bûn. Vê tesbîtê, dida xuyakirin ku di edebiyatê de hêmaya jinê ji aliyê nivîskarên mêr ve dihat afirandin. Jina ku di edebiyatê de derdikete pêşberî me ew jin bû ku ji aliyê nivîskarê mêr ve hatibû afirandin. Bi vê taybetiyê, zayenda civakî bi kîjan peywendê dihat ziman û sînore wê çawa bu dihat eşkerekirin (Parla, h.b.: 9). Rexneya femînîst bi vê angaştê pirtûkên ku ji aliyê desthilatdariya edebiyatê ve wekî pirtûkên sereke dihatin dîtin, bi çavê “xwînerên jin” dinirxand û bîrdoziya zayendî, tîpên jin ên klîşe tesbît dikir û bi vî çavî şîrove û rexne dikir (Moran, 1991: 231). Ferzkirina duyem jî ew bû ku, jin û mêr heman zimanî bi kar naynin û tûrikê wan ê peyvan jî ji hev cuda ye. Bi vî awayî jî peyv û hevokên cuda bi kar tînin. Bi ferzkirina sêyem jî dihat gotin ku rexneya edebiyatê, berhemên jinên nivîskar berçav nagire û wan bi regezên nêr dinirxîne (Humm, h.b.: 22).

Tiştê ku diket ser milê edebiyata femînîst, ew bû ku bide fêhmîkirin zayendî bi rêya ziman hatiye afirandin û di pêkhatina subjektîfî, acizî û nerehetiya me de rola ziman girîng e. (Humm, h.b.: 19). Di vî warî de tesbîta femînîzmê ew e ku; jin bi

zimanê ku mêran afirandiye hatiye sînorkirin. Jin dibin objeya ziman û perçeyek ji ziman û carna jî dibin navên nirxan (siruştî, kevneşopî, namûs û hwd.), carna jî navê xeternakiyê û xerabûnê (jirêderxistin, bêqontrolî, dînîfî) ne (Parla & Irzık, h.b.: 8).

Rexneya edebiyatê di sedsala 20î de, pirhêl nebe jî bi du şêweyan xuya bûye. Virginia Woolf digot ku, “heqîqeta civakî ya jinan jî wekî heqîqeta civakî ya mêran, ji aliyê zayendê ve teşe girtiye. Ev jî dibû nîşaneyê ku teswîra jinan a di nav şêweya edebî de, ji aliyê zayendîtiyê ve dirûv digire” (nql. Humm, h.b.: 19). Rexneya femînîst, metodolojîyek bi kar anî ku heta niha ji aliyê tu nêzîkbûnên edebî ve nehatibû bikaranîn: “Zayenda ku ji aliyê çandê ve hatibû afirandin”. Ev nêzîkbûn, geh li ser rolên jinan ên ku ji aliyê çandê ve hatibû destnîşankirin geh jî li ser rolên mêran ên ku ji aliyê çandê ve hatibû destnîşankirin disekinî. Ji aliyê din ve jî li ser deqên edebî li şopa van rolan digeriya. Ji aliyên berhemên edebî ve wateya van tesbîtan, di bingeha nêzîkbûnên rexnegir de cî digirt. Têgeha zayendî ya ku ji aliyê çandê ve hatibû destnîşankirin, ji rexneyê re kategoriyeke analîzê bû. Ji bo edebiyatê jî rolên ku bi rêya çandê hatibû diyarkirin, girîng bûn. Vê tesbîtê, fikrek diparast ku li gora vê yekê, “fikra cîhana mirov a xeyalî bi binhişîna mirov ve giredaye û binhiş jî ji pêkhatiyên civakê ne azad e” (Parla, h.b.: 19-20).

Têgeha “zayenda civakî” di salên dawî yê sedsala 20an de, bi taybetî di salên 1980yan de, ji aliyê femînîstên dîrokê ve, ji dêvla kategoriya “jinê” ve wekî amûreke bi karîger a analîzê, hat bikaranîn (Berktay, 2005: 29). Li gor zayenda civakî cudahiyên di navbera jin û mêran de, cudahiyên biyolojîk in. Lê niha em dibînin ku cudahiyên wekî cudahiyên biyolojîk derdikevin pêşberî me, ji aliyê çandê ve hatine diyarkirin. Butler dibêje, “zayendek ji aliyê çandê ve bi wateyan tê neqîşkirin û ev jî divê wekî zayenda civakî bê fêhmkirin” (Butler, 2018: 52). Di nav rexnegiriya femînîst de zayenda civakî di nav rûpelên metnên edebî de xwe dida xuyakirin.

Rêbaza rexneya femînîst berê xwe da bersiva van pirsan: 1. Civak rolên zayendî bi mirovan çawa dide qebulkirin? 2. Ji bo zuriyeta mirovan zêde bibe, li ser jin û mêran polîtîkayên newekhev çawa tên meşandin? 3. Nivîskarên jin, kîjan cure û şêweyê nivîsînê bi pêş xistine? 4. Nivîskarên jin di bingeha berhemên xwe de kîjan

sembolan bi cî kirine û ev simbol dê bi çi awayî derkevin holê? 5. Bi nêrîna xwendevanên jin û rexnegirên jin, berhemên nivîskarên jin dê çawa bên dahurandin? 6. Cihêtiya zayendî û newekheviya jin û mêran a di berhemên edebiyatê de, çawa dikare bê astengkirin? 7. Di berhemên edebiyatê de hay ji hêmanên wekî; polîtîkaya zayendî, ziman û şêwe çawa dikare bê pê xistin? (Erden, 2011: 8). Rexneya femînîst, him di berhemên nivîskarên mêr de him jî di berhemên nivîskarên jin de, li ser ziman û şêweyên ku hatine bikaranîn sekinîne û xwestine ku kodên rolên zayendî yên ku di van berheman de derxin holê.

Rexneya femînîst, bi gîştî metnên edebî li gor perspektîfa xwe nirxand. Dema em li rexneya femînîst dinihêrin em dibînin ku gelek cureyên vê rexneyê hene. Mînak wekî, rexneya marksîst, rexneya psîkanalîz, rexneya berê wê li nivîskar û rexneya berê wê li xwîner. Berna Moran balê dikişîne ser vê ketegorîzekirinê û dibêje, rexneya femînîst a edebiyatê di nav ketegorîzekirinan de bi cî kirin, hin zehmetiyan derdixe pêşberî me. Û rexneya femînîst bi du aliyan dabeş dike: 1. Bi navenda xwendevan rexneya femînîst a berê wê li nivîskar 2. Bi navenda nivîskar rexneya femînîst a berê wê li jinê

2.1. Bi navenda nivîskar Rexneya Femînîst a Berê Wê li Jinê

Ev rêbaz berê xwe dide berhemên nivîskarên jin. Di nav edebiyat û dîroka edebiyatê de nivîskarên jin çawa cî girtine, li ser vê yekê lêkolîn dike. Ev nêzîkayî li pey van pirsan dikeve: Di edebiyatê de tiştên ku nivîskarên jin ji nivîskarên mêr cuda bike heye? Ku hebe geşedan û merheleyên wê hene? Di nav nivîskarên jin de ji aliyê tema, honaka bûyeran û karakteran ve taybetiyên hevpar hene? Gelo ev bi şert û mercên pergala bavîksalariyê ve girêdayîye? Li ser vê dîtinê rexnegir di wê baweriyê de ne, ku kevneşopiyê nivîskarên jin ku ji yê mêran cihê ye heye, ji ber ku jin di nav dîrokê de rastî heman pêkûtiyan mane. Ji ber vê jî rewşeke siruştîye ku nivîskarên jin, jiyanê ji mêran cudatir bibînin lê ev cudahî ne bîyolojîk e, encama pêkutiyên li ser jinan e (Moran, h.b.: 233-234). Rexnegirên rexneya berê wê li jinê, lêkolîneke li ser berhemên nivîskarên jin ên di nav dîroka edebiyatê de dikin. Showalter, tradîsyona edebî ya jinan di sê qonaxan de dabeş dike. Ya ewil ji 1840an heta mirina George Elîot 1880yê ye. Jin di vê qonaxê de nasnavên mêran bi kar tînin û fikrên mêran ên di derbarê jinan de dipejirînin û teqlît dikin. Showalter, vê qonaxê

wekî “qonaxa mê” bi nav dike. Ji 1880yan heta 1920an qonaxa femînîst e, heta ku jinan mafê dengdayînê bi dest xistiye. Ev jî qonaxa duyemîn e ku merheleyê de jin êdi nivîskarê mêr teqlîd nake û bi zanebûn ji tradîsyona nivîskarên mêr vediqete. Qonaxa sêyem “qonaxa jinê” ye. Ji 1920an heta roja me ya îro ku jin di vê qonaxê de bûne xwedî hişmendiyekê. Di van qonaxan de, di ya pêşîn de jin, rêbazên serdest ên edebî teqlîd dikin û nixê heyî dipejirînin; di ya duyemîn de, ji xeynî protestokirina rêbaz û nixê heyî, parastina maf û nixê xwe dikin; a sêyem jin êdi ber bi xweserbûnê ve gav diavêjin û dikevin lêgerîna xwekeşkirinê û nasnameya xwe (Aytemiz & Saygilgil, 2016: 61).

Ji bo rexneya femînîst a bere wê li jinê , pirtûkeke girîng Pirtûka Virginia Woolf a bi navê Odeyêke Aîdî Xwe (Kendine Ait bir Oda) ji bo rexneya femînîst ciyekî girîng digire. Woolf di vê pirtûkê de xwestiye kevneşopiya jinan ava bike. Woolf dibêje divê jin xwedî odeyekê bin. Ji alîkî ve ode sembolek e. Ode wekî biwareke ku jin bêyî dîrektîfa mêran ji xwe re jiyaneke lê ava dikin, ciyê daxwazên wan ên şexsî ye, şert û mercên jiyana xwe li wir ava dikin. Woolf balê dikişîne ciyê jinê yê di nav edebiyatê de û dinirxîne. Merheleyên pêşketina edebiyata jinê ya li Îngîlîstanê nîşan dide. Herweha Woolf dikeve pey nivîsên jinan û berhemên ku li ser jinan hatine nivîsandin û dibêje “bi qasî ku mêr li ser jinan dinivîsin, jin li ser mêran nanivîsin...” Li gor Woolf ji bo ku jin bikaribe binivîsîne divê xwedî odeyêke aîdî xwe be û pereyê wê hebin (Woolf, 2009: 6-31).

Rexneya berê wê li nivîskarên jin, berhemên nivîskarên jin ji aliyekî din ve jî nirxandine. Nêzîkbûna ku wekî teorîkbûnê li meseleyê hûr bûye, piranî ji nav femînîstên Fransî derketiye. Ên ku xebatan li ser gotara jinê meşandine kesên wekî Helene Cixous, Luce Irigaray, Julia Kristeva, Monique Wittig in. Ev femînîst teoriya xwe li ser psîkanalîz, zimanzanî û bîyolojiyê ava dikin û fikrên xwe dispêrin Derrida û Lacan (Moran, h.b.: 237). Rexnegirên femînîst ên Fransî, balê kişandine gotarên ziman, ka di nav de gotareke çawa hatiye bi cî kirin û zîman û rabêja ku bi jinê ve têkildare, destnîşan kirine. Ew li ser çanda Rojava û têkiliya wê ya bi ziman re sekinîne. Bi ya wan di çanda Rojava de, mêr navenda her tiştî ye û ev yek tenê ne bi dîn û felsefeyê, di heman demê de bi ziman jî tê kirin. Li gorî wan jin di nav ziman de tê biçûk xistin û bînirx tê hiştin. Mebesta wan çêkirina teoriyêke jinan e. Cixous, dibêje ji bo ku çewisandin û bêdengkirina jinan ji holê rabe divê zimanêke jinane bê

afirandin. Ev rexnegir li ser dualîzma di ziman de heye disekinin. Mînak peyva mêr-jin, peyva yekem her dem serdestî peyva duyem (Moran, h.b.: 237-239).

2.2. Bi Navenda xwendevan Rexneya Femînîst a Berê Wê Li Nivîskar

Li gor vê rêbazê dema xwînera metna jin be, dê metn bi aweyekî din bê xwedîn. Nêrîna xwînera jin û xwînerê mêr û bertekên wan, dê ne wekhev be. Lê ew nayê wê maneyê ku hemû xwînerên jin bi heman nêrînê berheman dixwînin. Ji ber ku jinbûn ne girêdayî aliyên wan ên biyolojîk e, ew piştê lê hatiye barkirin. Wekî jinekî xwendin tenê têrê nake, divê jin hay ji mêbûna xwe hebe (Moran, h.b.: 229).

Li gor vê rêbazê divê metnên nivîskarên mêr bi çavekî xwînera jin bên xwendin û bîrdoziya zayendî, hêmaya jinê û tîpên klîşe yên jinan, li ser van berheman bên tesbîtkirin û bi awayê rexneya femînîst bên şîrovekirin. Di vî warî de berhema yekemîn a Simone de Beauvoir a bi navê *La Deuxième Sexe* (Cînsê Duyem) e. Sîmon de Beauvoir di rexneya femînîst de, kesayeteke girîng e. Li gor wê jin bi têkiliyên xwe yê bi mêran re dihat pênasekirin. Mîten ku li ser veqetîna zayendan saz bûbûn nêrîfî û mêyîtiyê bi dijberiyên xwe ve zindî digirt û vê fikrê dermale dikir. Li hemberî vê jî birêveçûn û pergala cîhanê di bin banê mêran de dimeşîya. Cîhan bi perspektîfa wan dihat naskirin. Lê belê nakokîya mezin jî di vir de bû (De Beauvoir, 2010: 8). Herweha Beauvoir bi awayekî pergala bavîksalariyê rexne dikir û di berhemên nivîskarên mêr wekî Stendal, D.H. Lawrence, Montherlan Clodet, Breton de, ciyê jinê jî destnîşan kiriye. Di nav vê çandê de jin dikeve pozîsyoneke marjînal, ger ku bi termînolojiya marksîst bê rave kirin. Mirov dikare bêje ku perçiqandina jinan a di warê polîtîk û aboriyê de nav saziya jêrin de be, di huner û edebiyatê de piçûkxistina jinê di saziya-rajorîn de tê kirin (Moran, h.b.: 230) Rexneya femînîst li ser bingeha van teorîsyenên femînîst, qadeke rexneyê ava kir û berhemên edebî bi vê perspektîfê nirxand.

Di rexneya femînîst a wekî xwîner berê wê li nivîskar de, metneke ku ciyê xwe girtiye û li ser hatiye axaftin, pirtûka Kate Millet a bi navê *Sexual Politics* (Polîtîkaya Zayendî) ye. Piştî Wolf mînakeke herî girîng Millet e. Millet şopa bavîksalariyê li ser metnên edebî dişopîne û ji hin romanên Henrî Miller, David

Herbert û Richards Lawrence mînanan dide. Di van mînanan de jin wekî objeyeke cînsî derdikevin pêş. Têkiliyên zayendî, li ser bingeha zayendîtiyê wekî desthilatdariyek ku mêr li ser jinê bidestdixê xuya dibe û Millet vê yekê jî bi polîtîkayên zayendîtiyê ve girê dide. Li gor Millet “zayendî senifendineke polîtîk e” (Millet, h.b.: 11-48) Armanca Millet, şayesandina jinan a di nav edebiyatê de derxe holê û raza şayesandina bavixsaliyê dahûrîne û bi vî awayî jî, desthilatdariya mêran a li ser jinan bipeyitîne.

Di berhemên edebî de rexneyeke din ku li ser karakterê jin tê kirin, du tîpên klîşe ên nivîskarên mêr in. Ev her du tîp tîpên dijberî hev in. Sandra M. Gilbert û Suzan Gubar di berhema xwe ya bi navê *The Mod Women in the Attic* (Jina Dîn ya di Nav Kêranan de) de li ser van tîpên klîşe disekin. Navên van tîpan “ferîşteya li malê” û “cenawir” e. “Ferîşteya li malê” di civaka bavixsalar de jina meqbûl a ku mêr di hişê xwe de ava kiriye. Ev jin jina dilpak, dilnizim, milayîm e û masumiyetê temsîl dike. Li gor Gilbert û Gubar ev hêma û safîti ji hêmaya “Meryema bakîre” tê, piştî ji Dante, Milton û Goethe derbas dibe û di sedsala 19an de kirasê xwe yê zanavê dînî datîne û dibe “ferîşteya li malê” li hemberî jina “cenawir”, lê bi xweseriya xwe ve girêdayî, jina cenawir hay ji berjewendiyê xwe heye û rola ku mêran jê re fesilandiye qebûl nake. Ji ber ku vê tîpê mêran tirsandiye û veciniqandiye bi vî zanavî hatiye binavkirin. Gilbert û Gubar van tîpan di nav metnên edebî de bi mînanan nîşan dane (Moran, h.b.: 231). Em ê jî di xebata xwe de li gor vê rêbazê romanên nivîskarên mêr ên kurd ku me hîlbijartine binirxin. Bi çavê xwînerê li romanên nivîskarên mêr binihêrin.

BEŞA DUYEM

ANALÎZA ROMANÊN NIVÎSKARÊN MÊR ÊN KURD

Di vê beşê de em ê li ser karakterên jin û mijarên ku di navenda romanê de cî girtine rawestin. Li gor rexneya femînîst navend-xwîner û berê wê li jinê, dê karakterên çar romanên bîn pêşkêşkirin û mijarên bingehîn ên van romanên bîn analîzkirin.

3.1. Sebrî Silêvanî - Meryemaya

Nivîskar û helbestvan Sebrî Silêvanî di sala 1972an de, li Zaxoyê ji dayik bûye. Di sala 1987an dest bi nivîsê kiriye. Sala 1992an tevli xebata siyasî bûye, Lê belê ji ber rewşa awarte ya welat û hinek sedemên siyasî, neçar bûye ku koçî Ewropayê bike.

Berhemên wî Ava Mezin –Kêlika Ku Masiyên Xwe Tî Dihêle, Roman, 2004, Bist Sal û Êvarek, roman, 2004, Meryema –Keçejinek Ji Zemanekî Din, Roman, 2007, Payiza Peyvan Rexne, Hizr û Felsefe, 2008, Sifra Silivî, Roman, 2010, Ji Destpêkê Heya Destpêkê, Nivîsên Hizrî, 2010

Serlehengê romana Meryemayê, jineke bi navê Meryema ye. Meryema hîn di temenekî biçûk de ye diya wê Helîma dimire. Hîn salek bi ser mirina diya wê re naçe, bavê wê Dêwalî bi Mencolê re dizewice. Mirina diya wê û zewaca bavê wê ya bi Mencolê re, bandoreke xirab li ser derûniya wê çêdike. Piştî ku bavê wê di Şerê Kendavê de dimire, Meryema dikeve rewşeke xirab û rojên Meryemayê ji ber nexweşiyê li nexweşxaneyê derbas dibin. Hevala diya wê Meyrê bi dilşewatî dixwaze alîkarîya wê bike; Meyremayê dibe mala xwe. Meryema di mala Meyrê de, di xew ve diçe. Di xewna xwe de, xwe di nav gul û giya û siruştêke xweş de dibîne. Lê dema şîyar dibe bi xwe dihise ku ji aliyê Kabîrayê mêrê Meyrê ve rastî destdirêjîyê hatiye. Ev yek bandoreke xirab li derûniya Meyremayê dike, ku hemî jiyana wê di bin vê bandor û trajediyê de dibore. Piştî demekê zikê wê mezin dibe û ducanî dibe, lê zarok ji ber diçe. Sal di navberê re dibihurin, têkiliyên Meryema bi çend mêran re çêdibe û ew ji wan hez dike. Lê belê ev mêrên ku ew ji wan hez dike, bi nêrîneke zayendperestî nêzîkê wê dibin û ev nêzîkbûn wê ji wan dûr dixê.

Meryema her weha wênesazeke zîrek û jêhatî ye. Êş û birînên ku di kurahiya dile wê de cî girtine li ser kevalên xwe dinexşîne. Yekê tîrmehê, perdeyên qetandî, marên kor û dûkela şîmendîferê dibin sembolên kevalên wê. Derûniya xwe ya ku bi êşên ji ber destdirêjî, civaka feodal û tenêtiyê tije bûye, di nav rengên tabloyên xwe de dide der.

Serleheng di nav serpêhatiya xwe de rewşa xwe û rewşa jinên di nava civakê (baviksalar) de, analîz dike û di bin fikr û dîtina xwe de pergala civakê rexne dike. Di romanê de nivîskar bi rêya serlehengê xwe rexneya civaka baviksalarîyê dike, li ser kêşeya jinê hûr dibe. Lê belê çawa ku em ê piştre li ser bisekinin, her çiqas nivîskar li dor vê babetê nîqaşê vehone jî zimanê ku di romanê de bi kar tîne zimanekî nêrane ye, ku di hin vegotinên wî de ev yek xwe dide der. Îthafa romanê bi xwe zimanekî nêrane ye ku divê bê şîrovekirin.

3.1.2. KARAKTERÊN JIN

Di romana Meryemayê de, karakterên jin ên em dê li ser wan bisekinin; Meryema, Mencolê, Narîn, Meyrê û Şeyma ne.

3.1.2.1. Meryema

Meryema karaktera sereke û vebêja romanê ye. Meryema di sî û şeş saliya xwe de ye û roja ji dayikbûna xwe bi hevala xwe Narînê re pîroz dike. Di romanê de em bûyer û serpêhatiya wê ji devê wê guhdarî dikin; Meryemayê di sêzdehsaliya xwe de ji aliyê mêrê bi navê Kabîrayî ve rastî destdirêjîyekê hatiye û vê bûyerê tesîreke xerab li ser derûnî û jiyana wê daniye. Bi vebêjiya Meryemayê em kesayetî û çîroka wê ya kambax ku wekî trajediya jinên welatê wê ye, dihesîn.

Meryema hîn di serê vegotina serpêhatiya xwe de, dest bi gazinên li ser civaka xwe dike. Civaka ku li wir pîvan û regezên nêr serdestin. Hemû tişt li wir bi çavên mêr tînin nirxandin; li gor wê ferq nake ka li ku dera welat çêbûyî an dijî. Gava ku Meryema behsa ji dayikbûna xwe ji Narînê re dike wiha dibêje:

“Bavê min Dêwalî ev nav ji bo min hilbijart. Ez li duhoka Dasîniyan ji dayik bûm, li heman ciyê salên temenekî bê dad dîqedînîm. Ne gîrînge ez jî kîjan malbatê bim, ji ber ku toximê nêr hêvênê hestê hevbinê li ba min ne hêlaye” (Silêvanî, 2011: 18).

Ji serê romanê heta dawîya wê ev rexne û gazin her hene. Di çavê zayenda mêr de jin wekî metayekê ye, ew tenê bedena jinê dibînîn, aliyê wê yê derûnî tune dikin. Meryema dikeve nav pirsên felsefîk, her pêkhate ji du aliyan pêk tê: asta ruh û asta form, lê mêr serederîyê tenê bi mêtiya wê dikin û gewherê wê înkâr dikin. Hizrê wê di hêlînan de basko dikin û wekî dirindeyekê cesedê wê dixwin. Meryemayê ew wekî şîzofrenan bi nav dike (Silêvanî h.b.: 18). Meryema dîsa li ser nêrîna wan ji Narînê re dibêje:

“Bibore Narîna min, belê serê çend salan e û ew jinê wekî makerekê dibînîn, xerabê wan lê siwar dibe û qencê wan barê xwe lê dike û yê bêdeng jî dixwaze dev ê wê lixav bike. Belê ew roj çû...Çûneke bê vejer jinê biryar da, erê biryar da ku biaxive û govaniyê li ser kiryarên hemûyan bide, bê awarte” (Silêvanî, h.b.: 19).

Li vir gazin û renxne li nêrîna nêrane ya li jinê tê kirin. Lê belê zimanê ku Meryema ango nivîskar bi kar aniye zimanekî nêrane ye. Meryema ji nêrîna mêran ya li ser jinê bêzar e. Dibêje herkes li gorî bînahiya çavan dîbîne lê ew bi hin endamên din ji laşê xwe temaşeyî jinê dikin (Silêvanî h.b.: 19). Meryema berdewam dike. Ew jinê bi qanûneke selefî û kevnar tev digerin û jinê bi vî awayî dadgeh dikin. Li gor Meryemayê ew xwe wekî xelîfeyê Xwedê dibînîn, li ser navê Xwedê ew didarizînîn. Gelo çima dadgeheke bi edalet saz nabe? (Silêvanî h.b.: 19). Meryemayê rexneya dîn û civaka bavixsalar di gelek ciyan de dike. Dema diçe dibistana seretayî mamosteyê dîna behsa zewaca mêran a ji bo çar jinan dike:

“...Mamosteyê perwerdehiya ayînî di dersê de bi şanazî got: “li dû dîna îslamê, mafê zilamî heye heta çar jinan jî bîne.” Qet ji bîra min naçe dema ku min bi sersamî pirsîyar areste kir.: “Seyda çima mafê zilaman heye, lê mafê jinan tune?” (Silêvanî, h.b.: 22) Meryema li ser gotina seyda û pirsîyara xwe bi me dide xuyakirin ku di îslamê de, mêr li ser jinan xwedî maf e, lê belê jin ne xwedî heman mafan e. Meryema didomîne ku çawa ev yek normal dihate dîtin û pirsîyara wê çawa ecêp hatibû û dê paşî qet nehata jibîrkîrîn. Herweha di têkilîya bi karakterê Hecî hawar de dîsa em li hember nêrîna kesên dîndar li hemberî jinê rast tên. Hecî hawar yekî dîndar e. Meryema wekî berê êdî nikare debara xwe bike, ji wênesazîtiya xwe hinekî bi dûr dikeve û bazirganiyê bi Hecî hawar û xwişka wî Şeymayê re dike. Di vir de Meryema wiha behsa wan rojên xwe û karê bazirganiyê û şîrkatîya bi wan re dike:

“Her gava ku ez didîtim, berê xwe ji min werdigerand û bi hinceta destnimêjê nedihate destê min, hestek li ba min dilivand ku ez necis im. Bêtir ji carekê gotibû Şeymayê bila Meryema dersokê li serê xwe bike. Wî nedizanî ku Şeymayê bi xwe dîvê dersokê bavêje, belê newêre” (Silêvanî, h.h.: 96). Piştî demekê Hecî hawar dil dikeve Meryemayê. “Belê mixabin li her carê wekû bûnewereke mê sere derî bi min re dikir. Te digot qey ew Adem e, ez jî Hawa me, ji parsûya wî hatima afirandin (Silêvanî, h.b.: 100). Meryema nerazîbûna xwe li hember nêrîna dîn û nêzîkbûna kesên ku wekî dîndar li civakê xuya dibin nerehet e û rexne û gazinên xwe dike.

Piştî destavêtina Kabîrayî ya li Meryemayê bi hinceta ku Meryema cinikî bûye, Meryema dîsa teslimî nav lepê Kabîrayî dîkin û çend carên din jî ew destdavêje wê Meryema wiha dibêje:

“Bi dû re Kabîrayî destê xwe bi piştê min û kamaxê min de anî xwarê heta ku gihîşt lingên min. Çû û li piştê min sekinî, vêca destê xwe gihan dev û lêvên min, bersinga min, navika min mîna dîzekî şareza dema ku cama dergehê dişikêne û bi jîrî destê xwe digihêne kilîtê eha wisa destê xwe gihand mûyên binzîkê min. Ê li dawiyê - bi tenê bo baweriyê - ez li himbêza xwe guvaştim beriya ku bibêje: “ez bi ser hîlbûm, cin ketine nava laşê te de” (Silêvanî, h.b.: 44).

Dema em bala xwe didin, şêweyê vegotina vê yekê ji me re wiha tê ku qala sahneyeke bihevşabûnê tê kirin. Lê belê tiştekî din ku bala me dikişîne, piştî çendekî Meryema bi xwe diçe dikana Kabîra û Kabîra cardin destdirêjiya wê dike. Meryema li vir bê bertek dimîne: “Carên pêştir, li ser qana piştê hindeki li min xweş dihat, ji ber ku hesta mêtîyê di min de dilivand, belê li ser çongan hêstiryayê ez digirtim û hesta min dimirand.” (Silêvanî, h.b.: 49).

Meryema keçikeke sêzdeh salî (zarok tê hesibandin) ye. Piştî destavêtinê ku ducanî bûye û dilê wê diavêje darçînê, diçe dikana Kabîra darçînê distîne. Her cara (bi dile xwe diçe) diçe dikana Kabîrayî Kabîra cardin dest diavêjê. Meryema li hemberî vê yekê bê bertek e. Ê di vegotina di jor de meriv wiha pê dihesse ku ev keçika sêzdeh salî ji vê destavêtinê zewqê distîne.

Meryemaya serleheng, piştî bûyera ku bi serî de hatiye, xwe ji civakê îzolekirî hîs dike. Di nav hesta tenêbûnêkê de ye. Dixwaze rastî hezkirineke paqij

were. Ligel çend cerîbînên wê yên dildariyê jî ew hezkirin û evîna ku dixwest bi dest nexistiye. Daxwazeke hezkirin û evîneke jidil daxwazeke sirûştîye. Lê belê dema ku em, li ravekirin û nêrîna van daxwazan dinihêrin, em li hemberî xwe nêrîneke mêrane dibînîn. “Ji bîr neke can, nebûna zîlamî di jiyana jinê de hebûna wê kê m dike û rojgare wê dike çolistan.” (Silêvanî, h.b.: 92). Ev nêrîn rê li şîroveyeke wiha ji me re vedike ku, ger mêrek di jiyana jinekê de tunebe, ew jin kê m e. Dibe ku niviskar xwestibe bibêje ku; nebûna hezkirin û evînê di jiyana mirovam de ciyê kêmasiyê ye; di jiyana jinê de nebûna mêrekî hebûna wê kê m dike. Bi vê ravekirinê meriv wiha difikire; gelo dê heman hevok ji bo karakterekî mêr jî bihata bikar anîn? Nebûna jinekê di jiyana mêr de hebûna wî, kê m dike.

Meryema dema ku hêviya xwe ji welêt dibire û dixawaze biçe Ewrûpa, rastî Kirmancê Kamîrê tê. Di dilê xwe de, hin jî baweriya wê bi hezkirin û evînê dibîne. Ew û Kamîrê ji hev hez dikin. Meryema dev ji çûna Ewrûpayê berdide û Kamîrayê Kirmanc wekî rizgarkerekî dibîne. “Min hest dikir ku ez ew jin im. “CÎHAN” û ew jî Mihemmedê Mehdîyê rasteqînî ye ji bo min hatiye” (Silêvanî, h.b.: 111). Navê vê beşa ku ev hevok û nêrîn tê de derbas dibe jî “Mîhemmedê Mehdî” ye. Ev bi xwe jî watedar û sembolik e. Tê zanîn ku di baweriya cihû, xiristiyan û misilmanan de, Mehdî (Mesîh) wekî rizgarkerekî ye. Dê serdemek bê ku mirovahî di nav zilm, zordestî, xerabî û bêehlaqiyê de be. Wê wextê kesekî bi navê Mehdî bê û wekî rizgarkerekî cîhanê xelas bike. Herwiha li vir şîroveyeke wiha derdikeve: jin bêyî mêr kê m e, û rizgariya wê jî dê bi destê mêrekî be. Tenê bi vî awayî wê bigihîje bextewariya xwe.

Di metafora “şîmendîfer”ê de jî, em bala xwe didinê ku Meryema bi hêviya hatina şîmendîferê ye ku bê û wê ji nav tenêti û êşa wê derxe û bibe. “Meryema pêvajoya jiyana xwe mîna şîmendîferê, her mêrê ku di jiyana wê de cî girtiye mîna îstasyonekê dibîne. Metaforekê di navbera wan de digeşîne. Meryema li bendê ye ku ew îstasyon ango ew mêr dê were wê ji vê tenêtiyê xilas bike û rahile wê bibe” (Aslan, 2006: 168). “Li benda şîmendîferê me hata ku bê, min siwar bike û dûr bibe, dûr dûr her bi îstehgehên ku min nedîtiye. Narîn ditirsim bimirim û şîmendîferê nebînim. Dûkela wê di kevalên min de diyar dibe belê ew bixwe na.” (Silêvanî, h.b.: 15)

Meryema li hêviya şîmendîferê ango mêrekî ye ku di sîfetê Mehdî de bê û wê xilas bike. Nivîskar bi vegotîneka serlehengê, vê nêzîkbûna kevneşop û nêrane tîne ziman. Em dizanin ku li gor nêrîna kevneşopiyê wekî rolên zayenda civakê jî hatiye nîşankirin, jin hertim jar û qels e. Li hemberî vê yekê mêr, xurt û bihêz e, xwedî qudreta rizgariyê ye. Dîsa Meryema li derekê dibêje ku ew keçikeke sêwî ye, “encax bavê min dikare min biparêze, soz bila jinê neyîne ez ê şû nekim û tenê xizmeta wî bikim” (Silêvanî, h.b.: 26).

Gava ku em li karaktera Meryemayê dinîhêrin, Meryema jineke azad, zîrek û xwedî hişmendî ye. Ew bi çavekî rexneyî li der û dora xwe, li qewimînên ku birîna di dilê wê de vekirîne û li dinyayê dinîhêre. Rewşa jinan ya di nav civakê de, baweriya dînî, nêrîna mêran a li ser jinan bi rexneyeke tûj dinîrxîne. Mirov dikare bibêje, nivîskar xwestiyê problema jinê li ser lehenga Meryemayê ji devê wê û bi çavekî jinane bîne zimên. Lê belê di romanê de em dibînin ku zimanê Meryemayê ango nivîskar bikar tîne, zimanekî ku xwe ji zimanê civaka nêr rizgar nekiriye. Tevî ku Meryema jineke wênesaz û xwedî hişmendî ye, rexneyan li civaka bavîksalar dike û dikare ciyê jinê di nav civakê de analiz bike. Nivîskar xwestiyê karaktereke wiha ava bike, lê em li vir rastî nakokîyan tên. Gelo karaktereke wiha, rewş û bûyerê jiyana xwe divê bi vê nêrînê binîrxandana? Û dê zimankî wiha bikar bînin? Me bûyera destavêtin, têkiliya bi kesayetiyên din re û nakokiyên perspektîfa Meryemayê analiz kiribû. Li vir tîştê ku divê em li ser vê xalê zêde bikin, têkiliya Meryema û Kirmanc e. Kirmanc, çend salan li Siwedê maye, paşî vegeriya welat. Meryema û Kirmanc bi hêstên paqij ji hev hez dikîn. Meryema piştî ewqas cerîbînê xwe yî evînşikestî, ku ji hezkirinê û baweriya bi mêran bêhîvî bûye, bi hezkirina Kirmanc re cardin bi hêvî bûye.

Dixwaze bi vê evînê re ji nav bêhîvî û tenêtiya xwe derkeve. Meryema dixwaze ku bi Kirmanc re bizewice. Kirmancê Kamîra jî gelekî ji Meryemayê hez dike û pê dide zanîn ku ew hay ji hemû serpêhatiya wê heye. Lê serpêhatiya Meryemayê ji bo wî ne problem e, belê bi Meryemayê re nikare bizewice: “Got ez nikarim te mehr bikim, ji ber ku ez bi kêrî te nayê. Ez birîndar im, di şerê birakujiyê de fişkek li nava lingên min ket û damara mêraniyê qetandiye!” (Silêvanî, h.b.: 114).

Kirmanc, sedemê bi Meryemayê re nezewicandina xwe wiha tîne ziman. Bi vê diyalogê re roman jî bi dawî dibe. Derûniya Meryemaya ku bi destavêtina Kabîra re xera bûbû û wendakirina keçaniya wê, di hemû jiyana wê de êş û birîn vekiribû, evîna Kirmanc jî ligel wisa bi dawî bûbû.

Kirmanc hay ji serpehatiya Meryemayê heye. Lê bi xwe ev yek nekiriye kêşe, belê em li cem Kirmanc rastî rolên kevneşop ya zayenda civakî nayên. Lê ev yek li vir pirsekê tîne bîra mirov: gelo ew birîndar nebûya ji hêza "mêrantiyê" neketibûya, dê dîsa jî li hemberî Meryemayê wisa tevbigeriya? Dê nivîskar karakterekî wekî Kirmanc derxista pêşberî me? An ji bo ku karakterê Kirmanc ku vê rewşa Meryemayê dipejirand, divê ew jî yekî derb xwarî bûna? Ev yek jî wekî pirs xwe li vê derê nîşan dide.

3.1.2.2.Mencolê

Roman her çiqas wekî diyaloga di navbera Meryema û hevala wê Narînê de derbas bibe jî bêtir ji monologên Meryemayê pêk tînin. Em karaktera Mencolê jî ji devê Meryemayê nas dikin. Mencol jinbava Meryemayê ye. Piştî mirina diya wê bavê wê bi Mencolê re dizewice. Mencol mîna "tîp"* ekê derdikeve pêşberî me. Tîpa "jinbavê" bi fen û dolab e, ji Meryemayê hez nake, û ew jî jê heznake. Meryema gava ku Mencolê bi me dide naskirin wîha dibêje:

"Bi rastî jî Mencol kîndar û sêrebend e, belê kesayetiyeke balkêş heye, bi xeml û xêza xwe jinên taxê tevan çîz dike, bi awirekî ji çavên mest, an livîneke ji kemaxên wek ên kêvrîşkan, destnimêja zilaman dişikîne. Mîna kurelawan porê xwe kurt dike, ebrûyên xwe li ser tayekê dihêle, lê dem bo demê takên nû li qeraxan kate didin û mehdeyê wê bêtir seksî dibe. Ew dizanin ku zilam ji serikên mûyan hez dikin. bi kirasên reng û rengdar bejna xwe dixemilîne, belê singê xwe heta kevçika dilî hilêvîrî dihêle, zexmê wê xuya dike, ew berdewam dibêje: bedewbûna jina bitemen bersînga wê ye!" (Silêvanî h.b: 24).

* Kesa/ê ku di romanê de ji xeynê xwe jî, tiştêkî temsil dike, wekî tîp tê binavkirin. Yanî kesa/ê, têgeheke ku li derveyî dinyaya romanê ye û li dinyaya derve mawcûde, an jî cureyekî însana temsil dike. li gor Lucas jî tîp "şexsiyeteke/î ji aliyê mercên dîrokî û civakî ve hatiye diyarkirin". Tekîn M. (2004), Roman Sanati, Ötüken yayınları r.99

Mencol ji devê Meryemayê wekî jineke ku bi mêtiya xwe derdikeve pêş û peywira objeyeke li xwe bar kiriye, li ber çavê me xuya dibe. Ji xeynî taybetiyên wekî; kîndar û sêrebend, bi piranî ji aliyê fîzîkî û bi reftarên fîzîkî hatiye resm kirin. Şayesandina ku nivîskar bi serlehenga Meryemayê ji bo Mencolê dide kirin, bêtir wekî şayesandina civaka mêrserwer ku li ser jinê dike xuya dibe. Zimanê û nêrîna şayesê dîtina nêrane ya li hember jinê derdixe holê. Li vir hinekî nêrîna wekî ku jina xirab dikare mêran ji rê derxe, ew bi tabîra nivîskar “destnimêja zilaman dişikîne” di nav diyaloga Meryema û Narînê de, Narînê ji bo Mencolê: “ew ne ya hezkirinê ye, xwe li dora bavê te dialîne, da ku wê mehre bike. Jinên wek wê şareza û xwedan ezmûn, aqilê xwe bi kar tînin, neku dilê xwe. Bi kurtî li mêrên têr digerin, da ku rewşa jîn û jiyara wan dabîn bikin” (Silêvanî, h.b.: 26). Wekî

Mencolê wekî kurelawan porê xwe kur dike. Em vê hevokê jî ji devê Meryemayê dibihîsin. Meryema, Mencolê wekî karaktereke xerab dişayesîne. Ev jin dikare ji bo berjewendiyê xwe her tiştî bike.

3.1.2.3. Narîn

Narîn hevala, Meryemayê ye. Di romanê de bi diyalogên kurt wekî rê li ber axaftina Meryemayê veke, di honaka romanê de cî girtiye. Em di derheqê wê de zêde ne xwedî agahî ne. Demek dirêj e ji Welat derketiye û li Siwedê dijî. Di diyalogekê de Narînê ji bo xwe wiha dibêje: “(...) Gelek keçikên wek min û te li vî bajarî, ku bi tenê alayên rengîn û avahî tê de bilind dibin, hene, hemû jî hest bi tenêbûnê dikin. Pazdeh salan li Ewrûpayê ez tenê bûm û niha jî tenê me, belê gava ku bêhna min malix dibe, ez Xwedê tînim bîra xwe, çunkî ew jî bi tenê ye û dixwaze tenê biqedîne. Wisa diyar e ku ne herkes dikare tenê berdewam bike” (Silêvanî, h.b.:14). Ji vê diyalogê tê fahmkirin ku Narînê jineke ku benê jiyana xwe daye destê xwe. Bi daxwaz û biryara xwe jiyana xwe didomîne. Lê bi vî awayî xwe di nav tenêtiyê de jî hîs dike û tenêtiya xwe dişibîne tenêtiyeke xwedayî.

3.1.2.4. Meyrê

Meyrê Karaktereke lawaz e, zêde ne xwedî erk e. Hevala diya Meryemayê, herweha hevsera Kabîra ye. Dema diya Meryemayê dimire dixwaze alikariya Meryemayê bike.

“Ew hurmeteke bê dûnde ye, temenê wê gihiştiye pêncî û sê salan û hêjî bê hêvî nebûye, berdewam qesta mezargehên seyîd û weliyan dike, bi taybetî ya “Şêx Se’diyê Balqosî” jineke maqûl û nestêle ye, kesayetiya wê ya sengîn wiha dike ku herkes rêzê lê bigire, bi taybetî jinên taxê yên temendar, çunkî derbirrîna jina sebrîn û qurban dike” (Silêvanî, h.b.: 30-31)

Meyrê jina qurban û sebrîn jina ku di civakê de maqûl tê dîtîn. Bi bawerî û sebr e, ev yek ji bo wê di nav civakê de ciyê rêzê ye. Em li vir rastî pîvanên civaka baviksalar û rolên zayendî tî. Di civakên baviksalar de jina bêdeng û ji qedera xwe razî, serî li ber nêrina civakê ditewîne, jina baş e. Nivîskar bi vegotina Meryemayê, nêrîna jina ku di civaka kurd de maqûl tê qebûlkirin, bi me dide zanîn. Herweha ev yek jina ku Gilbert û Gubar wekî “ferîşteya malê” behs dikirin, tîne bîra mirov. Vê jinê, jina dilpak, dilnizim, milaim e, û temsîliyeta masumiyetê dike. Jina qurban û bêdeng e (Gilbert & Gubar, 2016: 64-75).

3.1.2.5. Şeyma

Şeyma xwişka Hecî Hawar e. Meyremayê bi rêya wê bazirganiyê bi Hecî Hawar re dike. Di romanê de zêde nexwedî rolekê ye. Dema ku Hecî Hawar jê dixwaze ku Meryemayê serê xwe bipêçe Meryema li ser vê yekê wîsa dibêje: “Bêtir ji carekê gotibû Şeymayê, bila Meryema dersokê li sere xwe bike. Wî nedîzanî ku Şeymayê bi xwe divê dersokê bavêje, belê newêre. Wek rebeneke pêgir, Şeymayê hest bi windabûnê dikir. Bi tenê bi min re xwe didît.” (Silêvanî, h.b.: 96). Em bi vê yekê pê derdixin ku Şeymayê di nav malbateke dîndar de, li gor pîvanên ku jê re danîne dijî; serê xwe bi zora birayê xwe Hecî Hawar girtiye.

3.2. Bavê Nazê - Dara pelweşiyayî

Bavê Nazê, di sala 1946an de ji dayik bûye. di gelek helan de xebatên wî hene. Wekî kurteçîrok, roman, pirtûkên lêkolînê her weha derbarê gramera kurdî de gelek xebatên hêja kiriye. Di sala 1981ê doktora di warê edebe de ji zankoya Moskovayê girtiye. çend pirtukên wî yên li ser dîroka kurdan ji zimanê rûsî wergeriyaye zimanê erebî jî hene. Niha di zankoya duhokê de Mamostetiyê dike. Berhemên wî: Çiyayên Bi Xwînê Avdayî (romann) ,1978 – Hêsîr Ê Baran (kurteçîrok)1985– Stokolmê Te çi Dîtîye Bêje(roman) 1987–Rêzimana Zimanê

kurdî,1996– Govenda Ber Mirinê (kurteçîrok) ,2007– Mirîye Heram (roman),2009– Dara Pelweşiyayî (roman), 2002

Romana Bavê Nazê “Dara Pelweşiyayî”, bi diyalog û nêrînên serlehengê romanê Şêzad dest pê dike. Şêzad pêşmergeyekî kevn e. Lê niha bêkar e, ji xwe re li karekî digere, di vê navberê de şer xelas bûye û şoreş pêk hatiye. Êdî hêzên pêşmerge li ser kar in. Lê belê li gorî Şêzad hevalê ku di nav şer de pê re têkoşîn dimeşandin niha bi destxistina desthilatdariyê ve xwe li berjewendiyên xwe pêçane. Vê yekê Şêzad bêhêvî kiriye. Vebêjê romanê, Şêzad di nav van fikran de dide nasandin. Piştî vedigere jiyana Şêzad ya berê ji dema dibistanê û heta tevlî nav pêşmergeyan dibe. Di romanê de tiştên ku di van demên borî de di jiyana Şêzad de qewimîne ji aliyê vebijêr û bi diyalogên di navbera lehengan, de tê dayin.

Şêzad, di dema dibistanê de dil berdaye Perwînê, ew her dû ji hev hez dikin. Lê piştî darvekirina birayê Şêzad Ehmed li zindana Musilê, ku ji aliyê hêzên Sedam ve hatiye kirin, Şêzad biryara tohildana birayê xwe dide û diçe tevlî nav pêşmergeyan dibe. Bi vî hawî têkiliya wî bi Perwînê re qut dibe. Di vê navberê Perwînê bi pismamê xwe re bêyî dilê xwe tê zewicandin. Perwîn li gundê Dukaniyê bi cî dibe. Ev gund gundeki ku bi hêzên Sedam re tev digere, lê belê piştî hin bûyeran, hêzên Sedam; zext, êrîş û destdirêjiya li ser jinan pêk tînin. Di navbera pêşmerge û van hêzan de şer û pevçûn heye. Şêzad bi grûbek pêşmerge ve tê, ji bo alîkariya gundê Dukaniyê li wir bi tesadûfî rastî Perwînê tê û cardin têkiliyek di navbera wan de dest pê dike. Perwînê êdî zewicandiye û bi xwesûya xwe re dijî. Her weha mêrê wê jî di şerê di navbera Îran û Îraqê de şer dike. Şêzad û Perwînê kadîna mala Perwînê kirine ciyê hevdiîtan û pevşabûnê. Carekê di wan hevdiîtan de xwesûa wê bi ser wa de tê. Piştî vê Şêzad ji gund bi dûr dikeve.

Li ser têkiliya di navbera Perwîn û Şêzad de hin mijarê wekî keçînî, namûs hwd. Xuya dibin. Herweha şer û têkoşîna pêşmergeyan, nakokiyên di navbera wan de, di romanê de ciyê xwe digirin. Di serê romanê de ku êdî şer xilasbûye û Kurd desthilatdarin. Di vê beşa romanê de rexneya desthilatdariya kurdan, li ser serlehengê romanê Şêzad ve tê kirin.

3.2.1. KARAKTERÊN JIN

Di romanê de, zêde karakterên jin tune ne. Karaktera sereke Perwîn e, ji xeynê wê xwesûya Perwînê, dê û du xwişkên Şêzad, keçika cîrana Perwînê Çinarê hene. Lê ev karakter di romanê de zêde cî nagirin.

3.2.1.1. Perwîn

Perwîn di romanê karaktereke sereke ya jin e. Di bistana keçikan de dixwîne. Di wê demê de ew û Şêzad hev nas dikin û dilê wan dikeve hev. Roman ji devê kesê siyemin û bi diyalogê di navbera lehengan de, tê vegotin. Em kesayetiya Perwînê li ser têkiliya wê ya bi Şêzad re û piştî di nav hin buyerên ku diqewimin de dinasin. Perwîn û Şêzad hîn di dema dibistanê de (ku em pê derdixin lîseye) dil berdane hev. Serê pêşî bi nameyan bi hev re têkiliyê datînin û du re li mala Perwînê ew cara pêşî hev dibînin. Di nav têkiliya wan de em kêma diyalogan dibînin. Ew çawa digihijin hev, bihevşabûna wan dest pê dike.

“Perwînê bi xwe derbas bû. Ew bi kirasê şevê li ber Şêzad sekinî. Şêzad ew himbêz kir û lêv li hev geriyar. Bi ramûsanana pêşî tevzînokê xweşiyê bi laşê wan de hatin (...) ew bi lez û heyecan çû sing û memikan jî. Wey xwedêo wî çawa singa wê vekir du hirmiyên stewiyayî serên xwe derxistin (...) Vê carê bi awayekî alavî Şêzad destê xwe ber bi jêr ve bir. Wê rê li pêşiya destê wî negirt. Bi gihîştina ciyê herî nuxmandî, ricfekê bi her duyan girt û vê yekê nehişt ew sînore qedexekirî derbas bikin” (Bavê Nazê, 2010: 28).

Bi hevoka “Sînoren qedexekirî” nêrîna civaka baviksalar û mêrserwer ya li ser jinê, bi awayekî eşkere xuya dibe. Civakên ku kevneşopiya baviksaliyê lê xurt dimeşe, ciyê jinê, tiştê ku jin dikare bike û ên ku nikare bike, ji aliyê vê nêrîna serdest ve tê diyarkirin. “Sînoren qedexekirî” ku nivîskar behs dike bi perdeya keçaniyê ve girêdaye. Em ê paşî mijara keçaniyê bi hûrgulî, di nav serenavê Bekaretê de bidin.

Şêzad ji bo dîtina Perwînê cardin bi dizî diçe mala Perwînê ew û Perwînê bi hev şa dibin. Piştî vê hevdişînê Şêzad û Perwînê hew hev dibînin. Birayê Şêzad, Ehmed ji aliyê hêzên Sedam ve hatiye bidarvekirin û Şêzad biryara nav pêşmergeyan dide û tevlî şer dibe. Perwînê bi kurmamê xwe re tê zewîcandin û li

gundê Dukaniyê bi cî dibe. Piştî demekê ku Şêzad li gundê Dukaniyê ye, bi rasthatinekê Perwînê dibîne û dîsa têkiliyek di navbera wan de dest pê dibe. Şêzad ji bo hin pêdiviyên hatiye mala Perwînê. Piştî di xewreçûna xwesûya xwe Perwînê diçe ba Şêzad. Li ser hevdîtina wan re sal derbasbûne. Tevî vê nivîskar bêyî axaftin û diyalogekê ku divê hebûna, hevgihîştina wan bi sahneyeke bihevşabûnê dide destpêkirin. Di vir de tiştê ku bala mirov dikişîne dema ku Perwîn û Şêzad dê bi hev şa dibin, Perwînê dibêje Şêzad îcar metirse ez nema wek berê keç im, tu çi dixwazî tu dikarî bikî (Nazê, h.b.: 89). Êdî perdeya keçîniyê ji holê rabûye. Wek ku di serî de digot sînore xedexekirî tune ye. Perwînê zewicandiye lê belê ev yek wekî perdeya keçîniyê ne girîng e. Perwîn û Şêzad çend carên din jî di kadina mala Perwînê de hev dibînin û bi hev şa dibin.

Di gihîştina Şêzad û Perwînê de, li ser hest û hezkirinê em qet axaftinekê nabînin. Bi salan e hev nedîtine, lê ew tenê bi sahneyên bihevşabûnê tînin şayesandin. Nivîskar sehneyên bihevşabûna wan wekî sahneyên pornografîk dide û şayesandin her li ser bedena Perwînê ye (Nazê, h.b.: 117). Di nav bihevşabûnê de Şêzad ji Perwînê dipirse “tu ji kê elimiyê van tiştan?” Perwînê qala vîdeoyên pornografîk dibe ku bi keçîka cîrana xwe re temaşe kirine. Li ser vê yekê diyalogek wiha di navbera wan de derbas dibe:

“ – Kê bîra vê dibir!

–Ma çima we xort li vîdiyo nedinêrî?

–Belê, lê keç?

– Ma em bi çi kêmi wene?

– Bi her tiştî hûn dikarin ne kêmi me bin, lê bi şermokiya xwe, gerek hûn kêmi bin” (Nazê, h.b. :117).

Ji vê diyalogê tê fmkirin, li gor Şêzad dêvê jin li ser mijarên zayendîtî xwedî şerm bin. Dîvê ew wekî mêran rihet tev negerin. Li vir dîtînen femînîstên radikal dikeve bîra me ku li gor wan jin zayendîtîya xwe ditepisîne û na jî. Li gundê Dukaniyê gelek bûyerên destavêtîne yê ku ji aliyê Hêzên Sedam ve tînin kirin diqewimin. Rojekê leşkerê Îraqî digirin ser gund û destdirêjî xwesûya Perwînê dikin. Di wê qasê de, xwesûya Perwînê, wê li pişt kulîne vedîşere da ku tiştêkî bi wê nekin.

Leşkerên ku li wir in, hemû tecawizî xwesûyê dikin. Di vê navberê de Perwînê li pişt kulînê vê bûyerê temaşe dike :

“ ... xwesû jî bi jê wîr de, leşkerek di ser de bû. Wê bê lebat şeqê xwe vekiribû, yê leşker jî xwe dibir û tanî. Ji perwînê xuyabû ku ev yek bi xweşiya wê tê. (...) Jinebî û fersendek jê re hat...wê baxçê xwe av da û da...(Nazê, h.b.: 88).

Li vir em li hemberî bûyereke destavêtinê ne, nêrîna Perwînê ya li hember xwesûya wê fikrên li ser “mîta tecawizê” tîne bîra mirov. Di civakên baviksalar û mêrserwer de ji bo ku bûyerên tecawizî hêsantir bîn qebûlkirin û rewşa kirin, hin fikrên wek qalib tîne qebulkirin hene. Li gor van fikran; ger ku destavêtinek li hemberî jinê çêbûbe ev ji bê diqetiya wê ye. An jina maxdûr bi awayekî din tev bigeriya dibe ku rastî tecawizê, nehatana. Li vir tevgera jinê û mexdûriyeta jinê bi hev tê girêdan. Divê li hemberî destavêtinê li ber xwe dabûna. Herweha jin, bi awayekî veşartî daxwaza arezûya destavêtinê, dikin (Eker û Erdener, 2011: 61-62). Perwînê jî ji bo xwesûya xwe wiha difikirî. Ew ji vê yekê kêfxweşe û ji xwe jinebî bû baxçê xwe av da.

Karaktera Perwînê bi zîhniyeta civaka baviksalar de hatiye afirandin û bi nêrîna serdest a civakê teşe girtiye. Nêrîna Perwînê ya li vê bûyera destavêtinê bi awayekî eşkere vê yekê derdixe pêş. Perwînê dûrî hişmendiya jinane ye. Ew jî wiha difikire ku xwesûya wê ji vê yekê kêfxweş e. Li vir mirov dikare pirseke wiha bike; gelo jinek li hemberî destavêtinê wiha difikire? Ev vegotin nêrîna baviksalarîyê ya li hember jênê temsîl dike. Vebêjêr piştî ku bûyera destavêtinê vedibêje wekî ku mijareke ji rêzê be, derbas dibe û dikeve nav niqasha xwesû û bûkê. Perwînê çawa û çima ji xwesûya xwe hez nedikir. Mirov li bendê ye ku vebêjêr hinekî li ser derûniya xwesûyê bisekine. Bûyereke wiha tesîreke çawa li kesên dike, tesîreke çawa li ser derûniya wan datîne? Lê belê em vê yekê qet nabînin.

Bi kurtasî karaktera Perwînê, jineke ku bi rolên zayendî ve girêdayî, bi nêrîna civaka baviksalar a li ser jinê hatiye honandin. Ew bi van taybetiyan ve girêdayî bi aliyê mêtîya xwe ve derketiye pêş û wekî objeyeke jî hatiye texayulkirin. Ji ber ku em taybetîyê takekesekê pê re nabînin. Em bibêjin li aliyekî di nav pevçûn û şerekî de ne, mêrê wê li şerê Îran û Îraqê de şer dike. Hezkiriyê wê Şêzrad pêşmerge û di nav şer de ye û Perwînê bi xwe berî demekê bûye şahidê destavêtina xwesûya xwe.

Lê em ji devê Perwînê di derheqê van rewşan de peyvekê jî nabihîsin. Tenê ew bi “peywîra xwe ya mêtîyê” tê şayesandin.

3.2.1.2. Xwesûya Perwînê

Di romanê de em di derheqê xwesûya Perwînê de zêde tiştêkî nabinin. Ew karaktereke bêdeng û pasif e. Xwesû tenê di nav çend diyalogan bi pêşmergeyan re û bi Perwînê re derdikeve pêş. Di nav axaftina bi Şêrzad re ku wekî pêşmerge hatiye mala wan ev diyalog derbas dibe:

“bi gotina “pêşmerge ne” xwesû ji nav ciyan rabû û hate odeya bûka xwe, berê xwe da Şêrzad û ji şûna xêrhatinê ev tişt got:

- Kêlîka namusa me, di nav lingan de çû, hûn li ku bûn? (...) xwesû diaxivî û laşê wê direhilî” (Nazê, h.b.: 85). Xwesû dema ku Perwînê û Şêrzad di kadîna de bi halê bihevşabûnê de dibîne. Tenê peyva pepûk ji devê wê derdikeve (Nazê, h.b.: 118). Di romanê de karaktera xwesûyê ne xwedî taybetiyeke din e.

3.2.1.3. Diya Şêrzad

Dîya Şêrzad, ji xeynî çend diyalogan zêde di romanê xuya nabe. Gava ku birayê Şêrzad li Mûsilê tê girtin, Şêrzad bi vê yekê pir xemgîn dibe. Ji bajêr vedigere malê ew di nav fikara de ye, gelo wê girtina birayê xwe ji diya xwe re çawa bêje? Dema tê malê:

“(…) dayik bitirs dipirse:

– Kurê min xêre?

– Xêre, – Şêrzad bi dengêkî westiyayî lê vegerand.

Bi xwe, diya Şêrzad, jineke navser bû. bi qelafet bû û gelekî ji xwe ewle bû. Piştî mirina mêrê wê, li hundirê malê bi rehetî bi meqamê wî radibû. Diyar e, ew jî, ji ber koka malbata çiyayetiye dihat. Ne dût e jî, ev yek ji ber navê kurê wê Ehmed ku pir bi qencî dabû, dihat. Van taybetiyan dihişt ew dûtî pepûktiya jinên nezan bikeve (Nazê, h.b.: 34).

Diya Şêrzad bi van tayebîyan, ji aliyê vebêjêr ve tê dayin. Diya şêrzad yeke wêrek ku xwedî kesayetiyeke xurt tê dîtin. Ew ne jineke nezan û pepûk e. Vebêjêr, dîsa jinê bi çavê nêrina civakê ji me re ridigihîne. Di civakê baviksalar de, jin nezan

û lawaz e, li hember bûyera bi hêz tev nagere. Birêvebiriya malê di deste zilam de ye. Diya Şêzad ne wisa ye. Ew ji xwe ewle û xwedî gotin e. Li hemberî rewşên giran bi hêz e. Lê belê em dibînîn ku vebêjêr (nivîskar) van taybetiyên diya Şêzad bi hin tiştên din ve girê dide; bi koka malbata çiyayî ve. Biewlebûn û çalabûna wê, ne bi kesayetiya jinbûna wê, lê bi taybetiyê malbata wê ve tê girêdan. Li ser girtina kurê wê “dayikê nepirsî, ji bo çî ew hatiye girtin. Ji ber ku bi xebata kurê xwe dizanibû. Û çawa roja mirina mêrê xwe, bi mêranî di ber dilên zarokên xwe de, niha jî heya jê hat, xwe girt” (Nazê, h.b.: 34). “Bi mêranî liberxwedan” ev hevok nêrina zayenda civakî datîne berçavê me. Dubendiyên ku bi rolên zayenda civakî derdiketin pêşiya me ewbûn ku; mêr bihêz û jin lawaz e, mêr çalak û jin pasiv e (Cîhancer, Watkins, h.b.:32). Dema biryara bidarvekirina Ehmed jî tê dayin, dîsa dilê qewîn yê diya Şêzad derdikeve pêş û “ma ne bexê nêr ji bo kêrê ye” (Nazê, h.b.: 36) dibêje diya Şêzad. Lehengî û wêrekî taybetiyên mêrane ne û diya Şêzad di nav vê nêrina civaka mêrserwer de, ji me re tê radigihîn.

3.3. Helîm Yusif – Sobarto

Helîm Yusiv di sala 1967an de li Amûdî hatiye dinyayê. Li zaningeha Helebê Fakulteya Hiqûqê qedandiye û ji sala 2000î ve li Elmanyayê dijî. bi dehan gotarên wî yên wêjeyî di kovar û rojnameyên erebî û kurdî de weşiyane. Heta niha berhemên wî bi kurdî, erebî, tirkî û elmanî çap bûne. Ji nivîsên wî yên bi navê “Komara Dînan” Bidarvekirina Pozekî” û “Sol û Serî” wekî listikên şanoyê hatine çêkirin. Berhemên wî: Marê Avis (çîrok, bi erebî 1991, bi kurdî 1997)– Jinên Qatên Bilind (Çîrok, bi erebî 1995, bi kurdî 1998)– Mirî Ranazên (çîrok, 1996)– Sobarto (roman, 1999)– Memê Bê Zîn (çîrok, 2003)– Tîrsa Bê Diran (roman, 2006)– Gava Ku Masî Tî Dibin (roman, 2008)– Romana Kurdî (lêkolîn, 2011)– Auslânder Beg (çîrok 2011)

Romana Sobarto yekemîn romana Helîm Yusif e. Roman ji şeş beşan pêk tê. Her beşek wekî deriyekî hatiye binavkirin. Nivîskar, deriyê heftan venekiriye û ew ji xwîneran re hiştiye. Roman li welatekî ku navê wî Sobarto* ye derbas dibe. Sobarto welatekî têkçuyî ye, hemû mirovên vî welatî têkçuyî ne. Welatekî di nav toz û

* SOBARTO, li gor jêderên dîrokî, sînorê Sobartoyê ji rojhelet de Çiyayê Zagros e û ji rojava de çemê Xabur e, li gor Merdok Blan (710-721 berî zayinê), şoreşgerê li dijî desthilatdariya Aşûriyan, Sobarto, navê herêma Aşûriyan bû. Helîm Yusif, Sobarto r. 5.

dûmanê de, talankirî ye. Wekî perçebûna welatê Sobarto karakterên romanê jî perçekirî ne: li aliyekî tevger û rêxistinên ji bo rizgariya Sobarto dixebitin hene, li aliyekî in jî Sobarto wekî ku di nav qedera xwe ya kambax de, têkçuyî ye. Nîvîskar van tevgerên li Sobarto ku di nav nakokiyên de ne, bi awayekî rexneyî û îronîk vegotîye. Gelek bûyerên civakî mîna şewata Sînemaya Amûdê di nav romanê de cî girtiye.

Çîroka romanê li ser evîna Silêman ya ji bo Belqîseyê ye. Evîna ku Silêman dîn kiriye û bûye sebebê têkçuyîna wî. Silêman ji Belqîseyê hez dike. Belqîse, bi emir biçûk ku hîn zarok e; keça mamosteya Silêman, Xanimê ye. Xanimê alîgirê partiyeke çep e. Dema ew û hevserê xwe Merwan û tevî endamên partiye pê dihesin ku Silêman ji belqîseyê re nameyan dişîne û li dor wê digere, bi awayekî tund dijî vê yekê derdikevin. Vê yekê li dijî ehlaqên partiye dibînin. Silêman zanîngehê qezenç dike û ji bajarê Sobartoyê diçe bajarekî din ku ew bajar ji bajarê Sobartoyê cuda ye. Bajar ji sobarto pêşketîtir e, xwedî avahiyên bilind e. Ango ew bajar bajarê ku ji Sobartoyê serdesttir e. Silêman pîştî çûnê ji Belqîsê dûr dibe, bi hin jinên din re têkiliyên wî çêdibin. Lê ew xwe li ser evîna Belqîsê dibîne û ew ji bîr nake. Belqîs di vê navberê de bi dewlemendekî bi navê Savaro ku li Siudî dixebite re dizewîce (bi zexta dê û bavê xwe) lê pîştî demekê ew dev ji hev berdidin. Silêman cardin pê re dikeve nav têkiliyê û di dawiyê de, dîn dibe û piştîre agir pê dikeve û dişewite.

Di romanê de navên karakteran Sembolîk in. Mîna lehengên sereke Silêman û Belqîs, wekî bibîrxistinê navê xwe ji çîroka Silêman pêxember û Belqîsê girtine. Silêman xwedî pepûyekî ye. Ev pepû qasidê evîna wî ya li ser Belqîsê û welatê Sobarto ye. Gustîleke Silêman heye, cinan ew jê re kiriye diyarî. Gava ku dikeve tengasiyê, alikariyê ji gustîlê dixwaze. Herweha di romanê de gelek taybetiyên derasayî tîn xuyakirin.

Di romanê de mirov rastî têkiliyên enest tê, ku karakterên hin zarok in, di nav têkiliyên homoseksuelî de ne jî dibîne. Têkiliyên enest derdikevin pêşberî me mîna têkiliya Bavê Emşa û xwişka wî Hemîda, Reşo û xatiya xwe, bavê Şêro destdavêje keça xwe.

3.3.1. KARAKTERÊN JIN

Di romana Sobarto de, çend karakterên jin hene, ên wekî; Belqîs, Xanimê, Pîra Felek, Hemîda, Firyal, Silva, Selma û Nêrgiz in. Ev karakter ji xeynî Belqîs, Pîra Felek û Xanimê, di hin beşên romanê de cî digirin.

3.3.1.1. Belqîs

Belqîs keçika biçûk e, ku lehengê sereke yê romanê Silêman jê hez dike. Di romanê de tiştên di derheqê Belqîsê de em ji devê vebêjê romanê Silêman û diyalogên di navbera wan de, hîn dibin. Belqîs keça Xanimê ye. Xanimê mamosteya Silêman e. Silêman ji Belqîsê hez dike, li dor wê digere. Gava ku Xanimê û hevserê xwe Merwan pê dihesin, ku dile Silêman di keça wan de ye, bi vê yekê gelek aciz dibin. Xanimê û Merwan girêdayî partiyeke çep in. Li ser vê yekê endamên partiyê, dicivin û Silêman ji ber vê yekê didarizînin. Jê dixwazin ku ew dûrî Belqîsê bisekine.

Silêman piştî demekê beşa felsefeye qezenc dike û ji Sobarto ji bo xwendinê ber bi bajarekî din ve diçe. Piştî çûnê, Silêman ji Belqîsê bêxeber dimîne û dikeve rewşeke xerab. Dûre teyrikê Silêman pepûk derdikve sahnê û agahiyên Belqîsê ji Silêman re tîne. Di vê navberê de têkiliyên Silêman bi hin jinên din re jî çêdibin. Yek ji wan jî Selma ye. Piştî ku Selma li hemberî hezkirina xwe ya ji bo Silêman bê bersiv dimîne, xwe digihîne Belqîsê, dibe sedemê naskirina birayê xwe Savar û Belqîsê. Savar yekî dewlemend e, li Siûdî dixebite. Ji ber dewlemendbûna Savar dê û bavê Belqîsê wê pê re dizewicînin. Vebêjerê romanê Silêman ji ber evîna Belqîsê har û dîn e. Piştî ku xebera zewicandina Belqîsê dibihise û tirsawendakirina wê:

“Ma gelo tawanbarî çî ye? Ma ne tawanbariya herî mezin ew e ku ev gewdeyê xweşik bibe para yekî din? Gelo ev jixwehezî ye? An tirseke rojhelatî ye li ser ketina vî gewdeyê bin mêrekî din? Ev gewde wê çawa piştî kêlîkekê dûrî tiliyê min bikeve? Na ew gewde ji min re ye (Yûsiv, 2014: 96).

Windakirina Belqîsê ji bo Silêman fikara windakirina bedena wê ye. Wekî ku Belqîs tenê ji bedena xwe pêk tê û ev laş wê çawa bibe para yekî din. Tîştê ku bi lehengê me zehmet tê; dê bedena Belqîsê têkeve destê yekî din. Di vegotinên Silêman de ku em Belqîsê ji vegotina wî nas dikin, ji xeynî şayesandina fîzîkî ya Belqîsê, em taybetiyên mirovan bi Belqîsê re kêmbibînin. Wekî ku ew ne xwedî rih

û kesayetiyeke be, tenê ji bedena xwe pêk tê. Silêman li ser vê nêrîna xwe li xwe mikûr tê. Gelo ev jixweheziye an tirseke rojhelatî ye? Di civakên ku kevneşopîya bavixsalariyê lê xurt in, rolên zayendî û wateyên ku zayend li xwe bar dikin bi awayekî berbiçav li holê ne. Di van civakan de jin, wekî milkê bav û piştî yê mêr e û bêtir wekî objeyekê ye. Silêman jî bi tirsî rojhelatî hinekî vê tîne bîra mirov. Mêr bedena jinê wekî ya xwe dibîne. Tehemulî fikira ku ew bî yekî din re be nake. Ev yek bi Silêman re jî heye. Lê belê Silêman ji xeynî Belqîsê bi jinên din re jî dikeve têkiliyên cinsî, lê ev yek ji bo wî bi ti awayî ne problem e. Ew ji xwe, ji Belqîsê hez dike. Ew têkiliyên xwe yê bi jinên wekî Firyal û Sîlvayê re wekî sahneyên erotîk û bextewar vedibêje. Tirsî rojheletî dibe ku ev nakokî be jî. Dîsa Silêman dema li ser şeva daweta Belqîs û Savar difikire wiha dibêje:

“Belqîs tazî bû û bi razîbûneke mezin gewdeyê Savarê tazî dibir û dianî. Min dixwest ez serê xwe bi xeyalên nexweş re jêkim û bavêjim dûr. Lê ma ne wê ev tişt tevde îşev bibin Silêman.(...) piştî ku gotiye ez te wek mêrekî dipejirînim, wê bi dilekî rehet xwe bide Savar (Yûsif, h.b.: 104).

Belqîs piştî ku dizewice bi Savar re diçe Siudî. Di zewaca xwe de ne bextewar e. Piştî demekê ew vedigere Sobarto û bi Silêman re pêwendî bi rêya telefonê datîne. Li vir Belqîs bi diyalogên telefonê bi saetan hezkirina xwe ya ji bo Silêman tîne ziman ku çiqas ji wî hez dike. Silêman vedixwine mala diya xwe û li odeya birayê xwe ew û Silêman hev dibînin û bi hev şa dibin (Yûsif, h.b.: 161). Sahneyên bihevşabûnên wan li hin deran wekî sahneyên pornonrafîk tîne xuyakirin (Yûsif h.b.: 159). Ev têkiliya wan demekê wiha dewam dike. Vegotin û diyalogên ku li ser hevdişîn û evîna wan e, her şayesandina xweşikbûna bedena Belqîsê ye. Di navbera wan de diyalogên wisa derbas dibe:

“–Dixwazim te tazî bibinim.

Gewdeyê wê li hevhatî bû, spî bû, hinekî ber ziwabûn û zerbûnê de diçû. Pûrteke hûr ew dinixwumand, wê jî bitirs lê dinêrî:

-Bibore ku ez negiham xweşik xwe ji te re amade bikim (Yûsif, h.b.: 161).

Belqîs ji aliyê Silêman û vebêjê romanê yê kesê sêyemin ve her gava ku tê şayesandin bi awayê zayendîtî ve û fiziki ye. Ji xeynê vê yekê ku piştî Belqîsê

biguhere -ku ev guhertin jî dê wekî jineke xerab derkeve holê- tabetiyeke wê yî din em nabinin. Em dibînin ku Belqîs jî bedena xwe pêşkêş dike:

“Min dixwest her tiştî bidim te Silêman. Ji te tenê re xwe tazî bikim û bi qîzanî xwe bidim te û bi evîna jineke ku ji bilî te jî kesekî din hez nekiribe ez ji te re bibêjim” (Yûsif, h.b.: 169). Belqîs dema behsa têkiliya xwe û hevserê xwe ji Silêman re dike jî wiha dibêje: “Destpêkê min xwest ez dîwarê di nav xwe û wî de bişikînim û bi giranî min guh dida odeya razanê. Min cilên tenik jê re li xwe dikirin, lê her ku ez tazî bidîtama rûyê xwe diguhert” (Yûsif, h.b.: 169).

Lê piştî demekê em dibînin ku Belqîs ji nişka ve diguhere, nema êdî ji Silêman hez dike. Dev ji Silêman berdide û wekî jineke xerab derdikeve holê. Silêman li ser vê yekê dikeve rewşeke xerab. Pepûya ku qasidiyê jê re dikir hew xuya dibe. Silêman bi alîkarîya hingulîska xwe ya ku ji cinan diyarî sitendibû, pê dihese ku têkiliyên Belqîsê bi gelek mêrin din re jî çêbûne:

“Silêman li hemû hevpeyvînên wê û evîndarên wî guhdarî kir. Ji du xortan re eynî peyvên ku ji Silêman re digotin dubare dikirin. Ji odeya girtî Silêman “birîndar” û candîl û ketî derket. Li kolanên Sobartoyê yên vala digeriya” (Yûsif, h.b.: 178). Silêman li ser vê yekê bêzar û perîşan li nav kolanên Sobartoyê digere.

Piştî ku Belqîs dev ji Silêman berdide, em êdî agahiyên wê ji koxa Pîra Felekê dibihîsîn. Koxa Pîra Felek ciyekî tarî e, ciyekî bi seyr e. Herkes tiştên ku di nav koxa Pîrê de diqewimin meraq dike. Belqîs bi gotina vebêjêr, li wir bûye qiralîçeya xweşiyê, mêrên ku tîrên wir hemû dixwazin pê re razin. “Hinek rexnegir jî amade bûn ku jiyana xwe bidin li hember şeveke germ” (Yûsif, h.b.: 182). Belqîs êdî bi nav û deng bûye. Hemû rojname behsa wê, rola wê ya di dîroka hûnera Sobari de dikin. Kovar û rojname bi rengê wê hatine xemilandin. Vebêjêr dema behsa binavûdengbûna wê dike, ku ew edî bûye hunermend, zimanekî îronik û nêrane bikar tîne: “hûnermendiya bilindkirina lingan” (Yûsif, h.b.: 182).

Vebêjer (nivîskar) li vir zimanekî îronîk û hişk (ku tevgerê jinê biçûk dibîne) bi kar tîne. Belqîs ji herkesî re lingan hildide. Her weha hevokeke din ji ku bala

mirov dikişîne, ji destpêka romanê heta dawiya romanê wekî “leîtmotîf”^{*} ê tê bikaranîn heye: “jineke spî lingan hildide û ji nav her du ranên jihevdeçuyî petrol diherike” (Yûsif, h.b.: 9) Em paşî hîn dibin ku ev jin Belqîs e. Dema miroiv ku bi xwendina romanê ve diçe, tê digihîje ku Belqîs bedena xwe ji bo pereyan dide. Mêrê ku pê re zewicîbû (Savar) dewlemend e û li Siûdî dixebite.

Belqîsê, bi evîna xwe Silêman dîn kiriye û ew ji vê yekê kêfxweş e, çixara xwe ji agirê ku bi canê Silêman ketiye pêdixe. Gava ku Silêman diçe koxa Pîra Felek ji bo dîtina Belqîsê, Belqîs tazî li ser text e û bi çarşefa ku berê ew û Silêman li ser bihevşabûne raxistiye. “Mêr hildibijartin û li ser eynî çarşefê bi wan re diket govenda tazîbûnê” (Yûsif, h.b.: 191). Silêman li vir rewşa wê temaşe dike. Ew di nav kêfxweşiyê de ye û li hêviyê ye ku yek çixara wê vêxe. “Kurmik ji darên Silêman nêzîk bû û dest bi keritandinê kir. Berî ku bikeve çirisk ji çavên wî çûn û ronahî dan. Bi qêrînê re agir bi serê wî ve hilperikî û li hemû deverên laşê wî belav bû. Bi xwîneke sar Belqîsê lê dinêrî û bi germahiya agirê gur kêfxweş bûbû (...) û ber bi agirê wî ve meşiya, çixareya xwe jê vêxist” (Yûsif, h.b.: 191-192). Belqîs wekî jineke xerab, şeytan û ji xerabiyê zewq distine derdikeve pêş.

Belqîs keça Xanimê ye û Xanimê mamoste ye, tevî vê endamê partiyeke çepgir e. Lê belê balkêş e ku Belqîsê naxwîne û wekî jineke nexwende xuya dibe. Ew bi biryara dê û bavê xwe tê zewicandin. Ew paşî li wekî ku ji Silêman hez dike û bi rûpelan vê hezkirina wê tê dayin û dûre di koxa Pîra Felek de bedena xwe ji bo mêran pêşkêş dike.,

Silêman gava êş û tenêtiya xwe hîs dike, dibêje ku Belqîs tenê ne jin bû ew doz bû jî (Yûsif, h.b.: 85). Bi vê yekê koxa Pîrê dişibîne welat (Sobarto) ku li her duyan jî xerabî û nexweşî serdest in. Her dû jî têkçûne û koxa Pîrê ku dişibîne welat wekî “kerxaneyê” bi nav dike (Yûsif, h.b.: 191). Ji aliyekî ve jî ji bo rizgariya Sobartoyê têkoşîn tê meşandin. Li vir şibandina Belqîs (jinê) û doz û welat heye, ku her du jî têk çûne.

* Leîtmotîf; teknîkeke di edebiyatê de, bi taybetî di hunera romanê de pir tê bikaranîn. Vegotîneke di beşên romanê yê cudade, ji ber hin sedeman, dubare dibe.

3.3.1.2. Xanim

Xanim mamosteya serleheng û vebêjê romanê Silêman e, û diya Belqîsê ye. Xanim, di destpêka romanê de wekî mamosteyê dewletê tê xuya, ya ku bi zimanê fermî diaxive û bi zimanê Sobariyan nizane. Lê paşî em dibînîn ku Xanimê keça Şoreşgerekî kevn e ku bavê wê jî bûbû sembola berxwedana li dijî dijminên Sobarto tar û mar kiribûn (Yûsif, h.b.: 39) Xanimê û mêrê xwe Mamoste Merwan endamê partîyeke çep in ku ji bo mafê Sobariyan tê dikoşin. Xanimê xwedî zanîna siyaset û dinyayê xuya dibe, ew behsa emperyalîzme û çîna burjuvayê dike. Di romanê de meriv li ser Xanimê, rexneya partiyên Sobarto yên çep dibîne. Xanimê wekî kesayetîyeke di nav xwe de bi nakokî ye. Ji aliyekî ve nîrxên partiyên çep diparêze, ji aliyekî din ve jî hemû taybetiyên civaka kevneşop û herweha taybetiyê jina di vê civakê de diparêze. Gava ku Dîno û hevalên xwe li ser vê yekê diaxivin Dîno wîha dibêje:

“Ev jin, Xanim, li ser navê bavê xwe dijî, lê ew bixwe vala ye. Ev partî ji wê û hevalên wê re kiras e, her ku hewcebin li xwe dikin. Ew bi xwe karê jinên partîya xwe dimeşîne û qîzên xwe nabe civînan” (Yûsif, h.b.: 74). Û ew gotinê tîne ser dîtînen Cegerxwîn yên li ser partîyan: “Cegerxwîn digot, ev wek xwediyê keran e. Partîya xwe wek kerê li devê derî girê didin û barên xwe davêjin ser piştê wê” (Yûsif, h.b.: 75).

Xanimê jineke li ser şop û mîrateya bavê xwe, di nav partiyê de cî girtiye. Rexneya ku di romanê de li Xanimê dibe, rexneyeke giştî ya li ser partiyên nav kurdan ên çep e. Gotin û kirînen wan nabe yek, ew wekî fikir pêşketî xuya dibin, lê bi kirînen xwe bi civaka kevneşop a feodal ve girêdayî ne. Li gor berjewendiyên xwe tev digerin. Xanimê jî mamoste ye û di nav partîya çep de cî digire, lê belê bi tevgerên xwe temsîliyeta civaka bavixsalar dike. Em hişmendiyêke jinane jî pê re nabînin, tevî ku di nav partîya çepgir de ye. Di nav partiyên çepgir de bi awayekî berbiçav, pîrsgirêkên jinan cî digirin û jinên di nav tevgerên weha de bêtir bi mafên jinbûnê dihesin û hay jê hene ku ji bo civakê jî dibin pêşeng. Tê zanîn ku tevgerên femînîst bi awayekî di nav partiyên çep de geşedane. Wekî femînîstên Sosyalîst û Marksîst ji nav tevgerên çep derketine (Ku me di beşa teoriya femînîst de, qal kiribû). Lê bi tu awayî em vê yekê bi Xanimê re nabînin. Dev ji femînîzmê berdin, bi

tu awayî hişmendiyeke jinane pê re tune. Xanimê, wekî jineke nexwende û bi pîvanên civaka baviksalar û feodal tev digere. Ew bi xwe mamoste ye lê keçên wê naxwînin. Dixwaze keçên xwe bi kesên dewlemend re bizewicîne, dema ku Sabîro keça wê Zenûbya dixwaze: “– ez qîza xwe biavêjim deryayekê û ez wê nadim yekî “Bêrtî”! Sabîro jî ev helwesta seyr a xesûwa xwe bi kenekî tal şîrove dike:

“– Xesûwa min xwe berevajî çeng dike, ji nav neteweyiyê xwe diavêje êlperestiyê, mêjiyê xesûwa min wek tirşikê ye. Navneteweyî, malbatî, mazotî, heramî, zeytî, tevde tevlihev e. Ma çima eşkere nabêje ku ez hejar im, bê pere me, berî mehekê xortekî Bêrtî hat, Belqîs xwest û ji ber ku zengîn bû, dixwest wê bide wî, lê Belqîs nexwest” (Yûsif, h.b.: 96-96).

Xanimê ji devê Sabîro, bi van nakokiyên kû Xanimê di xwe de dihewîne, tê vegotin. Xanimê di mijara zewicandina keçên xwe de li eşîrtî û dewlemendiyê dinihêre. Sabîro bi xwe jî di nav partîya Xanimê de ye. Sabîro bi xwe jî karakterekî bi nakokî ye, ji ber ku gava hezkirina Silêman ya ji bo Belqîsê di nav partiyê de tê nîqaşkirin, Sabîro bertekên tund dide û vê yekê li dijî “ehlaqên proleterî” dibîne (Yûsif, h.b.: 67). Herweha têkiliyên partîbûn û malbatî eşîrî tê rexnekirin. Ev yek bi zimanekî qerfî tê kirin. Mînak gava behsa Sovyetê dibe, “Yekîtiya Sofî(yet)” (Yûsif, h.b.: 73) dibêje. Ew zarokên xwe li ser navê partiye dişînin derveyî welat (Yekîtiya Sovyetê), Xanimê û Mamoste Merwan gava ku kurê xwe dişînin Yekîtiya Sovyetê, Sabîro li hemberî vê derdikeve wiha dibêje:

“Çiqas yek nêzikî malbatên endamên serokatîyê be, ew qasî nêzikî derketina derve ye jî û pîştî demeke dirêj Sabîro agahiyên dawî li ser Piskewîto anîbûn” (Yûsif, h.b.: 73).

Xanimê li ser zewaca keça xwe Belqîs û Savar kêfxweşe e. Savar bîst salî ji Belqîs mezintir e, lê ji ber dewlemendia wî ew razî ye. Di daweta Belqîs û Savar de Xanimê wiha tê şayesandin:

“(…) Xanimê jî xwe dihejand, ne di bin bandora vexwarinê de, lê di bin bandora hatina ewqas bazirganên mezin de. Ji dil dixwest xwe ji gemara feqîriyê bişo û bavê xwe wekî qurbanekî erzan didît. Ev cara yekemîn e ku ew qasî kîna bavê xwe Salarê Sobarî dikişîne û dixwaze van piyalên tijî şampanya berde qelşên gora wî û axa gora wî bi wîskiyê bişo” (Yûsif, h.b.: 102). Li vir qehr û kîna Xanimê ya li feqîriyê tê

gotin. Di eslê xwe de ew di nav daxwazeke dewlemendbûnê de ye. Piştî vê pasajê îca Xanimê diaxive:

“ – Rabe Salaro rabe!.. Rabe! Ji wê gora sar derkeve. Ji bilî bêrîkên vala bi dû wê xebata te ya dirêj de, te çî ji me re hişt? Bavên xelqê mal û milk ji zarokên xwe re dihêlin, a te, te raman, gûman û xewnên vala ji me re hiştin” (Yûsif, h.b.: 201-103).

Xanimê, jineke her çiqas xwende (mamoste) be jî û tevî ku keça şoreşgerêkî kevn be û ew wekî li du şopa bavê xwe diçe xuya bibe jî, ew di eslê xwe de jineke ku bi nirxên civaka kevneşop û baviksalar ve girêdayî ye. Ji vî alî ve, ji aliyê nivîskar û karakterên romanê ve tê rexnekirin. Lê belê mirov tê digihîje ku ev rexne, bi rêya Xanimê li partî û tevgerên kurd tên kirin. Ev neyênîya welat û partiyên wê di kesayetiyeke jinê (Xanimê) de hatiye simbolîzekirin.

3.3.1.3. Pîra Felekê

Wekî gelek navên lehengên romanê (Belqîs, Silêman, bavê Silêman Dawid) navê Pîra Felek jî navekî simbolîk e. Felek bi xwe tê wateya qedera, gerdûn, kaînatê. Mirov di nav destên felekê de bi alîyekî ve dîteriçin. Qedera mirovan di nav bayê wê de, ber ba dibe. Pîra Felek ji xelqê Sobartoyê re keseke bitirs û xof e, û herweha çareya derd û kulên xwe jî la bal dibînnin. “Tu kes nizane Pîra Felek kî ye. Ev pîra porsipî, kofîreş, xwedîya gopalê hezarsalî, li gor gotina wê, dibe ku gopal tenê ji Pîrê bi xwe kevintir be” (Yûsif, h.b.: 13). Sobartoyî ji nivîşt û devgirêdanên wê ditirsin. Ên ku di roj û şevê de nêrîn û helwestên mêran berovajî dike (Yûsif, h.b.: 14). Li ciyekî din jî disa Pîra Felek wiha tê şayesandin:

“Pîra Felekê ne tim tê dîtin. Xelkê ji bîr dikir ku Pîrê mirov e û divê mîna herkesi ew jî bimire. Hinekan digotin ku “Felek” ew bi xwe ye; ya ku di çîroka Siyabend û Xecê ya gelerî de tê dîtin û ew bi xwe Felek e; ya ku şîqamek li birayê wî Qeregêtran xist û diranên wî xistin destên wî, ji wê rojê de tu kes ne wêre li ber Pîra Felek rabe, ligel tê gotin ku ew bi xwe, bi dû wan hemû bûyerên de ye ku li Sobartoyê diqewimin” (Yûsif, h.b.: 14).

Pîra Felek, pîreke efsaneyî û simbolîk e, qet pîr nabe. Her çermê xwe diguherîne û ciwan dimîne. Xwedî koxekê ye, ku herkes meraq dike ka gelo çî li wê koxê diqewime lê kes cesaret nake biçe wir. Dema ku Belqîs êdî xwe spartîye koxa

Pîrê û Silêman jî êdî bi windakirina wê dîn bûye, berê xwe dide koxê ji bo dîtina Belqîs. Kox wekî ciyê ku hemû xerabî lê diqewimin tê taswîrkirin: “Li hundirê koxê zengînan li ser kêfa xwe jiyana xwe dimeşand. Li kêleka wan xelqên jar û birçî, neqeb û qorzîk û derî û text paqij dikirin. Li hember nane zik şaşîfîyeke piçûçik jî dibû sedema jêkirina serî” (Yûsif, h.b.: 190).

Ev ciyê ku hemû xirabî lê diqewimin dişibine kerxaneyekê. Jin li wir tazî ne û mêran ji rê derdixin, dibin sedema têkçûn û mirina wan. Kesê ku diçin wir ji hiş diçin. Di nav lepên wan jinan de helak dibin:

“Pîra Felekê mêr derbas dikir şaxê xwe ew tazî dikir, ew di nav pêlên xweşiyê de çend rojan dihişt û ji zora xweşiyê re qajînî ji wan dihat. Piştîre û bi derbeke tenê serê wî ji gewdeyê wî hildiqtand. Kêfa wê pir ji meşa laşê bê serî re dihat” (Yûsif, h.b.: 190).

Mêr li koxa Pîrê, di nav xweşiya cinsî de ji hişê xwe diçin û paşê tîn kuştin. Balkêş e ev yek jî bi destên jinan pêk tê. Pîrê serê wan piştî xweşiyê bi derbekî re dibire. Wekî berê jî me gotibû Pîra Felek “felekê, qederê” temsil dike. “Felek” jî wekî jinekî hatiye simbolîzekirin. Mirov dikare bibêje ev yek piştî xwe dide, fikra ku jin jêdera hemû xirabiyan e. Ji aliyekî din ve peyva “felek” wekî peyveke mê be jî, lê ji aliyê wateyê ve xwedî wateyeke razber û bê zayend e. Her weha Pîra Felek karaktereke xerab e. Gelek kes wê dişibînîn “pîra merivxwir”^{*} a çîrokên gelerî ku ev leheng jî lehengeke xerab e û wekî pîrebok e.

Koxa Pîrê, ne koxek e, welatek e ku li gor dilê Pîra Felek hatiye endezyarkirin. Hemû beş û şaxê vî welatî bi dilê Pîra Felek hatiye çêkirin. Ev kox an jî welat, Sobarto bi xwe ye. “Di wê demê de kox fireh bûbû û seranserê welêt dabû ber xwe. Zagonên kevn ên koxê bûbûn zagonên welêt. Koxa kevn bûbû dergêh ji welêt re û bi xêzeke qalind “Sobarto” li ser derî hatibû nivîsandin (Yûsif, h.b.: 189).

3.3.1.4. Hemîda

Hemîda xwîşka Bavê Emşa ye. Em Hemîdayê ji devê serleheng Silêman nas dikin. Bavê Emşa, bi xweha xwe re di nav têkiliyeke enest de ye, digel vê bedena

^{*} Di çîrokên kurdan ên gelerî de pîra merivxwir jineke xirab be. Mîna tîpeke cadû jî meriv dikare wê biwesfîne.

Hemîdayê li hember pereyan pêşkêşî mêrên din û hevalên xwe dike. Hemîda wekî objeyeke cinsî tê pêşkêşkirin. Ew wekî yeke har û hîz û bi mêran re di listikê bihevşabûnê de, şareza tê vegotin. Serlehengê romanê Silêman jî pê re radizê û bi kitekit behsa vê têkiliya cinsî ya bi Hemîdayê re dike (Yûsif, h.b.: 61). Silêman gava ku behsa têkilîyên cinsî yê Hemîda dike ku çawa mêran har dike û wîha berdewam dike:

“(…) û her wiha hemû kesên ku ji bo jinan xwe kuştibûn dihatin bîra min. Min nas kir ku jin dikare xweşiyekê bide ku tu carî peyv nikarin wê xweşiyê bînîn (…)
min ji

Ji bo Silêman Hemîda, bi bedena xwe xweşiyê dide mêran, mêran ji rê derdixe û dibe sebebê xwekuştina wan. Em di karakterên jin ên Sobartoyê kêr taybetiyên mirovan dibînin. Pîranî wekî kaniya xerabiyên û objeyekê, tenê taybetiyên “mêti” ya xwe ve hatine tasawurkirin.

3.3.1.5. Firyal

Silêman li zanîngê xwendekar e. Bi şewbihêrkên nav xwendekaran de Firyal dîtîye lê belê li ser naskirin û diyaloga nava wan bêyî tişkek bê vegotin. Silêman dema di rê de rastî Selmayê tê, Firyal jî bi wê re ye û diyalogek wiha dinavbera wan de derbas dibe:

“(…) keçekê din a çavkesk di wan şevbuhêrkan de dihat xuyakirin. Hat cem min, rojname di dest de bû û ji nişka ve pirsî:

- Gelo jin di nêrîna te de wilo ye?
- Çilo ye Firyal?
- Pûteke bê can, kurmikeke hêjayî perçiqandinê...
- Dibe... dibe ku wilo bêhtir be.

“Di rojnameyê de min gotarek li ser feylesofên ku li ser jinê bi awayekî sirt dipeyivîn, nivîsandibû. Li cem wê problem ew bû ku dîtînen van feylesofan - Şopenhawer, Kêrkîar, Nîçe- gelekî nêzîkî dile min in û bi henekî dawîya gotinên xwe anî:

- Ez pêşerojê geş, wek pêşeroja Nîçe, ji bo te hêvî dikim” (Yûsif, h.b.: 83).

Firyal wekî keçeke xwende derdikeve pêşberî me. Ew, Silêman ji ber nivîsa wî ya li ser feylesofên ku xwedî fikrên neyînî ne li ser jinan, rexne dike, Silêman dişibîne Nîçe. Silêman ji vê yekê ne bêzar e, û li dijî vê jî dernakeve. Bi carekê re Belqîs tîne bîra xwe ku niha evîndar û mêvandarên re dilxweş e. Piştî vê axaftinê Firyal navnîşana xwe dide Silêman û wî dawetî odeya xwe dike. ew qebûl dike û diçe ba Firyalê. Firyal wekî jineke ku azad difikire tê nîşandan. Ev azad fikirîna wê tenê li ser tîkiliyên bi mêran re xuya dibe, û tîkiliya wê û Silêman bi nav ciyan didome:

“Serê xwe danî ser milê min û dest bi şîrovekirina rewşa pîrekê di dîrokê de kir. Ez ne bi şîrovekirina wê, belê bi wê, bi xwe daketibûm. Digot:

- Zewac projeyeke gemarî ye, dile min jê li hev dikeve.

Rojhelat tev de didît mîna axurekî û digot ku doh li ser eynî textî bi yekî din re bûm. Ez veciniqîm, şûna diranên xortê doh li ser qirika xwe pêş min kir” (Yûsif, h.b.: 84) Û Silêman didomîne, “ew bi ramanên xwe yê biyanî daketibû û ez bi xwarina wê hingiva biyanî daketibûm”. Dema mirov li karakterê Silêman dinihêre, dikare bibêje ku li ser vî karakterî hemû tîştên ku li Sobarto hene tî rexnekirin. Sobarto ku Kurdistane e, him ji aliyê zagonên civaka kevneperst ve him ji aliyên partî û rêxistinên nûjen ve tê rexnekirin. Firyal jî wekî jineke xwedî fikrên nûjen e, lê nûjenbûna fikrên wê tenê li ser tîkiliyên bi mêran re hatiye avakirin. Silêman jî ji xwe bi fikrên wê re ne mijûl e, ji xeynî mijûlîya zayendîtî. Firyal mêran wekî gustîla di tiliya xwe de dibîne, ligel vê hêza mîr jî di bin navika wî de dibîne (Yûsif, h.b.: 85) Firyal tîkiliya bi mêran re tenê wekî tîkiliya cinsî dibîne. Mîr ji bo wê jî mîna objeyeke cinsî ne. Silêman jî ji bilî Firyal bi çend jinên din re jî tîkiliyên cinsî datîne. Ew li aliyekî bi evîna Belqîsê dîn dibe û sedema ku ber bi van jinan diçe jî Belqîsê dibîne. Silêman li ser dîtinên Firyal ku di navbera wan re derbas dibin wiha dibêje:

“Tîştêkî nû di hundirê min de şikest. Laşê min sist bû, peyva nû qehb di serê min de dikir teqreq. Min jî li gewdeyê wê yê tazî û li ber destan zîq dinêrî. Wê kêlikê min bawer kir ku ez hîç nikarim ji gewdeyê jinekê hez bikim ku yekî din şîrikê min be, min nas kir ez çiqasî ji xwehez û rojhilatî me” (Yûsif, h.b.: 85).

Silêman nêrfîna xwe ya li ser bedena Firyal (ya jinê) an jinekê ku bi yekî din re parve bike wiha şîrove dike. Lê belê ew bi parvekirina bedana xwe de tu qirêjî û

nakokî nabîne û vê fikra xwe jî disipêre ji xwehezî û rojhilatbûna xwe. Li vir nivîskar nêrîna Silêman ku dixwaze jinê ku bi wan re ye, tenê aîdî wî bin, bi nêrîna mêrên Rojhilat ve gire dide. Mêrên Rojhilat wekî Silêman xwedî maf in, ew dikarin bi gelek jinan re têkilî deynin. Lê jinên ku bi wan re ne divê tenê ji bo wan bin.

Silêman piştî vê axaftinê ji ba Firyal diçe. Piştî demekê Silêman ji derketina sînemayê rastî Firyal tê, destê wê di destê xortekî din de û wan bi hev dide naskirin; ku xortê pê re mêrê wê ye. Erîşê wê yên li ser zewacî tîn bîra silêman: “– Qîz dema nêzîkî sihî dibe zengila xeterê li ser serê wê lê dide û jiyana wê, wê gavê bêyî zewac dibe dogeh” (Yûsif, h.b.: 129).

Nivîskar dixwaze bi nêrîna Silêman bide zanîn, jin çiqas li dû azadiya xwe bigere jî ku gihîşt emrekî ew dîsa wekî hemû jinan li zewacê digere

3.3.1.6. Sîlva

Sîlva jî wekî lehengên jin Firyalê, ji nişka ve dikeve nav romanê. Gava ku Silêman Firyalê di destê xortekî (hevserê wê ye) de dibîne, wê gavê Sîlva jî bi Firyalê re xuya dibe. Firyal tîne bîra Silêman ku wî û Sîlvayê bi hev re felsefe dixwendin û her duyan jî beşa felsefeyê terikandine. Firyal pê ve diçe ; tîştê ku we herduyan digihîne hev, hûn herdu jî ji pir felsefîk dipeyivin û hûn her du jî, we fakulteya felsefeyê kuta nekiriye (Yûsif, h.b.: 129). Hîn di vê hevdiînê de, ku hinekî li ser malbat û beşa felsefeyê xeberdidin, Sîlva navnîşana wî dixwaze.

Sîlva tê mala Silêman, ji Silêman re dilê xwe vedike ku hîn di dema xwendekarîya xwe de Silêman bala wê kişandiye. Lê ew qet hay ji Sîlva tunebûye. Sîlva didomîne, wê jî felsefe xwendiyê û dikare li ser vê mijarê here û were, lê ew wiha berdewam dike: “Eger min rê bida hestên xwe, ji mêj de min ê ji te hez kiriba, lê baş e ku wilo nebû. Berî niha tîkiliya min a bi xortekî ji malbata me re, tîk çû û ji tîkçûneke din re ez ne amade me. Ez ne tenê li tîkiliyeke cinsî digirim, ev jî li her derê heye. Ez li germahîya evîne digirim” (Yûsif, h.b.: 135).

Gera Sîlva li ba Silêman gera evîneke germ e û Silêman jî xwe ji ber evîna Belqîsê tîkçûyî dibîne. Lê tevî vê yekê jî tîkiliyek di navbera her duyan de dest pê dike. Sîlva her tîne ziman da ku Silêman bi wê ve neyê girêdan, nabe ku ew her dû bibin jin û mêr.

Sîlva keçeke file ye, ji malbateke rehet e. Malbata wê bi piranî li Emerîka ye. Wê dil heye piştî vegere wir. Sîlva pesnê civakên rojavayî, bi taybet pesnê Emerîkayê dide ku di têkiliyên jin û mêran de azadîyek heye, ku jin bi reheti dikarin têkiliyên zayendî bijîn. Sîlva bi Silêman ve tê girêdan û jê hez dike. Ji Silêman dixwaze ku wê ji keçîniya wê xelas bike. Vê yekê ji xwe re wekî asteng dibîne. Nirxên Rojhelat yê derbarê vê mijarê de, rexne dike û naletê lê dibarîne. Sîlva wekî bertekeke li civakê, dixwaze ji keçîniya xwe xelas bibe. Dema ku ew yek dibe ew wekî bertekekê dilîlîne. Em ê di mijara keçaniyê de nêrîna Sîlva ya li keçaniyê bi hûrgulî bidin.

Hezkirîna Sîlva ji bo Silêman zedê dibe. Piştî demekê ew duçanî dibe. Dixwaze ku zaroka xwe bîne dinyayê, lê Silêman vê napejirîne. Karaktera Sîlva karaktereke li dij nirxên civakê ye. Di heman wextê de girêdayî hezkirîna xwe ye. Lê tevgerên Silêman dike ku ew wî biterîkîne. Sîlva nameyekê ji Silêman re dihêle û diçe.

Îbrahîm Seydo Aydogan jî li ser karakterên jin ên romana Sobarto wiha dibêje:

“Bêtêriya şexsiyetekî ya jinan û ji ber vê yekê jî êrîşkirin û tawanbarkirina wan di romanê de weke mijara navendî diyar dibe. Jin weke haveynê xerabiyê hatiye nasandin, li hin deveran fikirine pêşverû jî di navê re xuya dibin. Ya girîng, pêwendî û fikrên Silêman yê li ser jina in. Balkêşe ku di vê romanê de qet nehatiye gotin ku Silêman yekî gelekî qeşeng e an jî bedew e, an jî kîjan xisûsiyeten wî yê din hene, lê jin giş xwe diavêjin ser wî. Jê balkêştir, jinên wî giş mîna hevdu tev digerin. Jinên wî giş ji nav livînan hez dikin û dixwazin bi serbestî têkiliyên cinsî bijîn. Yanî tam li gorî dilê zilamekî Rojhilatî ne. Lê fikirên wî yê li ser jinan ecêb in. Digel ku ewqas nêzîkiyê li jinan dike û giş jî bi wî re dibin heval, yê wî ew ji beşên erotîk û vegotina nav livînan pê ve behsa tişteki din nake. Ji ber ku qet behsa parvekirina Silêman ya bi jinan re nabe, Mirov dikeve vê baweriyê ku di vê romanê de jin ji nav livînan pê ve ji tişteki re nabin (Aydogan, 2014: 377).

3.4. Ferhad Pîrbal – Heft Wêney Rûtî Jinî Cenabî Wezîr

Ferhad Pîrbal di sala 1961ê de li Hewlêrê hatiye dinyayê. Di 1983an de li Zanîngeha Selehaddîn, beşa ziman û edebiyata kurdî temam kir, Di sala 1986an de

derket derveyî welêt. Li Parîsê Zankoya Sarbonê beşa Edebiyata Kurdî (Îranînasî) xwend û doktora xwe li ser “Mêjûy Edebî Modern ya Kurdî” tamam kir. Di navbera salên 1986-1994an de li Danîmarkê cîgirê sernûserê kovara Yakgirtinû Derwaza kir û nûsarên wî di kovarên Nûdem, Hîwa, Xermane, Havîbûn hat çapkirin. Di sala 1994an de vegeriya kurdistanê. Li Hewlêrê Kovara Wêran Derxist û ji 1997an heta 2011an di kovarên Wercêran, Ciwayez, Şîşîr deberpîrs û sernivîskarî kir. Li Hewlêrê dezgeha kulturî “ Mala Şerefxanê Bedlîsî” ava kir û bû rêveberê wê. Ji sala 1994an vir ve li Zanîngeha Başurê Kurdistanê dersên wêje û hunere dide.: li zaningeha Seleheddîn, Silêmanî, Koye, Xaneqîn niha jî li Zanîngeha Artûklûyê de jî wekî mamoste dixebite. Gelek bernamêyên hunerî di televîzyonên kurdî de çêkir. Di heman katî e heta niha li Hewlêr, Amsterdam, Parîs û li Başurê Kurdistanê 11 pêşengehên resmên xwe vekir. Di sî saliya huner ûnivîskariya xwe de Pîrbal ; Pîrbal dramaturg, nivîskar, şa’îr, akademisyen, wênesaz û aktör e. heta niha tevî pirtukên wî yên wêjeyî, hunerî, û lêkolînê 73 pirtukên wî hatine çapkirin. Çend berhemên wî: MulazimTehsîn û Şitirîş (romanî 2001) –Santiago e Compostella (roman, 2002)– Pîyawekî Şepqa Reşî PaltoReşî Pêlaw Şîn (roman,2003)–Reîs Remezekan (roman, 2006)

Serleheng û vebêjê romanê Ferhad e. Ferhad kurd e û li Moskovayê xwendekarê doktorayê ye. Li wir Ebû ‘Ubeyde Xeddâm ku ji Dûbey hatiye û bi eslê xwe Siûdî ye, nas dike. Ebû ‘Ubeyde jê dixwaze ku rêberîya wî li wir bike. Ebû ‘Ubeydeyî Xeddâm û şeş hevalên xwe xewnekê dîtine. Di xewna xwe de, bajarekî xweş ku tije mexaze, hotel û meyxaneyên cihehêreng û li kêleka çem rêz kirine dîtine. Di heman demê de jineke diran zirav, çav kesk û por medûsayî ji di xewna xwe de dîtine û her heft jî dil ketine vê jinê. Bi gotina Ebu ‘Ubeyde, ev heft heval ketine pey xewna xwe ku di rastiye de jî pêk bînin. Erka bidestxistina jina diran zirav, çav kesk û por medûsayî bûye peywira Ebu ‘Ubeydeyî. Ebû ‘Ubeydeyî bi Ferhad re li hemû bar hotel û ciyê şahiyê yên li Moskovayê digere da ku vê jinê bibine. Di vê navberê de bi dehan jinan re radizê, ew jina ku lê digere ka ew jin e an na. Ev jin jî piranî jinên ku ji dewletên biyani ku hinek jî dewletên Rojava ne. Li wan deran li hember pereyan bedena xwe difiroşin.

Herweha Ferhad jî, dema ku li Beyrûdê xwendekar bûye, têkilya wî bi jina Cenabî Wezir Kelsûm re çêbûye. Têkilya di navbera wan de têkîlyeke cinsî ye. Di

wê demê de, Ferhad heft wêneyê rût ên Kelsûmê, jina Cenabî Wezîr, kişandiye. Ferhad niha li Moskovayê ji jineke Fransî Margîrêt hez dike. Ebû ‘Ubeydeyî bi Ferhad re li gera jina por medûsayî, li nav hotel û barên Moskovayê didomîne. Kîjan jina ku dixwaze pê re radizê û Ferhad ji tevlî van partiyên seksê dibe. Li wîr Ebû ‘Ubeydeyî, wêneyê Ferhad ên tazî bi van jinan re dikişîne.

Piştî demekê Ebû ‘Ubeyde ji Ferhad dixwaze ku hevala wî Margîrêtê nas bike û ew wan vedixwîne pêşengehekê. Pêşengeh ji pêncî wêneyên çavê jineke di nav çarşefê de pêk tê. Ebû ‘Ubeydyî xwe wekî hunermed û wênekêşê van wêneyan jî dide naskirin. Dibêje, ev çavên di wêneyan de çavên jina wezîrekî li Dûbey in. Di vê navberê de Ferhad jî nas dike ku ev çav çavên Kelsûmê ne û li ser vê yekê difikire ka çi têkiliya Ebû ‘Ubeydeyî bi Kelsûmê re heye? Wezîrekî ereb di nav çarşefê de be jî çawa hiştiye ku wêneyê çavê jina wî bê kişandin. Piştî guftûgoya li ser van wêneyan ku Margîrêt ev wêne pir ecibandiye. Ebû ‘Ubeyde dibêje ger Margîrêt bixwaze, dikare wêneyên wê jî bikişîne. Margîrêt vê yekê qebûl dike. Lê belê Ferhad ji vê yekê pir aciz dibe. Dixwaze ku Margîrêt dev ji vê daxwaza xwe berde. Margîrêt ku ji hunerê hez dike û vê jî wekî hunerekê dibîne, daxwaza Ferhad qebûl nake. Ebû ‘Ubeydeyî hay jê heye ku wêneyê Kelsûmê bi Ferhad re ne û Kelsûmê mêrê xwe Cenabî Wezîr bi Ferhat re xapandiye. Li xwe mikur tê ku her tiştî zane, zane ku têkiliya Ferhad û Kelsûmê heye û ji xwe hatina wî ya Moskovayê jî ji bo bidestxistina van wêneyan e. Ku cenabî Wezîr ji bo bidestxistina van wêneyan, bîst û yek milyon dolarê dê bide. Ebû ‘Ubeydeyî, gefan li Ferhad dixwe, ger Ferhad wêneyan nede, wê vîdeoyên wî yên bi jinan re kişandiye nîşanî Margîrêtê bide. Ferhad bi vê yekê razî dibe û ew û ‘Ubeydeyî peymanekê îmze dikin ku Ferhad her heft wêneyên Kelsûmê yên orijînal dide ‘Ubeydeyî û ‘Ubeydeyî jî soz dide ku wê vegere welatê xwe û nêzî pêwendîya wî û Margîrêtê nebe. Beriya ku ‘Ubeydeyî li balefirgehê siwar bibe telefonî Margîrêt dike û dibêje ew bi xwe Cenabî Wezîr e. Ferhad diberxwe de difikire: “nexwe Cenabî Wezîr ji bo van wêneyan heta Moskov li dû wî hatibû. Dibe ku dê wan wêneyan di dadgehê de li hember jina xwe bi kar bîne. An jî ji bo bide eşîreta Kelsûmê da ku bibe sedemê kuştina wê.

3.4.1. Karakterên Jin

Di romanê du karakter derdikevîn pêş: Kelsûm û Margirêt. Wekî din jinên ku di romanê xuya dibin, ji xeynî têkiliyên wan en cinsî ku bi Ebû'Ubeydeyî re çêdibin, pêştir di derheqê wan de em tişteki hîn nabin.

3.4.1.1. Kelsûm

Kelsûm jina Cenabî Wezîr e. Gava vebêjê romanê li Beyrûdê xwendevan e, di navbera wî û Kelsûmê de têkiliyek çêdibe. Kelsûm û Cenabî Wezîr, ku heta dawiya romanê em wî wekî Ebû 'Ubeydeyî Xeddâm nas dikin, hîn nû zewicîne û ji bo meha hingivê hatine Beyrûdê. Dema Ferhad li ber qeraxa deryayê rûniştiye, Kelsûmê ji nişka ve xîçikekê diavêje Ferhad û wî vedixwîne odeya xwe. Ferhad li ser têkiliya xwe û Kelsûmê Weha vedibêje:

“Hemû jiyana min a xwendekariyê li Bêrûd, bi Kelsûma marmasî re derbas bû. Bi min wiha dihat ku dema ez bi wê re şa dibûm, weke ku min hemû hizb û dewletên ereb bi wan nihandina têk dibir. Min çêjeke yekcar xweş û bêpayan ji wan jinên ereb, tirk û faris distend, dema ku min dikarîbû li wan wiha bikim ku, xiyaneî li mêrê xwe bikin û werin bin siya qeweta min. Ev yek bûbû şewaza xebata min a netewî” (Pîrbal, 2014: 45).

Di çavê Ferhadî de Kelsûmê obje ye. Ew bi rêya têkîlîya cinsî, a bi Kelsûmê re, heyfa xwe ji neteweya ereb hiltîne. Di vir de Ferhad, herweha mirov dikare bibêje nivîskar, jinê wekî objeyeke cinsî û têkîlîya zayendî jî wekî desthilatdariyekê dibîne. Ew li ser bedena jinekê tola xwe ya neteweyî hiltîne. Ev yek xaleke girîng e, ku em ê di beşa mijarên ku di romanê de derketine pêş, binirxînin. Ev mijar bi serê xwe berê me dide nêrîneke din ya li ser jinê. Bedena jinê çawa bi netew û axa wê neteweyê ve tê simbolîzekirin. Mirov dikare bibêje ku ev nêrîn di heman demê de nêrînen nivîskar in. Balkêş e ku navê serleheng jî wekî navê nivîskar Ferhad e, û vebêjê romanê jî ew e. Li gor rexneya femînîst ya edebiyatê jî karakterên jin ên ku nivîskarê mêr diafirînin, ji nêrîn û fantezîya wan a li ser jinan ne cuda ye. Li gor Kate Millet zayendîtî ji bo mêr hêz û zewq e (Mîlet, 2011: 38). Zayendîtî wekî polîtîkayekê li ser jinê tê meşandin. Nivîskarên mêr jî vê li ser lehengên xwe didin der. Îbrahîm Seydo Aydogan jî li ser romanê ku yeklehang e, vebêjiya wan ji aliyê lehengên wan ve tê

kirin wiha dibêje: “Teorîsyenên romanê giş dibêjin ku di romanên yek leheng de ku vebêjiya wan ji aliyê lehengên wan ve tê kirin, zehmet e ku mirov nivîskêr û lehengên wan ji hev derxîne” (Aydoğan, h.b.: 379).

Kelsûmê dema bi Ferhad re diaxive, dibêje ku ew û Cenabê Wezîr, hîn nû zewicîne û ew ji bo meha hingivê hatine Beyrûdê, lê Wezîr, wê bi tenê dihêle. Kelsûmê: “Ewî ji bo xatirê dîtina dostên xwe yên kevn min aniye Bêrûdê, lê ew çûye cem kevnedestgirtên xwe û ji min re dibêje, min tu aniye meha hingivî” (Pîrbal, h.b.: 41). Kelsûm di vir de wekî tola xwe ji mêrê xwe distîne xuya dibe. Gava ku em bala xwe didinê, Kelsûmê ji bo Ferhad zayendîtîye û bi bedena xwe kêf û zewqê dide. Hew ji xeynî vê yekê ew ne tiştêkî din e, ji laş û bedenê pêk tê. Ferhad dema behsa xwe û têkîlîya Kelsûmê dike :

“Laşê wê weke bêhna qehweya şewitî difûriya ser min. Min dixwest qet nebe ji heftê carekê bedena wê ya mîna masiyekî rûtî şayik bibinim û bialêsim û tahm bikim têt têt... Gera çûn û hatina min a di nav bedena wê ya nerm û germ de, di her şabûna avjeniyê de ez noqî wê dibûm û dîsa vedijiyam... Min bi wê re hest dikir ku tola xwe ya hezar salan ji cinsê jinan hiltînim (Pîrbal, h.b.: 44).

Li vir tevî objebûna jinê herweha dijminîyeke li hemberî jinan jî tê dîtîn. Bi van hevokan nêrîn û neyartîya li hember jinê derdikevee holê. Ku Ferhad her bi têkîliya cinsî ya bi Kelsûm re tola xwe ya hezar salan ji jinan hiltîne. Têkîliya zayendî wekî desthilatdariyekê li ser jinan tê dîtîn. Têkîlîya zayendî û desthilatdariyê em ê di beşa mijarên romanê de analiz bikin.

Em karaktera Kelsûmê ji vegotinên Ferhat(î) nas dikin. Kelsûm jina Wezîr, ku navê romanê jî, ji heft wêneyên wê yên rût tê. Ferhadê ku heft wêneyên Kelsûmê yên rût, li cem in, bi peymanekê dide, Ebû ‘Ubeydeyî Xeddâm. Di dawîya romanê de em hîn dibin ku Ebû ‘Ubeydeyî, Wezîr bi xwe ye. Kelsûm karaktereke ku tenê bi mêtî û bedena xwe, di romanê de cî digire.

3.4.1.2. Margirêt

Margirêt keçeke fransî ye. Ji Parîsê hatiye Moskovayê, li Moskovayê di beşa Komelnasiyê de mastirê li ser mijara “Tûrîzma Seksê di Nav Zilamên ji Ewrûpa Diçin Welatên Rojhilat û li Dûbey Dîyardeya bi Nihênî Kirîn û Firotna Jinên Casûs

û Qahpikên Îranî û Sûrî” dike. Margirêt xoşevîsta Ferhad e. Naskirina wan li ser karên wan yên akademîk çêbûye. Bi hestên samîmî nêzîkî Ferhad dibe.

Margirêt li ser wan jinên ku li “night cluban”^{*} ji aliyê bazirganên mirovan ve tîr xebitandin û ew jin mecbûr dibin bedena xwe bifiroşin, masternameya xwe dike. Di heman wextê de xwedî hişmendiyeke jinane ye jî. Ji ber ku Margirêt li ser mijara jinên di bazara sekse de serê xwe diêşîne, û vê yekê wekî pirsgirêk dibîne. Tevî vê hişmendiye bi hestiyarî jî nêzîkî van jinan dibe. Dema behsa xewna xwe dike, ku di xewna xwe de dîtiye heft zilamên simbêlfîş û qebe bi porê jinekê girtine û dikişîşîn, digirî û wiha berdewam dike: “Ez bi halê jinên ku di teza xwe de qala wan dikim, digirîm... Ji birçîbûn an ji tunebûnê ketine bin rehmeta kabare û hotêlan laşê wan tê firotin... ji bo wan jinên bextreş digirîm ku xweziya xwe bi jinên Neandertal tînin ku zilamên tewirdas bi dest wan, porên wan bi dû xwe ve dikişandin...”

“Min ji Margirêt re got:

- Mijara vekolîna te bandora xwe li xewnên te jî kiriye” (Pîrpal, h.b.: 36)

Margirêtê bi hestiyariyê nêzîkî jinên ku bedena wan tê firotin, dibe. Di diyalogeke di navbera Margirêt û Ferhad de, ku li ser zewacê diaxivin, zewaca jinên rojhilat û rojava didin ber hev: “Di welatên rojhilatî de mahrkirina bi fermî, ji hêla zilaman misogeriyekê dide siberoja jinê. Li welatên rojava jî her weha ye ne?

Margirêt bi nermî bişirî

- Jin û mêranî peymaneke civakî ye û hew! Pêdivî ji bo temen heye, wexta jin û mêr dikevin payiza temenê xwe dizewicin. (...) Di jiyana jin û mêr de çi heye ji eşqê zêdetir be, ji min re bibêje?” (Pîrpal, h.b.: 38).

Margirêt ji bo tîkiliyên mêr û jinan û zewaca di navbera wan de, eşqê wekî bingeh dibîne. Li gor wê tiştê ku dê bexteweriyê bide wan ew e. Ji bilî vê tiştên (pere û hwd.) ku jin û mêran di zewacê de bîne ba hev dê bexteweriyê nede wan.

3.5. MIJARÊN BINGEHÎN ÊN HER ÇAR ROMANAN

Di her çar romanên ku em li ser karakterê wan ên jin sekinin ka romannivîs van karakterên jin çawa ava kiriye? Ev jinên di van romanên de derketine pêş

^{*} Bezmgeh, çiyê ku bi şev lê tê vexwarin. Çiyê şahiyê

xwediyê kîjan taybetmendiya ne û di romanên de çawa hatine pêşkêşkirin, gelo zihniyeta nivîskarên mêr bi çî awayî sîrayetî van lehengên jin bûye û teşe daye wan? Me ev yek di beşa analîza karakterê jin de kir. Bi vê yekê ve girêdayî, hin mijarên bingehîn ku him li ser karakterên jin û him jî di tevî û vegotina romanên de cîyekî girîng digirin hene û ev mijar bi serê xwe hêjayî tehlîlê ne. Ev mijar bi nêrîna civaka bavîksalar û rolên wê yê zayendî ve girêdayîne. Em ê di vê sernavê de li ser mijarên, keçîni, namûs, bavîksalari, jin wekî objeyekê, zayendîti û desthilatariyê û mijara enestê, bisekinin û mijarên ku derketine pêş li gor rexneya femînîst binirxînin.

3.5.1. Keçanî (Bekaret)

Bi sed salan e ku bekaret, wekî rêgezeke sazker a civakan erk girtiye ser xwe û li ser jinan û jiyana jinan bandora xwe daniye. Ji bo jinan tiştêkî wisa heyatiye ku; ew di nav nîrxên civakî û çarçoveya dînî de hatiye nîrxandin û bûye sedemê kûştin, piçûkxistin û riswabûna gelek jinên ku ev rêgez bin pê kirine. Malbatên van jinên ku êdî ne xwedî keçaniyê bûn, ev jin li xwe heram dikirin, an ew jin ceze dikirin. Di nav piraniya civakan de keçanî, cîyekî girîng girtiye û wateyeke razber li xwe kiriye (wate lê hatiye kirin). Ku ev wateya razber bûye tîrsa jinan a li ser bedena wan. Bekaret, di heman wextê de “mê” ye. Ev ji bo bedena mêr tu car nehatiye bikaranîn. Ji bo wan bakir an ji ezep hatiye gotin. Heta Dêra katolîk, durbûna ji têkiliya cinsî ne wekî “bekaret” lê wekî “ezeptî” bi nav kiriye. Tu carî bekaret ji bo mêran nebûye mîna nîrxekî, sedemê nezewicandina wan an jî sedemê jiyana wan. Wekî encam ji berê heta niha kesên bakîre ji jinan pêk hatine (Blank, 2007: 55). Di civaka kurdan de keçanî, mijareke girîng e. Mijareke sergirtî ye, zedê li ser nayê xebirdan lê belê li ser jiyana jinan bandoreke mezin dike. Vê yekê xwe di romana de jî daye xuyakirin. Di romana Meryemayê de, Meryema piştî destdirêjiya Kabîrayî rewşa wendekirina keçaniyê, ji bo xwe wiha vedibêje:

“ Kabîrayî ez ne bêperdeya keçîniyê hêlam, belê tu tiştê ciwan di cihana min de xewn, mereq, nav dîrok, reftar û ramanên civaka min, hemû bi carekê şikandin” Silêvanî, h.b.:38).

Wendakirina perdeya keçaniyê ji bo Meryemayê wendakirina xewn xeyal ramanên wê ne. Jineke ku di civakê de dema ku êdî ne xwedî perdeya keçaniyê ye,

ew wekî miriyan e. Meryema jî xwe wisa dibîne, ji hemû hêviyên jiyanê mehrûm hatiye hiştin. Meryema ji aliyekî bandora vê yekê ya li ser xwe vedibêje û ji aliyekî ve jî civaka xwe û feraseta civaka bavixsalariyê rexne dike ku çawa jin bi perdeyekê ve heye:

“Ez bûnewereke mê me, barê min giran e, çunkî hemû bi carekê ber bi nêrbûnê ve diçin... Û perdeya keçîniyê bûye pîvan bû mêbûnê, bûye şert û merc bo keçîni û dehmenpakîyê. Belê heke her kunikeke ji laşe keçîkê perdeyek pê ve hebûya, tu bibêjî li seranserê vî welatî keçîkek saxlem mabûya? (Silêvanî, h.b.: 41)

Nivîskar ji devê karaktera xwe Meryemayê rexneyê li civaka xwe dike ku jin bi perdeya keçîniyê ve heye, dema ku bi awayekî wê wenda dike êdî ew jî tune ye û her tişt ji bo wê dibe dojeh. Di civakên bavixsalar de jin, bi bedana xwe û bi endamên (organên) bedena xwe ve heye. Di çavê civakê de nebûna perdeya keçîniyê ji bo jinê kêmasiyeke mezin e. Herweha Meryemayê êrîş û hişmendiya wan li ser perdeya keçîniyê, nêzîkbûna mêran wekî gefekê li ser jinan dibîne. Meryema dîsa wiha dibêje:

“Lê ez li qewmên zilaman digirim, ji ber ku namûsê bi tenê bi perdeyekê ve girê didin û ew bi xwe wê diteqînin” (Silêvanî h.b.: 41).

Perdeya keçîniyê saftî û paqîjîya jinan e. Kesa ku vê yekê wenda kiriye ew lewitî ye, ne paqîj û kêr e; nikare bizewice. Carna jî sebebê kuştinê ye, ji ber ku bi namûsê ve girêdaye. Em dibînin ku wendakirina perdeya keçîniyê, di derûniya Meryemayê de, û êşên bîzar vekiriye. Bi destdirêjiya li ser Meryemayê re hemû jiyana wê guheriye. Ew roj bi roj ji xwe û ji civakê, dûr ketiye.

Lê belê tiştê ku li vir wekî pîrs xwe li me dipêçe, derûnîxirabiya Meryemayê divê ji ber destavêtina bedena wê ya bi kotek bûya. Di temenekî piçûk de rastî tecawizekê hatiye. Ku ev yek dikare di derûniya mirovan de şopa êş û azarên giran bihêle. Lê belê em di gazinên Meryemayê de dibînin, wendakirina herî xirab keçîniya wê ye. Nexwedîbûna perdeya keçîniyê, Meryemayê ji civakê dûr xistiye. Kes naxwaze pê re hevaltiyê bike. “Belê li civakeke îslamî Rojhelatî û kevneperest, ku hêj li gorî yasayên miriyan dijî, kî razî ye, an kî diwêre hevaliya keçîkeke ji keçîniyê hatî xistin bike?” (Silêvanî, h.b.: 84).

Bandora wendakirina keçaniya Meryamayê ew ji civakê dûr xistiye. Ew xwe di nav tenêtîyekê de his dike. vê yekê birînên kur di derûniya wê de vekirine. Di hemû kevalên xwe de vê derûniyê resm kiriye. Di hemû kevalên wê derz û perde hene. “derz li her dere hene. Marên kor li her dere hene. Û kevalên min ji derz û maran pirr in, belê hê jî kes li ser ranewestiyaye” (h.b.:41).

Di romana Dara Pelweşiyayî de, dema ku Perwîn û Şêzad bi hev şa dibin: “bi gihiştina ciyê herî nixwimandi, ricfekê bi her duyan girt vê yekê nehişt ew sînorê qedexekirî derbas bikin (Nazê, 2010: 28)

Bavê Nazê di vegotina têkiliya Perwîn û Şêzad de, nêrîna civaka bavixsalar û mêrserwer ya li ser jinê, bi awayekî eşkere dide xuyakirin. Civakên ku kevneşopîya bavixsaliyê lê xurt dimeşe, ciyê jinê, tiştê ku jin dikare bike û ên ku nikare bike, ji aliyê vê nêrîna serdest ve tê diyarkirin. “Sînorên qedexekirî” ku nivîskar behs dike bi perdeya keçaniyê ve girêdaye. Ji bo jinekê nebûna perdeya keçaniyê, nepakî û kêmasiyeke mezin e. Ev ek ciyê riswabûna jinê ye, di nav civakê de herweha carina ciyê kuştinê ye. Lê belê ev pîr û pakiya bekaretê, ji bo mêran ne derbasdar e, berevajî vê yekê ew ciyê mêranî û şanaziye ye.

Piştî ku Şêzad ji ba Perwînê vedigere. Bi hevalê xwe Elî re li ser hevdîtina xwe û Perwînê xeber dide, diyaloga di navbera Şêzad û Elî de:

“Şêzad, pê ve hat ew himbêz kir û got:

- Xwedo! Ma ji hezkirinê xewştir heye?
- Hela min berde... Ez ditirsim. Tu min pê şaş bikî...
- Şêzad keniya, hevalê xwe berda û got:
- Ew ma ya min... erê heya mirinê...
- Çima te ew xera kir” (Nazê, h.b.: 32).

Nivîskar vê yekê di nav qalibê zimanê civakê de aniye ziman. Hemî zagonên civakê li ser vê feraseta bavixsalar, ava dibe. Di bersiva Elî de “çima te ew xera kir” balê dikişîne ser mesela perdeya keçaniyê. Wateya ku ji peyva xerakirinê tê famkirin, dîsa keçaniye. Ger ku perdeya keçaniyê ji holê rabûbe, êdî Perwînê hatiye xerakirin. Peyva xerakirin di xwe de wateya herimandinê û piçukxistinê, dihewîne. Di civakê dema ku jin bekareta xwe beriya zewacê wenda kiribe ew wekî ku hatiye xerakirin tê

bi nav kirin. Ew êdî ji xeynê kesê ku bûye sebebê wendakirina keçaniya wê nikare bi yekî din re bizewîce. Nivîskar nêrîna li ser bekâretê wiha vedibêje:

“ Seyr e, heger xort, xortaniya xwe li paş bihêle û derbasî zilamtiyê bibe, hertim ev yek jê re dibe ciyê şanaziyê. Lê ku keç, ji keçaniya xwe dikeve. Di hâlete xirab de, jê re dibe rûreşî û di hâlete qenc de jî, dibe dara şikestî” (h.b.:90)

Nêrîna serdest a civaka bavixsalar, çawa ku jintî û mêritiyê bi kategoriyên çandî û çêker ji hev veqetandiye, wateyan bi qîma dile xwe li zayendiya wan jî bar kiriye. Van wateyan wekî ku srûştî bin bi aliyê wan ê biyolojîk ve bi mane kiriye. Di hevokên jor de vebêjêr piştî bihevşabûna Şêrzad û Perwînê nêrîna li ser zayendî û bekareta jin û mêran vedibêje. Heman tişt ji bo her dû zayenda çawa berevajî ye. Zayendek pê serbilind û yek jî pê stuxwar e. Herweha meriv dikare bibêje, nivîskar bi vê vegotinê balê kişandiye ser vê dîtina civakê ya newekhev.

Ev mijar di roman Sobarto de jî derbas dibe. Lê belê di Sobartoyê de Nêrîna li vir ya li ser keçaniyê, berevajî nêrîna romanên din ên mijara me ye. Gava ku Sîlva û Silêman bi hev şa dibin, Sîlva dixwaze ji keçaniya xwe xelas bibe. Wê ji bo xwe wekî astengekê dibîne. Piştî bihevşabûna Silêman û Sîlvayê Silêman wiha dibêje:

“Lîlandina wê ez şiyar kirim. Sîlva dilîland, li çepikan dixist û xalên xwîna ku li ser spîbûna çarşefê belav bûbû dinêrî. Min digot, qey mîna filmên erebî, piştî em xelas bikin wê bigirî û porê xwe bikişîne. Lê Sîlva bi kêf bû û liçepikan dixist:

- Ez dixwazim vê çarşefê diyarî bidim bavê xwe” (Yûsif, h.b.: 141).

Em dikarin nêrîna li ser mijara keçîniyê di vir de bibînin. Berteka Sîlva ya li hember bekâretê, wekî bertekeke li dij nêrîna civakê ya li ser vê mijarê ye. Lîlandina Sîlva him wekî protestoyekê him jî wekî serkeftinekê ye. Ji ber ku keçîni jî bo jinê wesfeke giran e, bi lîlandina xwe xelasîya xwe ji vê beyan dike. Sîlva her weha bi qerfî nêzîkî mijarê dibe. Piştî lîlandina xwe Sîlva ji Silêman re dibêje: “Divê kêfa te bê, ma ne tu mêr î...Mêr!” (Yûsif, h.b.: 141). Vê hevoka Sîlva de mirov dikare wekî îroniyekê jî bixwîne. Di civakên bavixsalar de, mêranî bi awayekî bi desthilatdariya zayendî ve jî girêdayî ye; bi destxistina bekaretê ji bo mêran wekî serkeftinekê ye. Şibandina Silêman ya Filmên Erîbî û tevgera Sîlva jî wekî Şibandina jinên civaka misilman û filehan dike. Civakên misilman li ser vê mijarê hin tundtir in. Jina ku di filmê erebî de porê xwe dikişîne nîşaneyê vê yekê ye.

Di Sobartoyê de gava ku em li axaftinên Belqîsê dinihêrin, dema ku ji Silêman re behsa evîna xwe dike, em rastî nêrina kevneşop ya li ser keçaniyê tên: “Min dixwest her tiştî bidim te Silêman. Ji te tenê re xwe tazî bikim û bi qîzanî xwe bidim te” (Yûsiv, h.b.:169). Tiştê li vir Belqîs tîne ziman, fikra ku divê jin keçaniya xwe biparêze, ji kesê ku pê re dizewîce an hez dike.

3.5.2. Namûs

Di çanda baviksalar de mêr, bav, xwediyê mal, milk, zarok û jinan e; ew li ser wan xwedî gotin e (Millet, h.b.: 107). Di çanda baviksalar de ên ku li ser jin û bedena wê xwedî gotin e, mêr e. Jin di bin stariya bav, bira û mêrê wê de tê dîtîn û biryarên li ser jiyana wê, ew didin. Bi awayekî parasvaniya jinê û bedena wê dikin. Jin di nav çanda baviksalar de her wekî ku tenê ji bedena xwe pêk were xuya dibe. Ji aliyê zayendîtî ve jî di bin kontrola mêran de ne.* Jin encax biryarên li ser zayendîtî û bedena xwe, di nav pîvanên ku jê re hatiye dayin de dikare bide. Bi vî awayî jî mêr xwe xwediyê jinê dihesîbîne. Têgeha namûsê jî piranî bi bedena jinê ve hatiye girêdan. Nêrina civakê ya li ser namûsê bi awayekî xwe di romanên de jî dide xuyakirin. Di romana Sobartoyê de xweha Şêro şeş zarokên xwe li mal hiştiye û bi xortê cîranê xwe re reviyaye. Şêro divê heyfa namûsa xwe bistîne û xweha xwe bikuje.

“Şêro daket meydanê. Li ber xelqê demança xwe kişand û soz da ku xwiha xwe wê li gor daxwaza xelqê bikuje. Xwiha wî şeş zarok li malê hiştin û bi xortê cîranê xwe re reviya. Berî ku mêrê wê ji kar vegere, nûçe belav bû ji ber ku zavayê wî bênamûs e, li gor gotina wî, ev demança kirî da ku şerefa xwe bi xwîne bişo” (Yusiv, 2014 :63).

Şêro bi reva xweha xwe, di nav civakê de bêşeref û bênamûs bûye û divê vê yekê bi kuştina wê safî bike. Şêro xweha xwe li gor daxwaza xelqê kûştiye. Li vir em dibînin ku kuştina xweha wî di bin zextên civakê de qewimiye. Ji ber ku jineke ku bi vî awayî tevbigere li gor civakê divê bê kuştin. Ev yeka ku jinê kiriye ji bav û bira û mêrê wê rûreşiyêke mezin e. Di nav civakê de buyerên wiha carna bi kuştinê bi dawî dibin. Gelek caran bûyer ne bi vî awayî ne jî. Jineke nezewicandî jî gava ku malbatê

* Ev mijar, mijareke ku bêtir femînîstên radîkal li ser hûr dibûn û me di beşa teroriyê de ev yek bi berfirehî daye.

destûra zewaca wê nedaye, ew bi hezkiriyê xwe re reviya be, ew jin jî di bin heman pêkutiyê de dikare bimîne. An jî ew bê mehr bi mêrekî re ketibe tekilaya zayendî dîsa heman nêzîkbûn heye.

“ Pîştî kuştina xweha xwe Şêro ji polîsan re wiha dibêje:

“Ez bêguneh im Seydayê min! Ne ji xelqê bûya, min xwiha xwe nedikuşt, xelqê ew kuşt seydayê min! Eger min ew nekuştiba wê pismamê min ez û ew her du bikuştana”(Yûsiv,h.b.:65)

Şêro ne bi dilê xwe lê bi zexta civakê, xweha xwe kuştîye. Gava Şêro xweha xwe dike û xwe radestî polîsan dike, polîsek destê xwe li piştta wê dixê nav tê dide” Mêr an divê wek te bin an jî tune bin”(Yûsiv,h.b.: 65). Şêro piştî kuştina xweha xwe bavê xwe jî dike û wisa xwe radestî dadgehê dike. Şêro berdewam dike:

“Erê seydayê min, bavê min xweha min a mezin ji keçantî xist. Şeva yekemin mêrê wê ew vegerand ji me re. Bi zorê min zavê xwe da bawerkirin ku ez şahide wê roja reş im” (Yûsiv,h.b.: 64).

Ji aliyekê ve Şêro ji bo namusa malbatê li erdê nehêle, wekî ku dibêje bi zexta civakê xweha xwe dike. Ji aliyê din ve jî mexduriyeta xweha xwe ya di nav malbatê de tine ziman. Li vir li ser xweha wî ya mezin him destavêtinek û him jî têkiliyeke ensest derdikeve holê.

Mîna Sobartoyê di romana Dara Pelweşiyayî de jî ev mijar derbas dibe. Di romanê gundê Dukaniyê gundekî ku axayê wê yekî ceş e û gundî, bi hêzên Îraqî re tev digerin. Lê vê dema dawî gelek buyerên destavêtina jinan li vî gundî diqewimin. Destavêtin ji aliyê leşkerên Seddam ve tê kirin. Pêşmerge gava li ser van bûyeran nîqaş dikin, diyalogek wiha di navbera wan de derbas dibe:

“Bi bihistina, li ser rewşa gundê Dukaniyan, piraniya pêşmergeyan pê êşyan. Lê ji bo mam Silo êşek taybet bû-êşa destavêtina namusê bû. Wî cî ji xwe re nedidît û bi dengê bilind digot: “ Namûsa me li ber lingan çû...”

Dema yekî ji pêşmergeyan jê re got:

–Mam Silo, mane gund, gundê Fazilê ceş e?

Mam Silo, bi çavên nerazîbûnê lê nêrî û got:

-Keç û jinên kurd ên kê dibin bila bibin, ew namûsa me ne” (Nazê, h.b.:78)

Mam Silo bi nêrîneke civaka kevneşop tev digere. Dijderketin û êşa wî ya li hemberî destavêtina jinan ne mîna bertekeke li dij êrîşeke mirovane ye. Bi nêrîna jin namûsa mêran û netewa wan e tev digere. Li gor wî namûsa kurdan li ber lingan çûye. Mam Silo pêşmergeyekî ku temsîliyeta zîhniyeta civaka baviksalar û kevneşop dike. Di nav şoreşa neteweyî de, ev zihniyet li dar e. Em dibînin ku li hemberî wî Remzî Xoce heye. Remzî Xoce pêşmergeyekî pêşverû ye. Li gor wî divê jin jî di şoreşê de wekî kes ciyê xwe bigire. Ew û Mam Silo li ser mesela jinan û namûsê dikevin niqaşê. Li gor Remzî Xoce, serhildana bê beşdariya jinan, bawî û seqete. Di dîroka serhildanên neteweyên din de jin û mêr li kêleka hev mil di mil de şer dikin. Lê Mam Silo vê yekê wekî exlaqê partiyên çep dibîne, li gor wî mêr li wîr hatine xesandin. “Qey zilam qeliyane ku jin bên û şer bikin. Mam Silo, tenê jinê di nav ciyan de qebl dike” (Nazê,h.b.:100). Gava pêşmergeyek bi henek vê yekê dibêje, Mam Silo û Remzî Xoce li ser jinan û namûsê wiha berdewam dikin:

“Remzî Xoce çû ser mebesta xwe û got:

-Ma çê nabe, jin vê û wê bike?

- Tu çi dibêji seyda? ! Qey tu şuyî yî? Ew vê yekê dixwazin, loma jî namûs cem wan peyde nabe.

Mam Silo, – Remzî Xoce, îcar bi rijdî axivî...– Li gorî pîvanên te, mîletên dinyayê hemû bênamûs in... Tenê, em bi namûs in... Ew xwedî dewletin, em jî bindestin. Îcar kengê namûsa gelê bindest heye?

(...) Mam Silo xwe nexeyidîne! Heger namûs tenê di jinê de be, vêga ji nav mîletên dinyayê, mîletê kurd ê herî bi namûs e. Lê ku namûsa mirov welatê wî be, îcar gelê kurd, gelê herî bênamûs e (Nazê, h.b.:101).

Mam Silo temsîliyeta civaka baviksalar dike. Jin ji bo wî objeyek zayendî bêtir ne tiştêkî din e. Ew aîdî mêr û neteweya wî ye. Dema jin karekî ne li rê bike, an jî li hemberê wê tevgereke xerab (ku tevger ji miletekî din hatibe ji ber ku namûsa gelê xwe ye jî) bêkîrin, ew him rûreşiya mêr e û him jî ya gelê wî ye. Her weha Mam Silo rolên zayenda civakî bi awayekî tund diparêze. Jin ji bo nav ciyan in. Ê qey mêr qeliyane ku jin karê ku mêr dike rabe bike. Bila ew li mala xwe rûnê û çî jê tê xwestin wê bike. Li hemberî wî nêrinên Remzî Xoce, ne di qalibên civaka baviksalar

de ne. Ew balê dikişîne têgeha namûsê ku tenê bi jinê ve tê girêdan. Nirxên ku li namûsê hatine barkirin, bi jinê û zayendiya wê ve girêdayine. Namûs, bi têkiliyên jinan ê zayendîtî ve girêdayiye. Lê Remzî Xoce dibêje ku divê namûs ne bi jinê ve lê bi welat û neteweyê ve bê girêdan. Dema gel bindest û bêwelat be hingê bênamûs dibe û nirxên xwe wenda dike. Nîqasha li ser jinê, ya di navbera Mam Silo û Remzî Xoce de, wekî nîqasha di navbera kevneşopî û modernîzmê an jî nîqasha fikra partiyên çep û civaka kevneşop jî dikare bê şîrovekirin.

3.5.3. Jin Wekî Objeyekê

Xaleke ku rexneya femînîst ya berê wê li nivîskar, bala xwe didayê û rexne dikir ew bû ku; nivîskarên mêr, karakterên xwe yê jin wekî objeyeke cinsî diafirînin. Jinên ku di romanên nivîskarên mêr de derdikevin pêş, bêtir bi beden û zayendiya xwe ve xuya dibin. Ev yek jî bi nêrîna nivîskar ya civaka bavixsalar ve girêdayî ye. Nivîskar bi vê zihniyetê karakterên xwe yê jin ava dike (Millet,2011: 11-48).

Di romana Bavê Nazê, Dara Pelweşiyayî de, lehengên jin kêr in. Karaktereke ku derdikeve pêş jî Perwînê ye. Me di analîza karakterên jin de jî behsa Perwînê kir û me anî ziman ku Perwînê tenê bi taybetiyên xwe yê fizîkî û di nav têkiliyên cinsî de hatiye şayesandin. Ji xeynê vê em taybetiyeke Perwînê nabînin.

Gava ku nivîskar Perwînê dişayesîne wiha dibêje:

“Tevî ku meşa wê bi lez bû jî, her mêyîtiyek tê de hebû. Balêdana li kirasê şevê, lingên xwas û memikên bê sitiyan dilbijokiyek bi herkesi re çê dikir...(Nazê, 2010: 89)

Perwînê bi mêyîtiya xwe an jî bi sahnayên bihevşabûnê ku dişibin sahnayên pornografîyê, yê bi Şêrzad re tê şayesandin. Di romana Sobarto de jî dîsa karakterên jin bi vî awayî derdikevin pêş. Hemîda ku wekî xweha Bavê Emşa tê nasandin. Bavê Emşa bi wê re di nav têkiliyeke ensest de ye û ji aliyekî de jî wê pêşkêşî hevalên xwe dike. “Bavê Emşa kirasê wê hilda û çîçikên wê dan ber devlêkirinê. Ahîna Hemida dihat ku mirriyan şiyar bike” (Yusiv,2014: 61) Hemîda wekî jeneke nexweşik e. Bi vegotina Silêman ew wiha ye, tevê vê ew, yeke har û mêran jî har dike. Zayendiya xwe bi vî awayî bi kar tîne û ji vê yekê jî kêfxweş e. Silêman didomîne : “ (...) Li vegeê Bavê Emşa got ku ew dikare Hemîda bispêre yekî ji me. Nexasim got ku ew ji kefa devê wê dikeve aciz bûye û her yekî ji me çî da. Min berî hemûyan xwe avêt

meşdanê. (...) ji çîçîkên gilover min dest pê kir. Hemîda har bû. Ji maçan bêhtir dev li min dikir (h.b.:62) Silêman bi sahneyeke dirêj behsa harbûn û bihevşabûna Hemîda ya bi mêran re dike ku Hemîda çawa mêran bi awayekî cinsî têr, dike. Silêman gava ku behsa Hemîda ji Biro û Dîno re dike:

“ Min ji Dîno û Biro re Şîrove kir. Dîno germ bû û Biro bi sistî got:

–Na Dîno na yan ez yan tu.

–Bi dorê Biro bi dorê, Hemîda Têra me tevan dike (h.b.:62)

Hemîda wekî jineke ku bi mêyîtîya xwe mêran ji rê derdixe xuya dibe. Û wekî alaveke cinsî di romanê de cî digire. Vegotinên Silêmanê serlehengê romanê ji bo Belqîs û jinên din, her li ser beden û zayendiya wan e. Dema ku êş û tîrsa wendakirina Belqîsê hîs dike, tiştê ku wî diêşîne bê çawa dê gewdeyê Belqîsê bibe para yekî din. Ev fikir wî din dike:

“Hezkirin jî di eynî demê de gava ku yara min lingan ji mêrekî din re bilind dike, şil û ziwa di hundirê canê min de dişewitîne” (h.b.:132).

Ji bo Silêman jin tenê ji bedena xwe pêk tînin. Di gelek vegotin û diyalogan de ev yek derdike holê. Û em dibinin ku Belqîsê di dawîya romanê de di nav koxa Pîra Felek de tevî Pîra Felek, bi zayendîtiya xwe mêran ji rê derdixe û di nav xweşiyê de, ew digewizîne. Koxa Pîra Felek ku me berê jî behs kiribû, şibandina Sobartoyê (Kurdistan) ye. Ciyê ku her xerabî lê diqewîmin. Serê van xerabîyan jin in. Mexdûr jî mîr in. Vebêj ango Silêman hemû xerabî ketin û tîkçûnên ku li wir diqewîmin, bi zayendîtiya jinan û sembolîze dike. Belqîsê di Koxa Pîrê de peywîreke wiha girtiye ser xwe. Belqîsê xwediyê odeyeke fireh e, li koxê. Navê odeya wê odeya xweşiyê ye. Ode tenê ji mêrên giregir re vekirî ye. Û Belqîs bi zayendîtiya xwe ev mêrên ku derbasî odeya wê dibin têr dike (Yûsiv,h.b.:182). Dîsa gava ku Silêman şayesandina Pîrê û Koxa wê dike wiha dibêje:

“Pîra Felekê mîr derbas dikir şaxê xwe, ew tazî dikir, ew di nav pêlên xweşiyê de çend rojan dihişt û ji zora xweşiyê re qajîmî ji wan dihat. Piştî û bi derbeke tenê serî wî ji gewdeyê wî hildiqetand” (Yûsiv,h.b.:190).

Pîra Felekê ku temsîliyeta “felekê” dikir. Qedera ku ji wir xwe li mirovên Koxê (Sobartoyê) dipêça û ew di çerxa felekê de helaq dikir. Felek, li vir bi

zayendîtiya jinê hatiye simbolîze kirin. Jin bi zayendîtiya xwe kaniya hemû xirabiyên e ku mêr jê avê vedixwe û pê jehrî dibe. Ev nêrîna serdest xwe digihîne çîroka Hawa û Adem. Hawa çawa Adem ji rê derxistiye. Mistoyê Kop xwediyê xaniyê Silêman gava bi Silêman re li ser Belqîs û jina xwe dipeyive:

“ Pîrek tev de dan ber meqesê. Jina wî jî, Belqîs jî tevde Hewa ne û Hewa ji payedar û qehbik bû û ji bo Adem, sedema derbasbûna dojhê bû, li gor wî. Mêrê zîrek ew e, yê ku her li jenekê rast bê. Lê siwar bibe û biçê yekê din û bêhiş e, ew ê ku dibêje mêr dikare bi jinê. Ji bilî wan çend kêlîkên cinsî qezenc bike, piştî wê, li ser rûyê erdê tu nikarî ji dilsoziya tu jinê piştrast bibî” (Yûsiv, h.b.:177).

Nêrîna Mistoyê Qop, nêrîna civakên kevneşop ya li ser jinê ye: jin jêdera hemû xirabiyên e, ew bê ewle û xapînok e. Sedemê jirêderketina Adem, Hawa bû û ji Hawa bigire heta Belqîs û jina Misto hemû jin xerab in. A ku mêran ji rê derdixê jine. Divê bawerî bi wan neyê.

Di romana “Heft Wêney Rûtî jinî Cenabî Wezîr” de jî em dibînin ku Ebû ‘Ubeydeyî Xedam ji bo ku jina di xewna xwe de dîtiye(jina çav kesk, diran zirav û pormedûsayî) bibine, gelek jinên ku wekî karkerê sekse tî xebitandin, ji xwe re dike alav. Vebêjê romanê Ferhad ku rêberiya Ebu ‘ Ubeyde dike :

“ Ebû ‘Ubeydeyî Xedam li wan şevbuhêrkên clubên Moskov ku ez hemû caran li gel wî bûm, mêvan û wergerê wî bûm, berî ku em bigihên dawîya konsêrt û reqsên marmasiyên nîverûtên sûrî û ozbekî û moldovî wî piyala xwe ya ketîla li piyala şaraba min da û pirsî:

“ –Êê em îşev kîjanê bibin?

Maşeleh li wî be, wiha dizanim hemû şevên me ji bo wî bûbû adeteke ji rêzê, wî her şevê jinek ji xwe re dineqand û dibir...” (Pîrbal, h.b.: 51).

Ebû ‘Ubeydeyî Xedam li hemberî pereyan jinan hildibijêre û bi wan re partiyên seksê li dar dixê. Her jina ku pê re radizê ku naşibîne keçika ku di xewna xwe de dîtiye, vê carê berê xwe dide yeke din. Jin ji bo Ebû ‘Ûbeydeyî matayên cinsî ne. Wekî Sîmon e Beauvoir dibêje “ Bedena jinê tiştê ku tê kirin e”(Beauvoir, h.b.:17). Her weha Ebû ‘Ubeydeyî “ çawa bi sedan jin tenê ji bo sekse bi kar aniye”

(Pîrbal, h.b.:71). Ferhad jî bi Ebû ‘Ubeydeyî re tevî van partiyên seksê dibe. Berê jî têkiliya Ferhad bi jina Cenabî Wezir Kelsûmê re çêbûye. Ji bo Ferhad Kelsûm jineke xwedî laşekî ku bîna kahweyê jê difûriya, rût, şayik û wekî marmasiyan e. Her hefteyê carekê dixweze ji vî laşî têr bibe. Wî di wê demê de heft wêneyê Kelsûm ê rût kişandiye û li gel xwe veşartîye. Ku romanê jî jixwe navê xwe ji wîr girtiye. Cenabî wezîr jî ketiye pey wan wêneyên jina xwe yê rût ku ji Ferhad bistîne. Li vir em dijminiya Fehad li hember jinan jî dibînin. Gava bahsa tekilaya xwe ya cinsî bi Kelsûmê re dike : “Min bi wê re hest dikir ku tola xwe ya hezar salan ji cinsê jinan hiltînim”(Pîrbal, h.b: 44). Bi jinan re razan wekî serkeftin û xwedî hêzbûn e. Zayendîtî hêz e û têkiliya cinsî, ne parvekirineke wekhev e. Li vir Ferhad, xwe xwedî hêz û serfiraziyê dibîne. Lê ev yek ji bo Kelsûm ne haman tişt e.

3.5.4. Texeyûla Cî û Neteweyan Wekî Jinê Û Desthilatdariya Cinsî

Şibandina jinê mîna cî (mekan, ax, erdnigarî), hêmayeke ku gelek caran hatiye bikaranîn. Ax, welat wekî jinê ango bedana jinê hatiye texayulkirin. Hin deman ax wekî dayikê hatiye Sembolîzekirin ku di vê şibandinê de meriv dikare bibêje, afirandina zabûna jinê û hilberîna axê û pîroziya wê dişibe hev. Lê belê ji xeynî vê bêtir şibandin li ser bedena jinê û zayendîtîya wê ava bûye. Ev yek li ser nêrîna mêtîngeran tê dîtin. Mêtîngeran, welatên ku xwestine bidestbixînin û mêtîngerîya xwe li ser saz bikin, wekî bedena jinekê xeyalkirine. Cî û welatên biyanî wekî jineke bakîre ye. “Ciyên biyani, mîna keçeke saf û bakîre, li hêviya xerakirina keçantiya xwe, hatine pêşkêşkirin. Ev motîf ewilî di pêwenda keşf û mêtîngerkirina “Dinyaya Nû”^{*} de hatiye bikaranîn. Ser meselê hevoka navdar a Sir Walter Raleigh, ya bi mecaz: “Guîana hin welatekî ku keçantiya xwe diparêze, qet nehatiye talankirin û hê destnehatiye dayîn.” Thomas Morton ji bo herêma Emerikayê, New Englandê (Îngilistana nû), hê nehatibû dagirkirin, wiha digot: Wekî keçeke bakîre û xweşik, bi lez û bez / li ser doşeka gerdekê, bi hesreta gihiştinê (Schick, 2000: 97). Ciyê ku wê bê bidestxistin jineke bakîre ye û ev yek mahdê mêrên mêtînger vedike. Bi mecazên mêyitî ev yek tê nexişandin û li hêviya bidestxistina mêtîngeran e. “Ev hêmanên wisa, mêtîngeriyê di bin krasê zayendîtîyê de vedişart. Mêtîngehkar wekî mêr

^{*} Dinyaya Nû. ji parzemîna Emerikayê tê bikaranîn

(mêranî) û mêtîngeh wekî mêbûnê hatiye nigarkirin. Bi vî awayî ev yek di nav ahengekê de û wekî pêdivî hatiye dayin. Bi vê jî tahakûma Rojava hatiye rewakirin.(Schick, h.b.: 97).

Keşfa Emerîkayê ji bo Ewrûpiyan, wekî jineke bakîre ye û divê ew bê bidestxistin. Ev nêzîkbûna Ewrûpiyan tenê ne di keşfa emerîkayê de derketiye. Wan bi heman nêrînê berê xwe daye, welatên Efrîkî û Asyayî jî. Şerq pirî caran wekî jinê hatiye tesewirkirin. Lê belê ne tenê Şerq wekî jênê (mê) hatiye temsîlkirin. Carina bi awayekî eşkere Xiristiyani, wekî jineke narin û di bin xeteriya destavêtina mêrê Şerqî de hatiye nigar kirin. Em vê yekê di dema ku tirk Stenbolê feth dikin de jî dibinin. Bizansiyan Stenbolê dişiband jênê. Bi wendakirina Konsantînopolis re wan xwe, mîna ku jinên xwe wendakiribin hîs dikirin (Schick, h.b.: 93-95). Fikra şibandina bedena jinê û cî û waran, heta roja îro jî xuya dibe. Gelek caran neteweyek ji bo ku tola xwe ji neteweya din bistîne êrîşî jinên wan neteweyan kirine. Bi vê yekê jî xwestine heyfa xwe hilînin. Çawa ku nêrîna nêrane ya dewletên dagirker li ser jênê, bi vî awayî bûye, nêrîna gelen bindest jî bi heman awayî bûye, ji ber ku her du zihniyetan jî xwe ji zihniyeta bavixsalariyê dermale kirine. Jin ji bo wan jî heman tişt te.

Ev nêrîna bavixsalar ya li ser jinê, xwe bi rêya nivîskarên mêr, di metnên edebî de jî daye xuyakirin. Me vê yekê di romanên teza xwe de jî dît. Mînak di romana “Heft Wêney Rûtî jinî Cenabî Wezîr” de nivîskar vê nêzîkbûnê bi rêya karakterê romanê Ferhad daye der. Ferhad vebêjê romanê ye û kurd e. Gava bahsa Ebû ‘Ubeydyî û jinan dike :

“Ebû ‘Ûbeyde ji jinên kazakî, ozbekî tacikî, belarûsî û ukrani pê xweş; bi min jî tenê jinên ereb û keçikên tirk û jinebiyên faris...”(Pîrbal, h.b.: 22).

Ferhad di ciyekî din ê romanê de vê fikra xwe hîn eşkeretir dike: “ Min sond xwaribû, şîrê diya min li min ne helal be, ku ez ji xeynî tirk û faris û bi taybetî jina ereb zinê li gel jinên qewmekî din bikim...” (Pîrbal, h.b.: 43).

Ferhad bi razana jinên ereb, tirk û faris re, wê tola xwe ji wan neteweyan hilde. Bindestî û çewisandina kurdan ji destê van miletan e. Welat û axa kurdan di bin nîrê wan de ye. Lê tiştê li vir balê dikişîne, nêrîna li jinê, bedena wê û nêrîna desthilatdariya li ser zayendîtî ye. Mêtîngeran, axa mêtînger di şibandin jinê, bi

destxistin wê serkeftin bû. di fikra nêrina baviksalar de, bi destxistina jina, bi taybetî bi têkiliya zayendî, hêz û serdestiyek e. Jin li vir tîştê pasif ve. Ferhad jî heyfa bindestiya welatê xwe, bi têkiliya cinsî ya bi jênên serdestên welatê xwe hiltîne. Heman fikir li vir jî xuya dibe. Têkiliya cinsî wekî hêz û desthilatdariyekê ye. “Min çêjeke yekcar xweş û bêpayan ji wan jinên ereb û tirkû faris distend, dema min dikaribû li wan wiha bikim ku, xiyenetê li mêrên xwe bikin û werin bin siya qeweta min. Ev yek, bûbû şewaza xebata min a netewî...” (Pîrbal, h.b.: 45). “Têkiliya cinsî, hêz û qewet e. Bi vê ew li ser jinan hikmê xwe dike û jinan biçûk dixîne, bi vî awayî neteweya wan jî biçûk dixine. Li gor Ferhad ev tolhildan e ku ji mêtîngeran hiltîne. Jin jî li vir objeya vê yekê ne. Di nav diyaloga Ferhad Ebû ‘Ubeydeyî de dîsa Ferhad li ser vê wiha dibêje :”hate ser zimanê min ku jê re bibêjim: Bîst û sê dewletên we hene, dixwazim ji her dewleteke we jinekê têxim bin toximê xwe” (Pîrbal, h.b.: 80).

Şibandina welat, axa welat û jinê di romana Meryemayê de jî tê dîtin. Meryema gava ku gazin û êşên xwe yê ji ber wendakirina keçaniya xwe tîne ziman, welat jî dişibîne jinê :

“Ev welat jî keçîniyê hatiye xistin, belê hê jî em şanaziyê pê dibin ku welatê me ye. Ma tu ferq di navbera welat û keçê de heye?” (Silêvanî, h.b.: 21).

Meryema di encama destavêtinekê de keçaniya xwe wendakiriyê. Û welat jî hê dagirkirî ye, dagirkeran welat ji keçaniyê xistiye. Li vir dîsa şibandina bedena jinê û axa welat li ser perdeya keçaniyê heye. Ku me di mijara keçaniyê de, wateya ku li keçaniyê tê barkirin rave kiribû. Belê bedena welat ji keçaniyê hatiye xistin, hatiye herimandin, biçûkxistin. Şanazî êdî pê nabe. Di binhişîna Meryemayê de, wateya ku baviksalarîyê li keçaniyê kiriye xwe dide rû. Nexwe ew çawa herimî be wîsa welat jî herimiye.

Em di romana Sobarto de jî heman şibandinê dibînin. Hovoyê di romanê de bi têkiliyên cinsî yên jirêderketî xuya dibe, bi ajal û alavan re jî dikeve nav têkilya cinsî. Bî bilya re ketiye têkilya cinsî, bilya hatiye qulkirin. Ev beş bi vegotîneke qerfî tê vegotin û paşê jî bo Sobarto wiha tê gotin: “sed ax û ax ji derde te ey welatê bilya! Welatê ku ji her alî de qulkiriyê” (Yusiv, h.b.: 56). Li vir jî dîsa şibandina bedena jinê û welat heye û ev şibandin li ser perdeya keçaniyê dîsa tê kirin. Em dîsa heman nêrîne li ser meseleya keçaniyê dibînin. Welat ji keçaniyê hatiye xistin, êdî

welatekî ji her aliya de tîkçûya heye. Di van şibandina de em dibînin, mijar bedena jinê û bidestxistina wê ye. Ev yek jî bi desthiltdariya zayendîtiyê pêk tê. Bidestxistina ax û welat jî bi heman tiştê pêk tê.

Zayendîtiyê, û tîkçûya cînsî wekî biwareke hêz û desthiltdariyê an jî mîraniyê tê dîtin. Di fikra bavixsaliyê jinê pasîf e, mîr hêz û qeweta xwe li ser bikartîne. Ev fikir di nav civaka bavixsalar de jî berbelav e. Mîr gava çalakiya cînsî pêk tîne dibe “mîr” û xwedî hêz. Di Sobarto de, Hovoyê ku bi ajalan re dikeve tîkçûya cînsî, gava ku diçe axurê bi çêlekekê re dikeve tîkçûyê, wiha dibêje: min di dile xwe de got çêlek jî mîna pîrekan, ji bîlî wê meseleyê tiştê wan razî nake” (Yûsiv, h.b.: 145-146). Di wê navberê de diya wî tê û ew dibîne. Diya wî bi vî rewşê şa dibe û dilîlîne û gazî hevserê xwe dike:

“Hecî!!..Hecî.. Sedîqo bû zîlam!.. lawê me bû zîlam!..” (Yûsiv, h.b.: 146).

Sîlêman, çîroka Hovo bi tinazî ji Sîlva re dibêje. Hovo zilambûna (mîraniya) xwe bi çalakiya cînsî dipeyitîne. Di Dara Pelweşiyayî de, Şêzad çûye gundê Dukaniyê li wîr ew û Perwînê bi hev şabûne. Şêzad bi awayekî ji xwe bawer vegehiyaye. Nivîskar li ser bihevşabûna Şêzad û Perwînê wiha dibêje:

“Perwîn û mayîna wan bihev re? Ev jî hemî tiştê cuda ye... Ew jî serkeftina di cengê de, mezintir e... Ew taybetiya taybetiyên e...” (Nazê, h.b.: 92).

Di vir de tîkçûya cînsî ya Şêzad bi Perwînê re wekî hêzekê tê dîtin. Ev hêzeke ku ji hemû serkeftinên di cengan de, bi hêztir e. Li vir bala me dîsa diçe ser tîkçûya desthiltdarî û zayendîtiyê. Nêrîna li vir derdikeve holê; tîkçûya cînsî bidestxistin e. ev yek bi zîmanekî nêrane hatiye rave kirin. Şêzad li benda Perwînê ye “xwesteka stendina Perwînê dihişt cî ji xwe re nebîne” (Nazê, h.b.: 109). Perwînê gava behsa şeva xwe ya bûkaniyê ji Şêzad re dike, dîsa ev nêrîna derdikeve pêşiya me “ Tu dizanî, di şeva bûkaniyê de, min nikaribû xwe bida, heya ku min di hişê xwe de, tu nexist şûna mîrê xwe...(...) Ez sist bûm û wî ez stendim” (Nazê, h.b.: 112)

3.5.5. Bavixsalarî û Rolên Zayendî

Beriya tevgera jinê, him jî aliya civaknasên marksîst û him jî aliya civaknasên berbiçav ve, bavixsalarî, wekî tîkçûyên di navbera mîran de sazûyî, dihat pejirandin (Şahîn, 2009: 295). Millet jî ji bo bavixsaliyê digot ku; di pergala

baviksalar de, nîvê nifusa jinê, ji aliyê nivê nifusa mêr ve tê birêvebirin (Millet, h.b.: 47). Di baviksalarîyê de mêr, di hemû hêlên jiyânê de xwedî maf û gotinê ye. Di têkiliyên navmalbatî de mêr li ser zarok, jin û hemû tiştî xwedî gotin e. di civaka kurd de jî mêr mezin û stûna malê ye. ji aliyekî ve jî parazvanê mal û jinê ye. Keç û jinên gava bav û mêrên xwe winda dikin, xwe wekî bêkes û bêxwedî dibînîn. Ev taybetiyên civaka baviksalarîyê xwe di nav romana de jî didin xuyakirin. Gava diya Meryema (romana Meryema), dimire û bavê wê bi Mencilê re dizewîce, Meryema xwe wekî bêkes û bêxwedî dibîne. Ji Narînê re wiha dibêje:

“ – Kê gotiye ez dikarim? Ma te ji bîr kir ka ez kî me? Ez keçeke sêwî me. Ez nikarim lê bavê min dikare min biparêze, bila tu jinan neyne, soz û qerar be ku ez ê şû (zewac) nekim, bi tenê xizmeta wî bikim” (Silêvanî, h.b.: 26).

Meryema, bêyî parasvaniya bavê xwe, xwe bêstar û bi tenê his dike. Bav ji bo wê hêz û qewet e. Gazinên Meryema tenê ne ji ber tîrsa wendakirina bêvê wê ye. Meryema kolincên jinê yên di nav civaka baviksalar de jî dikîşîne.

“Min ji nîva dilê xwe hez dikir ez li gundekî ji gundên deştê jiyânê bibim serî (...) Belê niha ew hêz jî nemaye, ji ber ku li kê derê be wek bûnewereke mê, lawaz û biyanî, civak serederiyê bi min re dike bi taybetî rêgezên ne mê” Silêvanî, h.b.: 65).

Rêgezên civaka baviksalar nêr in. Nivîskar ji devê Meryemayê dixwaze bêje ku di nav van rêgezên civakê ên nêr de, jin lawaz û jar dimîne. Meryemayê (Nivîskar) bi vê vegotinê dilê xwe bi xwe û jinbûne dişewitîne. Meryema gazinan li civaka xwe dike. Kî ewqas rê li ber ên wekî Kabîra (ê ku destavêtibû Meryemayê) vekirîbû û rê li ber wê girtibû? Civak bi xwe bû ên ku Kabîra afirandibû û rê li ber wê girtibû (Silêvanî, h.b.:40) Meryema didomîne :“Trajediya min û her keçeke an jineke din li vî welatî bi xwendina helbest û felsefeye bi dawî nayê (...) em hemû bê çar in ji ber ku hê jî me nekariye asta trajediya xwe nas bikin” (Silêvanî, h.b.: 62). Silêvanî bi vegotina Meyremayê xwestiye balê bikişîne ser rewşa jinê, ya di nav pergala baviksalarîyê de. Jin di nav baviksalarîyê lawaz e, wekî qurban e, hemû mekanizmayên hêzê di bin kontrola mêr de ne. Ev yek ji bo jinê wekî trajediyekê ye, lê jin hay ji vê trajediya xwe tune ye.

Bandora baviksalarîyê di nav malbateke mêrserwer de, li ser karaktera Şeymayê jî xuya dibe. Şeyma di nav malbateke dindar û mêrserwer deye. Ew bi serê

xwe nikare tev bigere. Gava Narînê pîrsa Şeymayê ji Meryema dike : “ Ji mêj ve ye min ew nedîtîye. Dibe ku li Dihokê be û dibe jî na. Ez nizanim esehî, dûr nîne ku şû kiribe, a naxwe bawer nakim tu karan bike, çunkî keça yekane ye û bi hukmê jiyana aristokrat, zû bi zû malbat rêkê nade ew hevaltîyê bi her kesî re bike” (Silêvanî, h.b.: 95).

Di “Dara Pelweşiyayî” de gava ku birayê Şêzad Ehmed tê girtin, Şêzad hingê li bajêr dixwine û biryar dide ku dev ji xwendinê berde. Gava xatir ji hevalê xwe dixwaze:

“ – Ez diçim nema vedigerim. Tu dostê mîn î û ez ji te venaşêrim, bi girtina birayê min deriyê risqê me hate girtin. Dê û sê xwişkên min li malê ne. Gerek ez bi wan ve herim... piştî mirina bavê min û girtina Ehmed zilamê malê, tenê ez mame û divê ez vegerim” (Nazê, h.b.: 33).

Bêçareyiya jinê ya di nav civakê de xuya dibe. Gava ku mal bê zilam dimîne, jin û zarokên malê bê parastin, dimînîn. Li vir Şêzad divê peywira bav û birayê xwe bigire ser xwe. Di romana “Dara Pelweşiyayî” de zagonên civaka bavixsalar xwe didin rû. Nivîskar şayesandina Perwînê dike ew jineke delal e û pismamên wî di riya wê de ne. “bi xwe ji ber vê spehîbûna Perwînê Pismamê wî gotibû: “ Heger malbat qir jî bibe, ez ê nehêlim ku ew bigihê xerîban” (Nazê, h.b.: 30). Perwînê li vir li ser jiyana û zewaca ne xwedî gotin e. Ew, li gor regezên civakê di destê bav û bira û paşê pismamê xwe de ye. Biryara Zewaca wê encax ew dikarin bidin. Perwînê bi çavên mişt hêsir vegerand: “nêzîk wê min bidin kurê amê min” (Nazê,h.b.:45). Bi vê yekê Perwînê bêçareyiya xwe û jinên civakê tîne ziman. Di nav civaka de biryara zewaca jinê ji aliyê malbatê (bav,bira) ve tê dayin. Helbet bi pêşketina civakê re ev hinekî guherîbe jî; bi awayekî hîn jî ev yek didome. Di pêwenda zewacê de, jin wekî alavekî jî tê dîtin ku ji bo dana wê qelen tê xwestin. Di “Sobarto” de gava Sabîro Zenûbya ji dê bavê dixwaze vebêj vê yekê wiha bi me radigihîne:

“Gava Sabîro li deştê, Zenûbya ji dê û bavê wê dixwest, Mamoste qelenê Qîza xwe bilind kir, ji bo Sabîro bi paş de vegere, lê Sabîro pejirand û dawet li dar ket”. (Yûsiv, h.b.: 99)

Piştî Sabîro qelenê zêde dipejrîne. Mamoste Merwan û Xanimê, dê û bavê, Zenûbûya û Belqîsê ne bi dilekî xweş be jî destûra zewaca wan didin. Lê nayên daweta wan. Belqîsê li ser vê yekê ji hevala xwe re wiha dibêje:

“ Belqîs di bin vê bandorê de digot:

–Tu carî bê erêkirina dê û bavê xwe tu mêran neke (Yusif, h.b.: 100).

Xanimê û Mamoste Merwan kesên xwende û di nav partiyeke çep de cî digirin lê ew dîsa bi qaîdeyên civaka bavixsalar tev digerin. Belqîs jî bêdile xwe bi Savar re tê zewicandin. Savar yekî dewlemend e û bi emrê xwe ji Belqîsayê gelek mezintir e. Savar bê hêza pereyan bi Belqîsê re dizewice. Li ser vê biryara zewacê em tişteki zêde ji Belqîsayê nabihîsîn. Belqîs razîbuyî xuya dibe. Ew û diya xwe derketine stendina rihela wê. Gava ku vebêj li ser dewlemendî û temenê zava xeberdide, zava bi zora pereyan çawa ew qanî dîke, wiha dibêje:

“Pismamekî wê kete deve riya wê, zava sed hezar da pismam (...) Xalê wê (Belqîsê) qala mezinbûna temenê zava kir. Bi kêmanî bi bîst salan jê mezintir bû. Zava bêrika xalo jî germ kir û hişt ku ji kêfan zimanê xwe daqurtîne, razî bibe. Wî dê û bavê bûkê di nav xêrê de hiştin (Yusif, h.b.: 102).

Savaro, bi dewlemendiya xwe dê û bavê Belqîs razî dîke. Belqîs wekî kes ne xwedî tu gotinê ye. Razîkirina dê û bavê Belqîsê bi pereyan, qelenê Zenûbyayê; rewşa jinê, ya di nav civakê, ku wekî tişt tê dîtin, li ber çavê me radixîne. Herweha bêgotinî û bêdengiya jinê ya di nav malbat û civakê de jî li ber meye. Belqîs bi Savar re dizewice “Savar vejeriya karê xwe yê li Siudyê. Jina xwe li Sobartoyê hişt û çû. Bi xezûrê xwe re li hev kir da cilên dirêj û çariyekê lê bike û wê bişîne cem” (Yusif, h.b.: 109). Di nav civaka bavixsalar de, li ser jinê û bedena wê pêşî bavê wê dûre jî mêrê wê xwedî biryar e. Jin bi bedena xwe jî milkê mêr e him ji aliyê çandî ve him jî ji aliyê zayandî ve (Şahîn, h.b.: 343) Piştî bavê Belqîsê niha Savar biryara li ser Belqîsê dide.

Tayebetiyêke bavixsalarîyê jî ew e ku; jin û mêr, bi rolên zayandî, ji hev hatine veqetandin. Di rexneya femînîst de, zayendiya bîyolojîk û zayendiya civakî du têgehên ji hev cudane. Zayendya biyolojîk girêdayî taybetiyên anatomîk e, siruştîye. Lê zayenda civakê bingeha xwe ji civakê distîne. Zayenda civakî, jin û mêran bi

kategoriyeke çandî vediguhezîne (Saygiligîl, 2016: 10). Li gor zayenda civakî, tiştê ku wekî jin û mêrîti tê hesabandin, perçeyek ji çandê ye. Peyvên mêrîti û jinîti an ‘nêrîti û mêtî’ ne bi bîyolojiya kesan ve girêdayî ye, ew bi awayekî çandî hatiye saz kirin. Zayenda civakî wekî bermayiyên baviksalarîyê, di berhemana de jî ciyê xwe girtiye (Şahîn, h.b.: 143). Ger di romana de ger di çîrokana de, ev rolên zayendî bi awayekî derdikeve pêşberî me. Hejarê Pêşmerge û Meryema (Meryema), dil berdane hev. Hejar Meryema vedixwîne şevbihêrkekê li mala xwe, Meryema bi lez û bez dikeve nav haziriya şevbuherka xwe û Hejar, gelek cure xwarin û meze... Meryema wê şevê wiha vedibêje:

“Min ji dil dixwest şevbihêrkeke me panoramayî be... (...) bi meraqa kebanîyê, min mehfûra hevrişmî seranser erdê holê radimalî û mefhûrên Ecemî, yên bi dîwarê gêçê ve hilawîstî, dakutan. Piştî şîvxwarinê, min nêrgileya wî hazir kir û maseya darxweriskî bi hindek meze û vexwarinê xemîland (...) Wî nêrgîle kîşand û ez mîna cariyekê bendewarim ku bi amajeyekê, ji dest an çavên xwe fermanekê bide, da ku ez bîyî dudilî bi cî bînim” (Silêvanî, h.b.: 72-73).

Peywira jinê, ji aliyekî ve jî xizmeta mêr e. Hejarê Pêşmerge Meryema vexwendîye mala xwe, lê Meryema rolên civakî bi cî tîne û daw û delingê xwe ji bo haziriya şevê hildide. Xwarin, vexwarin û mezeyên Şevbuhêrkekê amade dike. Bi tevgerên Hejar Meryema xwe wek cariyê û Hejar jî wekî efendiye xwe dibîne. Ku li hêviya fermana wî ye. Piştî xwarin û vexwarinê Hejar û Meryema hinekî nêzîkî hev dibin. Di vê navberê de di ekranê hin dîmen derbas dibin. Meryema vê yekê wiha rave dike:

“ (...) û got îşev tu bûk î û ez zava me.” (...) Hejar bu gurgêk û xwe avête min, piştî ku dîmenên hindek keçikên gerîla yên çekdar di nava berfê û şikeftan de li ser akranê dîtin biçavê xezebê temaşe dikir û bi selîqeke tûj û axaftineke seyr şeva me- ya ku divê taybet be- têk da, wî got: “pere ji bo xerçkirinêye, neyar ji bo kuştinêye, û jin tenê ji bo ganê ye.” (h.b.: 73-74).

Di çavê Hejarê Pêşmerge de, jin bo xizmetdayinê ye, ew tenê ji bo nav nivîna ye ku xwestekên xweyî cinsî pê têr bike. Herweha jin wekî amûreke seksê ye li gor wî. Hejarê Pêşmerge, Pêşmergeyekî kevn e. Piştî şoreşê êdî ew li pey kêf û zewqa xwe ketiye. Li vir Hejar, nêrina civaka kevneşop ya li ser jinê temsîl dike. Jin, di nav

rolên zayenda civakî çawa asê maye, ev rol çawa lê hatine barkirin bi me dide nîşandan. Piştî vê diyalogê Meryema li ser vê nêzîkbûn û gotinên Hejar mala wî diterîkîne û jê derdikeve. Meriv dikare bibêje ku Meryema bi vê tevgera xwe, rolên civaka baviksalar ku li ser jinê ferz kiribû, red dike û berê xwe jê diguhirîne. Baweriya Meryemayê ji mêran dişike. Ew bi vê yekê xwe dilzîz û dilşikestî hîs dike û hêviyên ku ji bo Hejar di dilê xwe de xweyî kiribû, bi çûna xwe difetisîne.

3.5.6. Ensest

Ensest, wekî têkiliya cinsî ya di navbera xwişk û bira, dê û law an keç û bav de; û di navbera kesên ji heman binemalaleyan de tê zanîn. Têkiliyên ensest, carina bi riza dil û carna jî bi kotekî pêk tê. Meriv dikare bibêje ev têkilî di hemû civakan de, rû dide û wekî kiryareke qedexe tê pejirandin. Ensest, ji aliyê dînî ve jî wekî gunehkariyekê tê dîtin. Di mîtên afirînerî de jî pirî caran, zarokên xwedî hêzên derasyî, ji zewaca xwişk û birayan çêdibin. Têkiliya ensest ji bo ravekirina kokên mirovahiyê, ji baweriya mûsevî-xiristiyanan bigire di hemû çandan de mewcûd e. (Adem û Hewa, bi awayekî “xwişk û bira ne” û zarokên wan Habîl û Kabîl, bi xwehên xwe re dizewicin). Hewldana têgihiştina van baweriya û efsaneyan, divê ji merceka mîrateya navbandoriya xwişk û bira ya erotîkî û merceka çand û baweriyên Rojava de derbas bibe. Ku ev têkiliyên ensest yên di navbera xwişk û bira de, di malbat û civakê de, hestên bi saw û kaosê biafirine jî wekî biwareke bikêşan, cî digirt (Davidoff, neql, Elmas h.b.: 306). Ferud jî ensestê bi têgeha Oedîpûsê* reve dikir. Gunehekî Oedîpûsî, ensesta bi dê re, ê din jî qetla bav e. Saziya mirovayetyê ya yekemîn totemizmê, her du gunehan wekî du gunehên dilxelînî didît. (Elmas, h.b.: 306).

Di romana Sobarto de, têkiliyên meriv dikare wekî têkiliyên ensest bi nav bike, xuya dibin. Di romanê de yek ji van têkiliyan, têkiliya Bavê Emşa ya bi xweha wî Hemîda re ye. Bavê Emşa him Hamîda li hember pereyan difiroşe mîrên din û him jî ew bi wê re dikeve nav têkiliyê. “Bavê Emşa destê xwe ji Hemîda re bilind

* Li gor kompleksa Oedîpûsê, zarokên kurî ji bo diya xwe di nav hestên wekî hezkirin û arezûyê de ne. Ji ber vê yekê jî ditirsin ji aliyê bav ve bîcizakirin. Tirsê ji vî cezayî tirsê wendakirina penîsê, ango tirsê xesandinê ye. Cebecî O. (2014), *Psîkanaltîk Edebiyat Kuramî*, İstanbul, Îthakî yayinlari r.223

dike. Di quncikeke tarî de, Hemîda xwe avêt himbêza Bavê Emşa, hêdîka destê xwe da ber:

“Pêşî ka pera xweşika min! (...) Bavê Emşa krasê wê hilda û çîçikên wê dan ber devlêkirinê. Ahîna Hemîda dihat ku miriyan şiyar bike.” (Yûsif, h.b.: 61)

Hemîda di romanê de qet naaxive. Û nivîskar ji tu bertekên Hemîdayê venabêje, ji xeynî bertekên bedena wê. Ji aliyekî ve bedena Hemîda tê firotan ji aliyekî ve jî bi Bavê Emşa (birayê wê) re di nav vê têtikiliya ensetê tê şayesandîn lê belê di nav van têtikiliyan de, em di derheqê derûniya Hemîda de tu tîştêkî nabihîsîn. Bavê Emşa piştî demekê gava Hemîdayê ji bo welatekî din bi rê dike, Silêman vê yekê wiha vedibêje:” Bavê Emşa hat bîra min. Xwiha xwe gihand balafirgehê û bi du qiloçên dirêj vegebiya” (Yûsiv, h.b.: 109). Li vir qiloç wekî sembola qewadî û bênamûsiyê hatiye bikaranîn. Di nav vegotinên gel de ev şîbandin, ji bo kesên ku kiryarên wiha dikin, tê kirin. Nivîskar bi vegotineke bi vî rengî, nêrîna civakê ya li rewşên wiha, bi sembola qiloç rave dike.

Ji xeynî vê têtikiliya enset ya di navbera Bavê Emşa û Hemîda de, têtikiliyeke din a wekî enset di romanê de têtikiliya Reşo ya bi xatiya wî re ye. Xatiya Reşo şeva daweta xwe reviyabû, winda bûbû.. Reşo li ser vê yekê xemgîn û bêhteng ji Silêman re behsa çîroka xwe û xaltika xwe dike. Reşo û xatiya xwe di temenê hev de ne. Her du jî xama ne, Xaltiya Reşo ji gund bo xwendinê hatiye Sobarto û li mala Reşo dimîne. Ji ber ku mal teng e, her du li odeyekê dimînin. Reşo vê yekê ji Silêman re wiha dibêje:

“Hezkirineke veşartî di nav me de peyda bû. Her şev piştî ku tev de radiketin, dihat nav ciyê min û çîrokên nû ji min re digotin. Min jî serê xwe datanî ser zenda wê. Xaltika min xweşik e Silo! Û hem di temenê min de ye. Lawirên biçûk di hundirê min de liviyan. Min lêvên xwe danin ser lêvên wê, bêdeng ma. Ew jî bi porê min lîst û bi ser min de giriya. Ew şev bêdeng derbas bû û roja din xaltika min westiyayî ji dibistanê vegebiya. Çavên wê tijî poşmanî, gazin û evîn bûn” (Yûsif, h.b.:54).

Reşo vegotina xwe berdewam dike, piştî wê şevê rojeke din, ew û xaltika xwe li videoyeke pornoyî temaşe dikin û di vê navberê de, di navbera wan de jî têtikilîyek çêdibe. Têtikilya di navbera wan de bi kitekit di romanê de tê dayin. (wekî

sahneyeke pornojê ye) Di encama têtikiliyê de xaltîka wî pê dihese ku keçaniya xwe wenda kiriye. “gava sist bû, min got qey ji ser hiş çû, lê digiriya. Nû nas kir ku çi qewimî, lê mixabin girî perdeya qetiyayî pîne nake” (Yûsif, h.b.: 54).

Berevajî têtikiliya Hemîda û birayê wê, Reşo û Xaltika xwe di nav poşmaniyekê de ne. Vê yekê li ser derûniya her duyan jî bandoreke xerab hiştiye. Li vir dîsa bi awayekî bal tê ser meseleya keçaniyê. Xaltika Reşo bi windakirina keçaniya xwe ji vê rewşa xwe vecîniqiye û ketiye nav tirsekê. Reşo du re xaltika xwe dibe bijîk da ku perdeya keçaniya wê bi gotina nivîskar pîne bikin. Xaltîk li vir wenda dibe û bi ku ve diçe nayê zanîn (Yûsiv, h.b.: 55). Barê vê têtikiliya xedexe ji xaltika Reşo re giran tê, rewşa wê ruhî xerab e. “Min ew bir bijîşk, derman daye xaltîka min bûbû yeke din, xemgîn bû bêdeng bû:

–Xewska tu ne xaltîka min bûya, a niha em ê bizewicîna.

Bi xemgînî li min dinêrî. Du salan xaltika min di xwedina xwe de şikest. Dev ji xwendinê berda û vejeriya gund (Yûsiv, h.b.: 55)

Reşo rewş û derûniya xaltika xwe bi vî awayî dibêje. Ji ber vê têtikilya enestet jiyanî xaltîkê ser û bin bûye. Di Sobarto de têtikileyê enestet a din jî di navbera bavê Şêro û xwişkê wî de derbas dibe. Diya Şêro miriye û bavê wî her şev serxweş vedigere malê bi darê zorê nêzikî keça xwe dibe û dest davêje kaça xwe. Şêro vê yekê wiha radigihîne:

“ Bavê min serxweş vejeriya, derî vekir, lempe vexist. Xweha min li ser text dirêj kirî bû. Destê xwe danî ser deve wê û... (...) ez xwêdan digirim her ku ev tê bîra min seydayê min! (...) piştî wê rojê min nema karîbû li rûyê bavê xwe binêriya. Xweha min ji girî dihat ku bixeniqe. Tev wilo jî nehîşt ez wî bikujim, ji ber ku serxweş bû (Yûsiv, h.b.: 64).

Gava ku Şêro xweha xwe li ser namûsê kuştiye, û îfadeyên xwe dide vê yekê jî ji polîsan re vedibêje. Vê têtikilya enestet li ser derûniya xwişkê jî û ya Şêro jî bandoreke neyînî çêkiriye. Şêro ji vê têtikiliya qedexe ya derî civakî û ehlaqî, şerm dike, çavên wî li bavê wî edê bar nadin.

ENCAM

Di vê xebatê me xwest romanên nivîskarên mêr bi nêrîneke femînîst bîxwînîn û bi perpektîfa vê rexneyê romanên şîrove bikin. Me di beşa ewîl de femînîzm, cureyên femînîzmê û teoriya rexneya femînîst da. Me xwest ka femînîzm çi ye? Rexneya femînîst çawa ye, çawa nêzîkî metnên edebî dibe, zelal bikin. Me di beşa duyem de jî her çar romanên ku me hilbijartibû, li gor nêrîna rexneya femînîst analîz kir. Analîza me li ser karakterên jin û hin mijarên sereke yên romanên bû. Karakterên jin, di romanên de çawa hatine dayîn, di nav civakê û têkiliyên bi zayenda mêr re hatine honandin? Mijarên bi civaka bavîksalar ve girêdayî wekî; zayenda civakî, zayendperestî, bekaret, namûs û hwd. Di van romanên de, bi çi rengî xuyabûne? Me van yekan destnîşan kir û di dawîya xebata xwe de em gihîştin van encaman:

Di her sê romanên de (*Sobarto*, *Dara Pelweşiyayî*, *Heft Wêney Rûtî Jinî Cenabî Wezîr*), karakterên jin ji aliyê vebêjên romanê ve hatine vegotin, carinan jî em dengê wan di nav diyalogên bi lehengên din re dibihîzin. Karakterên jin ji aliyê nivîskaran ve bêtir bi aliyê xwe yê fîzîkî ve hatine şayesandin. Li ser dinyaya hundirîn û derûniya van karakterên jin, em zêde tiştekî nabihîsin. Wekî ku ev jin ji taybetiyên mirovane fikirîn û hizrê bêpar bin, tenê bi bedena xwe û bi zayendiya(mêfî) xwe derketine pêş.

Herweha di çavên karakterên mêr de jî jin, bi bedena xwe arezûya zayendîtîyê geş dikin û xweşîyê dinin mêr. Bi taybetî di *Sobarto* de, jin wekî jêderka xerabiyên tê dîtîn. Mînak Pîra Felek, (Navekî sembolîk e) qederê temsîl dike. Ji gelek xerabiyên ku li *Sobarto* dibarin ew mesul e. Belqîs keseke xapîner e, Silêman ji evîna xwe dîn kiriye. Lê belê berevajî van her sê romanên, vebêj û serlehenga romana “Meryema” jîneke bi navê Meryema ye. Serlehenga Meryema vebêja romanê ye jî. Nivîskar Silêvanî, bi vebêjiya Meryemayê pîrsgirêka jinê di romanê de, nîqaş dike. Meryema ciyê xwe (jinê) yê di nav civakê de, dinirxîne û rexneyan li civakê dike. Lê belê her çiqas nivîskar xwestibe li ser pîrsgirêka jinê rexneyan li civaka kurd bike jî di hin ciyan de xwe ji nêrîn û zimanê nêrane xelas nekiriye.

Encameke din jî ku derketiye holê ew e ku; di van her çar romanên de jî taybetiyên civaka kurd ya bavixsalar him li ser karakterên jin him li ser karakterên mêr diyarker in. Tenê meriv dikare bêjê serlehenga romana Meryemayê, Meryema hay ji taybetiyên civaka kurd heye û van taybetiyan rexne dike. Jinên di romanên din de hay ji xwe û hay ji rewşa xwe ya di pergala bavixsalarî de tune ne. Karakterên mêr, rolên zayenda civakî li jinan bar dikin û wan bi vî çavî dinirxînin.

Di van her çar romanên de, hin mijarên sereke hebûn ku bi civaka kurd ya bavixsalar ve girêdayîbûn. Mijarên wekî bekaret, namûs, bavixsalarî, desthilatiya zayendîtî, carna xwe li ser karakterên jin carina bi nêrînen karakterên mêr û carna jî bi vegotina niviskaran xwe di honakan van romanên de, nişan didan.

Di civakên bavixsalar de keçanî, ji bo jinê xaleke giring e. Ev yek di civaka kurde jî bi awayekî xurt tê dîtin. Tevna romana Meryemayê li ser perdeya keçaniyê ava bûye. Di encama destavêtinekê de Meryema keçaniya xwe wenda kiriye. Wendakirina perdeya keçaniyê, bandoreke xerab, derûniya Meryema kiriye û hemû jiyana wê di bin vî barî de derbas bûye. Bandora vê yekê li têkiliyên wê yên evînî jî bûye. Me dît ku di civaka kurd de, keçanî ji bo jinekê çiqas giring e û nebûna wê çawa dikare jiyana jinekê bike dojeh. Wateya pîr û pakiyê çawa li keçaniyê hatiye bar kirin û hebûna jinê bi van wateyên çêker ve ava bûye. Di romana *Dara Pelweşiyayî* de jî niviskar balê kişandiye ser bekaretê ku di civaka kurd de, bekaret ji bo jin û mêran ne heman tişt e. Mêr gava bekareta xwe wenda dike, ev ji bo wî çiyê şanaziyê ye, lê gava ku jin bekareta xwe wenda dike, çiyê riswabûnê ye û carina çiyê kuştinê ye. Nêrîna civaka bavixsalar ya li ser keçaniyê bi vî awayî di romanên de cî girtiye.

Me dît ku şibandinek di navbera jinê û wela(mekan-) ci de hatiye kirin. Welatên ku nexwedî azdadî ne, têkçûyî û dagirkirîne wekî jinekê hatine texeyul kirin û wan jî keçaniya xwe wenda kirine. Ji ber vê yekê ew jî stuxwar in. Di romana Meryemayê de, Meryema şibandinekê di navbera xwe û welat de dike. Welat jî wekî wê ji keçaniyê hatiye xistin. Ev şibandin di romana Sobarto de jî derbas dibe. Pêwendiya jinê welat û neteweyê di romana *Heft Wêney Rûtî Jinî Cenabî Wezîr* de jî berbiçav e. L vir Ferhad dixwaze, heyfa welatê xwe ji ereb, tirk û farisan hilîne û vê heyfê ji dê bi razana jinê wan re bike. Herweha li vir jin wekî amrazeke zayendîtiyê

ye. Û desthilatdarî li ser zayedîtîyê saz dibe. Têkiliya cinsî ya bi jinê re wekî hêz û serkeftinekê tê dîtin. Di vê têkiliyê de mêr yê serkeftî û jin bi vê yekê biçûk tê dîtin. Herweha bi vê yekê neteweya jinê jî dişikê.

Di van romanên de nivîskaran karakterên jin di nav zîhniyeta bavixsalariyê de afirandine û bi rolên zayenda civakî bi sînor kirine. Nêrîna zayendperestiyê bi awayekî eşkere xwe daye der. Di *Dara Pekweşiyayî* de, navbera Mam Silo û Remzî Xoce de, li ser ciyê jinê di civakê de nîqaş tê kirin. Di nîqaşa van karakteran de Mam Silo jinê bi nêrîna civaka kurd ya bavixsalar de bi cî dîke. Li hember wî nêrîna Remzî Xoce li der civaka kevneşop e. Li gor wî divê jin ji xeynî malê jî di nav civakê de ciyê xwe bigire. Piraniya karakterên mêr bi nêrîneke mêr serwer nêzîkî jinê bûne. Lê kêm be jî karakterekî wekî Remzî Xoce jî xuya bûye.

Di sê romanên (Sobarto, *Dara Pelweşiyayî*, *Heft Wêney Rûtî Jinî Cenabî wezîr*) de nivîskarên, van romanên di afirandin û honaka karakterên xwe yê jin de, xwe ji nêrîna civaka kurd ya bavixsalar xelas nekirine. Karakterên xwe yê jin bi çavekî nêrane şayesandine. Di van romanên de karakterên mêr jî xwedî feraseta bavixsalariyê ne û li ser jinê xwedî fikrên bavixsalar in. Mijarên wekî bavixsalariyê, bekaret, namûs û hwd. di nav qaîdeyên nêrane de hatine vegotin. Ziman û vegotina van romanên di nav qalibên ziman û vegotina zayendperestiyê de saz bûye.

Romana Silêvanî “Meryema” di nîqaşa mijar (bekaret û hwd.) û taybetiyên civaka kurd ya bavixsalar de bi romanên din re di hevpariyekê de be jî, ji aliyê karakterên jin, karaktera Meryemayê, ve ji van romanên vediqete.. Karaktera Meryemayê, berevajiyê karakterên jin ên romanên din diaxive, fikr û romanên xwe yê di derheqê xwe û civakê de, tîne ziman. Dinyaya xwe ya hundirîn an go derûniya xwe dide der. Nivîskar li li hember civaka bavixsalar di nav helwestekê de ye û taybetiyên bavixsalariyê ji devê Meryema rexne dîke. Lê belê nivîskar di vegotin nêrînan xwe de, xwe ji nêrînan û zimanê nêrane azat nekiriye. Di şayesandina karaktera Mencilê û Meyrê de jî hat dîtin ku vebêja jin Meryemayê bi ziman û rabêja bavixsalariyê ev karakter şayesandine. Û Meryema bi rewş û vegotina xwe carina ketiye nav nakokiyan.

ÇAVKANÎ

- Ahmedîzade H. (2011). *Romana Kurdî Û Nasname*, İstanbul, Weşanên Avesta
- Arat N. (2010). *Feminizm'in ABC'si*, İstanbul: Say Yayınları
- Argunşah H. (2016). *Kadın ve Edebiyat :Kendini Yazmak* İstanbul: İletişim Yayınları
- Aslan M. (2015). “Di Warê Analîza Têgeha Zayendperestiya Civakî De Berhema Sebrî Silêvanî Ya Bi Navê Meryema”, *Wêje û Rexne*, j. 2.
- Aydoğan İ. S. (2014). *Guman 2, Wêjeya Kurdî Û Romana Kurdî*, İstanbul, Weşanxaneyê Rûpel
- Aytemiz B.U. (2016). “Edebiyat Ve Toplumsal cinsiyet”, *Toplumsal Cinsiyet Tartışmaları*, amd. Feryal Saygılıgil, Ankara, Dipnot Yayınları
- Balcı, S. (2011). “Feminist Eleştiri Yöntemiyle Ayla Kutlu'nun Öyküleri Üzerine Bir Araştırma” (Teza masterê ya ne çapkiri), Eskişehir Osmangazi Üniversitesi,Sosyal Bilimler Enstitüsü) Eskişehir
- Berktaş F. (2010). *Tarihin Cinsiyeti*, İstanbul: Metis Yayınları
- Blank H. (2008). *Bekaretin El Değmemiş Tarihi*, İstanbul İletişim yayınları
- Butler J. (2008). *Cinsiyet Belası: Feminizm ve Kimliğin Altüst Edilmesi*, (Wer. B. Ertür). İstanbul: Metis Yayınları
- Cebeci O. (2014), *Psikanaltik Edebiyat Kuramı*, İstanbul, İthaki yayınları
- Davis Yuval D. (2016). *Cinsiyet ve Millet*, İstanbul İletişim Yayınları
- De Beauvoir S. (2010). *İkinci Cins*, İstanbul, Payel Yayınları
- Demir Z. (1997). *Modern ve Postmodern Feminizm*, İstanbul, İz yayınları
- Dogan S. (2018). *Bi Rêbaza Rexneya Femînîst Lênerînek Li Romanên Jinên Kurd*, Teza Mastirê ya neçapkiri
- Donovan J. (2016). *Feminist Teori*, (Wer. A. Bora, M.Ağduk, F. Sayılan). İstanbul, İletişim yayınları
- Düzkan A. (2011). “İkinci Dalga Feminizm” dnd. *İstanbul Amargi FeminizmTartışmaları*, (amd.) Esen Özdemir, Sevgi Bayraktar. İstanbul, Amargi Yayınları
- Eker T. Erdener E.(2011). “Tecavüze İlişkin Kültürel Mitler ve Mitlerin Kabul Edilmesine Etki Eden Faktörler” *Türk Psikoloji Yazıları*, 14 (28), 60-72

- Erden A. (2011). *Türk Edebiyatında Kadın Yazarlar, (Kötücülük-Cinsellik-Erotizm)*, İstanbul, Hayal Yayınları
- Hekman, Susan J. (2016). *Toplumsal Cinsiyet ve Bilgi Postmodern Bir Feminizmin Öğeleri*
wer. Bekir Balkız, Ümit Tatlıcan, İstanbul, Say yayınları
- Hooks B. (2016). *Feminizm Herkes İçindir Tutkulu Politika*, (wer. Ece Aydın, Berna Kurt,
Şirin Özgün, Aysel Yıldırım), İstanbul, Bgst yayınları
- Humm M. (2003). *Feminist Edebiyat Eleştirisi*. (Wer. S. Günoğlu), İstanbul: Say Yayınları
- Kolcu A. İ. (2016). *Edebiyat Kuramları*, Ankara, Salkım Söğüt Yayınları
- Lynn S. Watkins B.X.(2011). *Cinsiyet Irk ve Sınıf*, İstanbul, Babil Yayınları
- Michel A. (). *Femînizm*, Yenî Yüzyıl Kitaplığı, İletişim yayınları
- Mies M. (2011). *Ataerki ve Birikim: Uluslararası İşbölümünde Kadınlar*, (Wer Y. Temurtürkan), Ankara: Dipnot Yayınları
- Millet K. (2011). *Cinsel Politika*, (Wer. S. Selvi), İstanbul: Payel Yayınevi
- Moran B. (1991). *Edebiyat Kuramları ve Eleştirisi*. İstanbul: Cem/Kültür Yayınları
- Naiman J. (1988). *Marksizm ve Feminizm İki Ayır Kuram*, İstanbul, (wer. Saadet Özkal)
Amaç Yayınları
- Notz G. (201). *Femînizm*, (Wer. S. Çetinkaya), Ankara: Phoenix Yayınları
- Öztarhan S. (2006). *İyi Kızlar/Kötü Kızlar: Günümüz Amerikan Romanında Cinsel, Etnik ve Sınıf Kimlikleri*, (Teza Doktorayê ya ne weşandî), Ege Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü, İzmir.
- Parla J. & Irzık S. (2014). *Kadınlar Dile Düşünce*, İstanbul: İletişim Yayınları
- Pirbal F. (2014). *Heft Wêney Rûti jinî Cenabî Wezîr*, İstanbul, Avesta yayınları
- Ramazanoğlu, C. (1998). *Feminizm ve Ezilmenin Çelişkileri*, (Wer. M. Bayatlı). İstanbul: Pencere Yayınları
- Scott, Joan W. (2013). *Toplumsal Cinsiyet: Faydalı Bir Tarihsel Analiz Kategorisi” dnd.Feminist Tarihin Peşinde*, (brh.) Fahriye Dinçer, Özlem Aslan, wer. Ayça Günaydın, Derya Demirler, Fahriye Dinçer, Özlem Aslan, Öykü Tümer İstanbul, Bgts yayınları

- Schick İ.C. (2001). *Batının cinsel Kıyısı, Başkalkıçı Söylemde Cinsellik ve Mekansallık*, (wer.Savaş Kılıç Gamze Sarı), Tarih Vakfı Yurt Yayınları
- Sevim A. (2005). *Feminizm*, İstanbul: İnsan Yayınları
- Silêvanî S. (2011). *Meryema*, Ankara, Weşanên Lîs
- Şahin E. (2009). *Leyla Erbil'in Eserlerine Feminist bir Yaklaşım*, Atatürk üniversitesi Sosyal bilimler Enstitüsü (Teza doktrayê ya ne çapbûyî), Erzurum
- Taş, G. (2016). "Feminizm Üzerine Genel Bir Değerlendirme: Kavramsal Analizi, Tarihsel Süreçleri Ve Dönüşümleri", *Akademik Hassasiyetler*, j. 3(5), 163-175
- Tekin M. (2004), *Roman Sanatı*, İstanbul, Ötüken yayınları
- Woolf V. (2009) *Kendine Ait Bir Oda*, wer. Suğra Öncü, Handan Saraç, İstanbul, İletişim Yayınları
- Walters M. (2009). *Feminizm*, (Wer. H. Gür), Ankara: Dost Kitabevi Yayınları.
- Yusif H. (2014). *Sobarto*, İstanbul, Weş. Peywend
- Nazê B. (2010). *Dara Pelweşiyayî*, Diyarbakır, weş. Lîsê

T.C.
MARDİN ARTUKLU ÜNİVERSİTESİ
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ
İNTİHAL RAPORU

Tez Başlığı: Bİ NÊRÎNEKE FEMÎNÎST ANALÎZA ROMANÊN NIVÎSKARÊN MÊR YÊN KURD

Yukarıda başlığı gösterilen tez çalışmamın kapak sayfası, giriş, ana bölümler ve sonuç kısımlarında oluşan toplam 100 sayfalık kısmına ilişkin 22/07/2019 tarihinde tez danışmanım tarafından *TURNITIN* adlı intihal tespit programından aşağıda belirtilen filtrelemeler uygulanarak alınmış olan orijinallik raporuna göre, tezimin benzerlik oranı alıntılar dâhil % 1

Uygulanan Filtrelemeler:

Kaynakça hariç

Alıntılar dâhil

5 Kelimeden daha az örtüşme içeren metin kısımları hariç açıklamalar

Açıklamalar: Mardin Artuklu Üniversitesi *TURNITIN* adlı intihal tespit programı sonucunda; azami benzerlik oranlarına göre tez çalışmamın herhangi bir intihal içermediğini; aksinin tespit edileceği muhtemel durumda doğabilecek her türlü hukuki sorumluluğu kabul ettiğimi ve yukarıda vermiş olduğum bilgilerin doğru olduğunu beyan ederim.

Adı Soyadı: Hacire Taş

Öğrenci No: 15711007

Programı: Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı


Statüsü: Yüksek Lisans

Tarih ve İmza


06.08.2019



Danışman Onayı

Dos. Dr. Mustafa ASLAN


A.B.D. Başkanı Onayı


Prof. Dr. Abdurrahman
ADAK